# JÎN

## (di dema şer da)

**JÎN (di dema şer da)**

**JÎN (di dema şer da)**

**Azadê Araratî**

https://azadweje.com/

**Rûpelsaz**: Rênas Eshed

**Bergsaz**:Brahîm Eshed

**Sererastker**: Mamedê Sîdo

**Redaksîyon:** Ameda Dilpak

**Çapa** 2023

weşanên komîteya lêkolîn û zanıstên cıvakî

weşanxaneya şilêr

Qamişlo

www.shiler.info

weshanashiler@gmail.com

civaka.dimokrat@gmail.com

**www.cıvakademokratık.com/kurd/**

**JÎN (di dema şer da)**

## Naverok

Çendinî û Çawanî ........ 7
Ji Bo Pirtûkê Pênase ........ 11
Pênaseya ŞGŞ ........ 11
Di Dîroka Cîhanê Da ŞGŞ ........ 13
ŞGŞ ya Gelê Vîyetnamê ........ 20
Întîfadaya Gelê Filistînê ........ 26
Taktîk û Amûrên Çalakvanên Filistînê ........ 29
Întîfadaya Duyem ........ 35
Rewşa Dawî ........ 36
Têkoşîna Zapatîsta (Ezmûneka Balkêş) ........ 37
Di Dîroka Kurdan Da ŞGŞ ........ 45
Peyman û Bêpeymanî ........ 46
Serhildanên Sala 1800î û Şûnda ........ 49
Ezmûna Komara Mehabadê ........ 52
Rojhilatê Kurdistanê (Vegotina Emîrê Kerîmî) ........ 53
Serhildana Jin Jîyan Azadî ........ 130
Destpêk ........ 130
Pêşengtî ........ 137
Rengê çalakîyan ........ 140
Tevger û hewildanên gelên din. Belûc, azerî, ereb, fars, kaspîyen (gîlekî) ........ 150

**JÎN (di dema şer da)**


Hiş û destwerdanên dewletê ................................................ 153

Daneyên serhildanê ............................................................ 156

Encam..................................................................................... 157

Serhildana Başûrê Kurdistanê di 1991ê da......................... 159

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê.............................................. 164

PKK û ŞGŞ.......................................................................... 168

Destwerdana NATOyê (Giladyo). Giladyoya NATO û ya Tirk (JÎTEM, Hîzbulkontra). Giladyoya NATOyê û PDK-JÎTEM ........................................................................ 171

Ezmûna Yekem, Cûrnêreş (Hîlvan) .................................. 182

Ezmûna Duyem, Sêwreg .................................................. 185

Nisêbîn, 1990........................................................................ 186

Cizîra Botanê, Amed, Şirnex............................................. 189

Cizîra Botanê ....................................................................... 189

Amed ..................................................................................... 191

Şirnex..................................................................................... 195

Piştî Sala 1999î..................................................................... 197

Guhertina Sitratejî ............................................................. 199

Damezirandina Hêzên Parastina Cewher .......................... 200

Di Dema Sitratejîya Çarem Da ŞGŞ ................................. 202

YPS/ YPS-JIN ...................................................................... 203

Rêvebirîyên Xweser (Li Bakurê Kurdistanê).................... 205

**JÎN (di dema şer da)**


Zarokên Agir û Rojê “Çalakîkerên Xwedî Hêza Karînê” . 206

Ezmûna Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê û Rojavayê Kurdistanê ........................................................................................ 209

Serhildana 12ê Adara 2004ê (Qamişlo) ............................ 211

Xweparastina Şêxmeqsûd (Helep) .................................. 215

Serêkanîyê ........................................................................ 224

Kobanîyê .......................................................................... 229

Têkoşîna Dijî Dewletê .................................................. 234

Şerê Dijî Artêşa Azad .................................................. 236

Şerê Dijî Cephet El Nusra............................................. 237

Şerê Dijî DAÎŞê ............................................................ 238

Dîrokçeya HPC, HPC-JIN............................................... 241

Ji Vegotina Hiseyn Xelef ................................................ 243

Ji Vegotina Delal Ebdsemed ........................................... 250

Taybetmendîyên Gel yê ŞGŞ .......................................... 260

Pêdivî û Karîn.................................................................. 261

Pêdivî ........................................................................... 263

Karîn ............................................................................ 269

Jêder................................................................................. 273

**JÎN (di dema şer da)**

## Çendinî û Çawanî

Şoreş di encama serîrakirina gelan da tên kirin. Tu dem û dewranan, şoreş bê beşdarbûna gel nehatîye hizirîn. Dema te got şoreş; ew tiştên ku bi hêza gel ve tên kirin e. Pêşeng armancan dîyar dike, xwe bi bername dike û diçe nava gel. Heke gel bersiv da, êdî dest bi têkoşînê tê kirin. Hin pêşeng hene ku xwedî bername û hizir in, lê gel wan napejirîne û tevlî têkoşîna wan nabe. Çima? Yek: Ji ber ku rast hizirîn û rast nivîsîn tenê têra destpêkirin û serxistina şoreşê nake. Ya duyem: Her kesek yan partî û kom dikarin li gor xwe û berjewendîyên xwe şoreşan bikin. Ya sêyem: Ger ne li gor pêşketin û berjewendîyên gel yên giştî be, gel tevlî nabe. Ji ber ku gel ne neçare di şoreşeka ne li gor hizir, pêşketin û berjewendîyên wê da be berdêlên giran bide. Lewra gel bi hîs û pêhesînên xwe têdigihîje ku çewtîyek heye. Ji ber vê jî beşdarî her pîlanên hin şoreşan nabe. Ji bo beşdarbûna gel lazime di pêşeng da bawerî, vîn, perwerde, rêxistin û hwd hebin. Ji ber ku rastî bi ziman rave kirin hêsan e, lê belê li gor rastîyan

tevgerîn zehmet e. Lewra her gel berîya ku li ser şopa pêşengan bimeşe, lê dimeyzîne û lê hûr dibe, heke pê bawer kir, hingî li pey pêşeng diçe. Serkeftin û neserkeftina pêşeng, tevger û partîyan bi vê rastîyê ve girêdayî ye. Civakeka bi tendurist û ewle tu caran li pey pêşengên sexte jî naçe.

Divê were zanîn, rêbaz (metodolojî) zanist e. Rêbaznasî ji bo şerê ku gel dikin girîng e. Ji destpêkê ve avêtina kevirekî, bikaranîna rim, şûr û mertal heta avêtina fuzeyekî, raber dike ku di şer da rola rêbaz û teknîkê girîng e. Îcar di dirêjahîya dîrokê da teknîka pêşketî di şeran da piranî di destê dagirker û desthilatdaran da ye. Lewra ji bo gelan rêbaznasî dibe zanisteka bingehîn ku pêwîste were bikaranîn. Ji bo şerê ku gel dikin teknîka mirov bixwe bingehîn e. Wekî ku Rêber Evdellah Ocalan bilêv dike: “Mezintirîn teknîk mirov bixwe ye.”

[1] “*… Mirin tiştekî xwezayî ye, lê di heman demê da ji ber ku*

---

[1] Ocalan Evdellah, ASTA REJÎMA TIRK ya ŞERÊ TAYBET û DIBETÎYA AZADÎYA GELAN, dahurîna 01 nîsan 1998, r. 24,

*Wergera ji tirkî: Azadê Araratî

*mirinê dispêrin mirina xwezayî, ev wisa dibe meşekî Pirsgirêka me ne ew e ku em li vir mirina xwezayî gotûbêj Pirsgirêka me, mirina ku dijmin dike xiraptirîn gefên li ser jîyanê ne. Vana jî li gorî ku em dê wiha derbas bikin di heman demê da meşa me meşa jîyan û nemirinîyê ye. Di vir da ne xemgînî ne jî tirs qet tiştekî wiha tune ye. Mîlîtanek ewqas jîyan û serkeftina wî girêdayî bestayî û kilîtkirî be, hêzeka herî mezin e. Li ser vê bingehê her mirovek, bi vê şêwazê, bi vê tempoyî teknîka herî mezin e û ji atomê bandortir e. Dibe ku kesek bi qeza here, lê kesên ku li ber serê wî ne dê serî bigirin û herin. Mînak dîsa hewildanên min in ku silogana “Mezintirîn teknîk mirov bixwe ye.” Min di xwe da xiste merîyetê. Min nîşan da ku artêşa herî mezin xwe rêxistinkirina mirovekî ye. Şêwazê şer yê herî zêde serederî pê ra nayê kirin ev e ku kesek xwe bi temamî bide şer, min ev jî şanî we dabû. Heke birastî hûn jîyaneka bi keramet, azad, jîyana ku canê we dixwaze dixwazin, tişta li ser milê we pêkanîneka ji rêzê ya vanan e. …*”

Gel bi tiştinên ji rêzê dikarin şer bikin. Ya girîng afirînerî û

pêkanîn in. Bi giştî di civakan da ji sedî 90 gel heye. Ji sedî deh jî kesinên dervayî gel in hene. Ev zêdebûna gelheyê ji bo gelan derfetekî zêrîn e, heke bi awayekî rast were destgirtin. Di civakan da gelheya ji sedî deh rêxistinkirî ye. Amûrên zextkirin û çewisandinê di destê wan da ye. Bi darê zorê xwe li ser gelan ferz dikin. Lewra gel bindestîyê dijîn. Heke gel bi rêbaz û bi afirînerî xwe rêxistin bikin û serî rakin, dê serkeftî bin.

Pêwîste gel bi hemû pêkhate û derfetên xwe ve têbikoşin. Nekevin xefika hilbijartinan û hêvîya xwe di guhertina desthilatan da nebînin. Bixwe li gorî mercên xwe pergala xwe ava bikin. Nehêlin pergala wan bikeve destê desthilatan. Ji bo vî jî lazime rêvebirin û îdare tim were guhertin û bi temamî xwedî demokrasîya civakî be. Pêwîste kes tenê ji bo xizmeta gel rêvebirtîyê bikin. Hekena destkeftîyên gel bi hêsanî ji destê gel derdikevin.

Gel li bajar, gund, deşt û çîyayan; her cihê ku lê ne, dikarin şer bikin. Ji bo vî şerî sitratejî û taktîkên rast lazim in. Heke vana hebin li her derekî, di hemû mercan da, gel dikare şer bike û serkeftî be.

## Ji Bo Pirtûkê Pênase

Mijara vê pirtûkê Şerê Gel Yê Şoreşgerî ye. Ez dê bi kurtkirî binivîsim ŞGŞ. Ev pênase ji alîyê Rêber Evdellah Ocalan ve di pirtûka “Parastina Kurdên di Nava Pencê Qirkirina Çandî da” hatîye kirin. Di pirtûkê da mijar bi berfirehî hatîye dest girtin. Em dê di vê pirtûkê da zêdetir bala xwe bidin li ser têkoşîna gelan û ya gelê kurd ya şoreşgerî.

## Pênaseya ŞGŞ

Di xwezayê da her zîndewerek xwedî pergala parastinê ye. Di xwezaya mirovan da jî pergala xweparastinê heye. Heke pergala xweparastinê nehatibe têkbirin, çi kes be, çi komik be, çi gel be yan jî bi temamî civak, misoger xwe diparêze. Tundî û hevxwarina zîndeweran rastîyeka xweza ye. Ajalinên goştxur hene. Lewra tundî dê tim hebe lê şerên birêkûpêk ne xwezayî ne û mirovahî bi têkoşîna xwe ya şoreşgerî dikare dawî li van şeran bîne.

Şer bi awayê xwe yê rêxistinkirî ji dema Al Ubêyd û Sumeran

ve dest pê kirîye û heta roja me hatîye. Di navbera 4 heta 3 hezar salan berîya zayînê, gav bi gav şer hatîye pêşxistin. Çîna jor û serdest tim pergal, rêxistin, sîyaset di destê xwe da girtîye. Lewra jî hêzên çekdar birêxistin kirîye û dijî gelan û êlên azad bikar anîye. Êl, gel, netew tu carî bindestî nepejirandine. Her tim xwestine azad bijîn. Nîrê bindestîyê nedanîne li ser milên xwe. Lewra jî şer her tim li meydanê hebû ye, tevî şerên serdestan û yê dewletan li dijî hevûdu.

Ji bo sedsala bîst û yekem divê pênase û pêkanînên nû hebin. Hekena gel, komik û çandên azadîxwaz dê nikaribin nefesê bidin û bistînin. Wekî laşê mirovekî nîv ji xwe çûyî dê jîyan bikin ku ev jî ne tu jîyan e. Şerê ku gel li hember zordaran dikin, em wekî ŞGŞ pênase dikin. Lê di welat û dervayî welat lazime çawa bikeve merîyetê? Gelê kurd û gelên ku dost in, lazime çawa bi hev ra tev bigerin? Gelên cîhanê çawa serî rakin? Gelên cîhanê ji me çi bigirin; madî û manewî? Em dê ji gelên cîhanê çi bigirin; madî û manewî? Lazime baş were zanîn. Lazime dijî koalîsyona navdewletî lihevkirina gelan

hebe. Çi bi leşkerî û çi bi sîyasî. Encamên têkoşînan jî bi vî awayî dîyar dibe. Hem şerê Vîyetnamê li dijî DYA hem jî dema berxwedanîya Kobanî ya 2014ê, me dît ku gelên cîhanê bi rêbazên cur bi cur dikarin alîkarîya hev bikin. Xwe tevlî serkeftinên hevûdu bikin. Ev jî çekeka wisa ye ku ji fûze û çekên desthilatan yê herî bi bandor bandortir e.

## Di Dîroka Cîhanê Da ŞGŞ

Qasî ku ji daneyên arkeolojî û antropolojîyê em têdigihîjin hîna di dema kilanan da tundî heye. Di dema hoz û êlan da jî tundî heye. Lê belê ev ne şer e. Ji ber ku xwe naspêre hêzên pispor. Kesên ku tundîyê dikin jî tundîyê wekî pîşe nagirin dest. Dema li wan qelibî û neçar man tundîyê dikin.

Li hin şûnwarên ku di dema neolîtîkê da ava bûne dane hene. Li wan şûnwaran hatîye dîtin ku mirovan ji bo parastina xwe li dora gund û gundikan xendek kolane. Tevî vî çeper û xendek hatine çêkirin. Kêleka hev û nêzî hev sing kutane. Bi vî awayî xwe ji dijminên xwe parastine, an ku dema êrîş li ser wan

çêbûye, di xendek û çeperan da şer kirine. Bi kutana singan pêşî li êrîşên dijminan hatîye girtin. Xendek, çeper û sing, di heman demê da, dijî ajalên dirinde jî kêrî girseya li gundan dijî hatîye. Ew rêbaz û teknîka ku berîya hezaran salan hatîye afirandin, di dema niha da jî kêrî bindestan û gelan jî tê ku pê xwe diparêzin. Li gorî şîroveya arkeologan, kolana xendekan sê hezar roj dewam dikir. Ew jî bi hesab kirinekî çors dike heşt sal. Di dema neolîtîkê da, mirovan bi sebir û kedeka mezin ji bo parastina xwe xebitîne. Ji ber ku parastin hebûnê misoger dike. Hekena mirin û ji holê rabûn dibe çarenûsa gundan, bajaran û welatan.

Ji dema Ubêyd û Sumeran pê da, jîyana xwezayî ya gundan tune hat hesibandin. Di bajaran da gelhe zêde bûn. Di nav civakê da çîn peyda bûn. Civak dabeş bû. Wekî zengîn, navîn û jar. Dîndar, rêvebir û fermandar peyda bûn. Pergal hat damezirandin ku navê xwe dewlet e. Di vê pergalê da beşê civakê yê jêr an ku çîna jar, bê parastin ma. Keda çîna jêr an ku jar her dihat mêtin. Dad ji bo serdestan cuda, ji bo jaran cuda

bû. Serdest û sermayeya serdestan dihat parastin. Kultur û sinc teşe girt ku tê da çîna jar binketî bû. Şûna wijdanê bêwijdanîyê girt. Em bala xwe baş bidinê: sinc û wijdan ji bo civakê dîyardeyên sereke ne. Heke nebe civakîbûn jî nabe. Di vê demê da sinc û wijdan veguherî bêsincî û bêwijdanîyê. Heta roja me jî ev bêsincî û bêwijdanî berdewam e. Kûr dibe fireh dibe û bêhnê li gelan, bindestan, jaran diçikîne.

Dema ku civak dabeşî çînan bû, çîna jêrîn an ku jar bê parastin ma. Ji ber ku bê parastin e, rojbiroj mafên xwe yên bingehîn jî ji dest dide. Amûrên desthilatîyê mînanî heştpê (axtapot) dor li jaran û bindestan digire. Lewra jî ji bo jîyaneka bi rûmet û serbilind, parastin bingeh e. Di vê demê da, li dora bajaran, jîyana xwezayî û demokratîk heye. Deverên cîhanê ku şaristanîya bajarî bi pêş neketîye, jîyana xwezayî her hebû. Heta niha jî hin deverên cîhanê, hoz û êl hene ku jîyana xwezayî dijîn.

Di serdema bajarvanîyê da, li dora bajaran, gund û gundik hene. Hoz û êlên şivanîyê dikin hene û hoz û êlên cotkarîyê

dikin jî hene. Dibe ku hin hoz û êl hebin ku nîv cotkar û nîv şivan bin. Ji ber ku erdnîgarîya Mezopotamyayê ji vê yekê ra destdaye ye. Di serdema me da jî hoz û êl hene ku biharê berê xwe didin bilindahîyan. Her cihê ku diçin, tevî sewal xwedî kirinê, baxçe jî datînin û heta derengîya payîzê jê dixwin. Ji bo zivistanê jî sebze û fêkî tên hişkkirin û zivistanê bikar tînin an ku dixwin.

Di dema Ubeyd û Sumeran da, hoz û êlên ku di dora bajaran da bûn, tu caran dev ji parastina xwe bernedane. Lewra dikarîn heta astekê serbixwe bijîn. Şerê van hoz û êlan, hem bi hevûdu ra hem jî li hember bajaran hebû. Di bajaran da, ew hêza leşkerî û rêxistinkirî ku xwedî fermandaran e, êrîşî hoz û êlan dikir. Lê belê hoz û êlan jî dikarîn êrîş bibin ser bajaran. Lewra jî di bajaran da kela û sûr hatine lêkirin. Hoz û êl xwedî kela û sûran nebûn. Ji ber ku gelhe kêm gund jî piçûk in. Di heman demê da, tevgera hoz û êlan hebû. Lê bajar di cihê xwe da sabît e. Yan xwe diparêze yan dest diguhere yan jî tê wêran kirin û tenê bermahîyên xwe dimîne. Hoz û êl ne wisa ne. Dikarin

tevbigerin, cih biguherin û ji nû ve jîyana xwe sererast bikin. Ev rastî herî zêde di pêşîyên kurdan da tê dîtin.

Pêşîyên kurdan û heta van sedsalên dawî jî kurd her tim di nava liv û lebatê da bûne. Yan xwe berdane nava kûrayîya gelîyan yan jî hilkişîyane çîyayên asê. Hin deverên ku destê şaristanîya desthilatdar nagihê jî ji bo pêşîyên kurdan bûne warên jîyanê.

Di deşt û deştikan da jî eşîret û qebîleyên ku hene tim xwe berdane kûrahîya çolan. Binê erdê jî bikar anîne û bi awayekî serbixwe jîyane. Heta niha jî jîyana hoz û êlan xwe dispêre jîyaneka serbixwe. Lê belê hoz û êlên ku bi serdest û dagirkeran ra ketine nav hev û radestî serdest û dagirkeran bûne, pêwîste em wana cuda bigirin dest. Yê van hoz û êlan mirineka bi hizrî û kulturî ye. Herî zêde jî di van hoz û êlan da sinc û wijdan tune ye. Yanî dev ji civakîbûna xwe berdane ku ew civakîbûn xwe dispêre dîrokeka bi hezaran salan.

Di pergal û jîyana mêşên hingivan da xwe rêxistin kirinek heye ku pir balkêş e. Di nava kovanê da mêş hemû hingiv nakin. Beşekî mêşan hingiv dike û beşek jî tenê parastinê dike. Ev her

dem û her kêlî amade ne ku koma xwe biparêzin. Heke êrîşek li ser wan çêbibe -di serî da mêşên parêzvan- dest bi parastina koma xwe dikin.

Di dema ku em qal dikin da jî lehengên hoz û êlan hene. Ew hoz yan jî êla xwe diparêzin. Ji bo hoz yan jî êla xwe, heke pêwîst bû, xwe didin kuştin. Lewra ji vê demê ra tê gotin: "Dema lehengan." Niha jî ev kurdên ku resenîya xwe parastine, xwedî feraseteka wisa ne. Di malbat, bavik yan jî hoz û êlan da, kesinên hene ku wêrek in. Dema ku pêwîstî hat dîtin, derdikevin pêş û parastinê dikin.

Parastin ji bo her komik, kom, gel, netew esas e. Berê wisa bû, niha wisa ye, di paşerojê da jî her dê wisa be. Mirov çiqas parastî be, ewqas serbixwe ye û dijî.

Komik û komên xwezayî, di nava xwezayê da, bi awayekî xwezayî jîyane. Di vê demê da, sînorên jîyana mirovan sînordar bû. Ew di asteka sînordar da rûyê erdê bikar dianîn. Bi şaristanîya dewletdar ra, sînorên bajaran firehtir bûn. Bi taybet li Mezopotamya bajar, di nava xwe û li dora xwe da bi bandor

bûn. Deverên ku bajarvanî pêş neketîye, wekî xwe xwezayî dijîyan. Piştî şaristanîya Sumeran, gav bi gav kolonyalîzm bi pêş ket. Bi vê ra sînorên şaristanîyan fireh bûn. Dema dem bû dema împaratorîyan, sînorên şaristanîya dewletdar firehtir bûn. Her ku ev sînor fireh dibûn, qada jîyanê ji komên xwezayî û gundan tengtir dibûn. Komên mirovan, li gundan nedikarîn xwe biparêzin. Lewra jî diketin bin destê dagirker û desthilatan. Karînê xwe parastinê bi vî awayî her ku çû lewaztir bû.

Pênc sed salên dawî, di cîhanê da, cihê ku pergala desthilatdar xwe negihandî nema. Lewra xwe parastina gelan û çîna jêr an ku bindest, di xwe parastin û serbixwe mayînê da lewaz bûn. Pergala dewletdar mîna hutekî mezin bûye. Gel û çîna jêr, çîna kedkar piçûk bûye. Pergal mîna fîl e, gel û bindest jî mîna morîyan in, tên perçiqandin. Ji bo vê jî rêk û rêbazên nû pêwîst in.

Ji bo desthilatdar hegemonyaya xwe firehtir bikin, bi herikîna dîrokê ra, teknîka şer jî bi pêş xistin. Bi vê teknîka pêşketî

dewletan qira hev anîn. Kes, komik, gel, netewên ku binê destan da mayî, rê û rêbazên nû kifş kirin. Her çiqas teknîka pêşketî di destê desthilatan da be jî lê bindestan jî li gorî mercên xwe teknîk û taktîk bi pêş xistine. Her çiqas her tim serkeftî nebin jî lê her tim ber xwe dane û mîratekî xwe parastinê li duv xwe hiştine. Ev mîrat dev ji mafên xwe neberdan û serî rakirin e. Bi vî awayî cewhera civaka xwezayî û demokratîk hatîye parastin. Hekena mirovahî dê bûba heyînekî pir cuda. Dê ji civakîbûnê dûr û nemirov ba.

## ŞGŞ ya Gelê Vîyetnamê

Ji bo gelê Vîyetnamê, sedsala 20em, bi têkoşînê derbas bû. Dagirker û nokeran bêhna gelê Vîyetnamê diçikand. Lê belê gelê Vîyetnamê jî tim li ber xwe dida.

Tevî nokerên vîyetnamî, gelê Vîyetnamê li hember dagirkerîya Firansa, Japonya û DYA yê şer kirin.

Di pêşengtîya Ho Chi Minh da, sala 1945ê, bakurê Vîyetnamê ji dagirkerîya Firansa hat rizgar kirin. Di vê demê da

**JÎN (di dema şer da)**

Japonyayê Vîyetnam dagir kir. Lê belê di dawîya şerê cîhanê yê duyem da, di sala 1945ê da, Japonya li hember DYA bibin ket. Lewra neçar ma ku ji Vîyetnamê vekişe. Di Konferansa Cenevreyê da, ku di sala 1954ê da hat bestin, Vîyetnam bû du beş. Bakurê Vîyetnamê di destê sosyalîstan da bû, başûrê Vîyetnamê jî di destê sermayedaran da ma ku ew bixwe nokerên dagirkeran bûn. Neh sed hezar katolîk, ji bakurê Vîyetnamê derbasî başûrê Vîyetnamê bûn. Ji başûrê Vîyetnamê jî alîgirên şoreşê derbasî bakurê Vîyetnamê bûn.

Piştî ku şerê cîhanê yê duyem dawî lê hat, li Vîyetnamê rewş aram nebû. Firansa careka din dixwest li başûrê Vîyetnamê serwer be lê nedikarî. Pêdepêde DYA kete dewreyê û dest li başûrê Vîyetnamê werda. Di vê destwerdanê da, nokerên başûrê Vîyetnamê ku desthilatdar bûn, alîkarîya DYA dikirin. DYA sala 1963ê heta sala 1973ê rasterast tevlî şer bû. Lê belê di dawîyê da biser neket. Vîyetnamê di sala 1975ê da, serxwebûnîya xwe ragihand û başûrê Vîyetnam û bakurê Vîyetnamê bûn yek.

**JÎN (di dema şer da)**

Ji bo şoreşan pêşengtî, partî û kadro girîng in. Şoreş bi van ser dikeve. Di şoreşa Vîyetnamê da jî ev dîyarde hene. Serokê şoreşê Ho Chi Minh e. Bi salên dirêj, di nava şer da, seroktîyê dike û serkeftî ye. Partîya vîyetnamîyan partîyeka pêşeng e. Gel li dora xwe kom dike û heta serkeftinê bê rawestan têdikoşe. Ji bo rizgar kirina başûrê Vîyetnamê general Dîap heye ku kadroyekî pêşeng yê şoreşê ye. Ji hêla Ho Chi Minh ve tê erkdar kirin. Ew jî li gor hewcedarîya gelê xwe tev digere û di encamê da serkeftinê bi dest dixe. Kadroyên partîya pêşeng, Partîya Karkeran li her derê li ber xwe didin. Li bajar û çîyayan xwe bi awayekî bi disiplîn rêk dixin û têdikoşin. Li zîndanan jî li ber xwe didin. Di zîndanên Saygonê da êşkence pir bi dijwarî tê kirin, lê kadroyên Partîya Karkeran li ber xwe didin.

Serok, partî, kadro heke wisa bin, ne pêkan e ku gel bi serok, partî û kadroyên xwe ra nebe wekî yek bedenê. Gelê Vîyetnamê jî bersiva pêwîst daye pêşengên xwe û bi dil û can tevlî şoreşê bûye. Tevî ku dagirker û xayin û noker hebûn jî gel tu caran xwe ji kar û barê şoreşê nedaye paş. Tevî şewitandin û

rûxandina gund û bajaran, gelê Vîyetnamê her ber xwe daye û di encamê da jî bi ser ketîye.

Bawerî ji bo kes, kom û netewan girîng e. Heke bawerî hebe hêza karînê çêdibe. Di dil û mejî da enerjî tê ser hev. Ew jî dihêle ku mirov bigihijin armancên xwe. Tevî ku desthilatîya noker û dagirker li Vîyetnamê pir bi hêz bûn jî lê di gel da bawerî xurt bû. Wan pir baş dizanîyan ku di encamê da ew dê ser bikevin. Bombe barandin, warê jîyanê şewitandin, birçî hiştin, êşkence li pêşîya gelê Vîyetnamê nebûn asteng. Jixwe tişta ku şoreşa Vîyetnamê navdar dike, nehevsengîya hêzan û derfetên wan in. Wekî şerê hutan û morîyan şer hatîye kirin. Lê bi bawerîyeka xurt gelê Vîyetnamê li ber xwe da. Desthilatîya noker ya başûrê Vîyetnamê û DYA hut, gelê başûrê Vîyetnamê jî morî bûn. Hutan morî diperçiqandin, lê morîyan jî bi hezaran êrîşên xwe, ev hutana birîndar dikirin. Her derbek, rijandina dilopek xwîn ji hut bû. Di encamê da hut an ku DYA neçar ma ku bireve.

Lazime were zanîn; li hember hin karesatên xwezayî çare tune

ye, lê li hember pirsgirêkên civakî çare her tim heye. Gerîlayên vîyetnamî tevî gelê xwe çareserî afirandine û wisa bi ser ketine. Têkoşîna gerîla jî ne ew têkoşîne ku gerîla tenê bi serê xwe têdikoşe. Nexêr! Gerîla pêşengtîyê dike, lê gel jî tevlî her cure têkoşînê dibe. Nexwe gerîla tenê bi têkoşîna xwe naçe serî. Gelê vîyetnamî wekî artêşeka ji gel tev gerîyaye. Di hin cihan da, bi dijmin ra di nav hev da jîyaye. Gundên wan hatine şewitandin û paşê bi erdê ra kirine yek. Gel êşkence dîtîye. Lê ya girîng ev e ku bi fedakarîyeka mezin li ber xwe daye.

Di şerê gel yê Vîyetnamê da tunel cihekî girîng digirin. Gerîlayan û gel di bin erdê da jîyaneka li gorî rewşa şer vehûnandine. Jîyaneka kominî jîyane. Di tunelan da cihên mayînê yên teng û fireh ava kirine. Di tunelan da hem jîyane hem jî şer kirine. Tunel û jûrên (xurfe-oda) ku di bin erdê da ne kolane. Ev cihên wisa ji bo vîyetnamîyan bûne cihên xweparastinê. Li jor çiqas bombe werin avêtin jî di bin erdê da xwe parastine. Ji bo anîna zarokan cih û pêdivîyên taybet pêwîst in, lê di tunelan da dayîkan zarok anîne dinyayê. Di bin

erdê da, di hin cihan da, bîr kolane û bi sîtilan av kişandine. Her çi xiwarin hebe, bi hevûdu ra parve kirine. Ji cihên xwe derketine, çûne şer kirine û vegerîyane cihê xwe. Zêdetir gerîla, lê gel jî jîyaneka bi tevger jîyaye. Cephane û xiwarin û pêxiwarin ji rêkên dûr anîne, da ku karibin têbikoşin. Ji bakurê Vîyetnamê heta başûrê Vîyetnamê, şiverê rast kirine. Bi vî awayî çûn û hatin hêsan kirine. Vîyetnamîyan li gor erdnîgarîya xwe, li gor teknîka ku di destê wan da ye, tev gerîyane. Bi vî awayî di her welatekî da gel dikare li gorî şert û mercên xwe, xwe bi rêkûpêk bike, şer bike û bi ser jî bikeve.

Gelê Vîyetnamê di xwe veşartinê da jî jêhatî bû. Bê ku haya dijminê wan jê hebe, di nava daristanan da dijîyan. Di nava bajar û bajarokan da, xwe rêxistin kirine. Gel û gerîla kar û barê saloxî kirine. Civînên rêxistinî yên teng û civînên fireh yên gel bestine. Amadekarîyên çalakîyan kirine. Ji bo çalakîyan bikin çek anîne li nav bajaran. Ev karana tev bi veşartî hatine kirin. Ber difna dijmin, hemû karên şoreşê kirine û dijminê wan jî pê nehesîyaye. Di ŞGŞ da veşartîbûn, bi vî awayî pir girîng

e. Tevî veşartinê sirrîyet jî girîng e. Dagirker tevî noker û xayinan, her dem dixwazin agahîyan ji nava gelê şoreşger û gerîla bigire. Da ku karibe hêsanî derbe lê bide. Lewra jî sirrîyet jîyanî ye. Ji bo sirrîyetê gelekî perwerdekirî pêwîst e. Heke gel ne perwerdekirî be, saloxkarên dagirker û noker, bi hin rêbazan, dikarin agahîyan bi dest bixin. Miletek perwerdekirî û şîyar be, zanyarî nade dijminê xwe, lê dikare gelek agahî û zanyarîyan kom bike û bigihîne rêxistina xwe û rêxistin jî sûdekî baş jê bigire. Hem di asta cîhanê da, hem jî di Kurdistanê da, bi pêşketina teknolojî û telekomunîkasyonê, di sedsala 21em da, veşartîbûn û sirrîyet girîngtir bûye. Ji ber teknîka pêşketî gelek şoreşgerên pêşeng hatin şehîd kirin. Lewra di ŞGŞ da sirrîyet, parastin û veşartin, hokarên bingehîn yên serkeftinê ne.

## Întîfadaya Gelê Filistînê

Filistînî miletekî kevnar yê Rojhilata Navîn in. Lê belê zêdetirî sed sal e li gel cihûyan pirsgirêkan dijîn. Pirsgirêkên dîrokî di roja me da jî serê gelan û serê gelê Filistînê diêşînin. Çareserî jî

lazime li gorî rastîya dîrokê be. Hevgirtî, rast û rêveker be. Nexwe pirsgirêk dibin gireya kor û her êş û azarên gelan zêde dibin.

Di bingeha pirsgirêkên filistînîyan da sîyonîzm heye ku xwe dispêre hizreka damezirandina dewleta îsraîlîyan. Ev hizir jî ji alîyê rojnamevan Theodor Herzl ve hatîye pêşxistin. Di pirtûka “Der Judenstaat” Dewleta Cihûyan ya Theodor Herzl di sala 1896ê da hatîye weşandin. Yekem kongreya sîyonîstan di sala 1897ê da hatîye bestin. Jê û şûnda cihû sal bi sal vegerîyane cih û warên bav û kalên xwe. Dema ku cihû vedigerin li ser axa wan î pîroz, sal bi sal xwe rêxistin dikin. Bi vî awayî dest bi dagir kirina erdên filistînîyan dikin. Dewleta Îsraîlê di 14ê gulana 1948ê da tê damezirandin. Ji sala 1960î û şûnda, di navbera filistînî û îsraîlîyan da, her dem şer hebûye. Tevî ku hevdîtin, dan û sitandin hatibin kirin jî pirsgirêk bi temamî çareser nebûye.

Filistînîyan bi rêbazên cur bi cur li ber xwe dane. Çalakîyên takekesî bigire heta çalakîyên komên piçûk, her cure çalakî

kirine. Ji çalakîyên girseyî bigire heta çalakîyên xwebexşî, bi her cureyî li ber xwe dane. Lê belê, di encamê da, her ku cihûyan cih li xwe fireh kirine, cih li filistînîyan teng bûye. Bi milyonan filistînî bûne penaberên welatên cîran. Li Libnan, Urdin, Sûrîye û Misrê bicih bûne. Piranî di wargehên penaberan da dijîn. Di wan waran da jî rastî êrîşên Îsraîlê tên. Bombe li wan tên barandin û bi komî jîyana xwe ji dest didin.

Di 05ê hezîrana 1967ê da, şerê ku bi şerên şeş rojan tê binav kirin derket. Tevî ku Sûrîye, Urdin, Misir tevlî şer bûn, di encamê da filistînîyan derbeka mezin xiwarin.

Di Sala 1982ê da Îsraîlê careka din êrîşî filistînî û libnanîyan kir. Artêşa Îsraîlê heta Beyrûtê çû. Hêzên şerker yên Filistînê derbe xiwarin û paş ve kişîyan. Di wargehên penaberan da, filistînî bê parastin man û bi komî hatin kuştin. Ji vî şerî û şûnda karîna hêzên leşkerî, di filistînîyan da nema.

Di vê demê da PKK jî bi gerîlayên xwe li gel filistînîyan tevlî şer bûn. Deh şehîd dan, hin gerîlayên PKKê birîndar bûn û 15 gerîla jî dîl ketin destê îsraîlîyan.

**JÎN (di dema şer da)**

Gelê Filistînê tevî zehmetîyan û zexta Îsraîlê, tu caran dev ji têkoşîna xwe berneda. Bi bawerîyeka xurt tim li ber xwe da.

Întîfadaya filistînîyan ya girseyî, sala 1987ê dest pê kir. Întîfada li Qita Xazze dest pê kir û di demeka kurt da gihişt Şerîaya Rojava. Întîfadaya filistînîyan heta sala 1993ê dewam kir.

Her çiqas tê gotin: Întîfada ji ber kuştina filistînîyan jixweber dest pê kir, lê di rastîyê da, xwe rêxistin kirina gelê Filistînê heye. Çi milet jixweber, bi awayekî tund, bi salan nikare li ber xwe bide. Lewra lazime bi gotinên ne rast û sivik, berxwedana gelê filistînê neyê piçûk xistin.

## Taktîk û Amûrên Çalakvanên Filistînê

Taktîkê filistînîyan ev bû ku bi girseyî çalakî dikirin. Bi hev ra dikevin nava liv û lebatê. Heke di cihekî da çalakî dest pê kir, di demeka kurt da belavî deverên din dibû. Li gorî her rewşê bi rengekî çalakî dikin. Ji avêtina keviran bigire heta kokteyla molotofan û boykotên giştî, çalakîyên curbicur dikin.

**JÎN (di dema şer da)**

Teknîkê ku di destê çalakîkerên filistînîyan da ye, ji rêzê ye, lê bi bandor e. Ji vana kevir hema bêje di rêza yekem da ye. Çalakîkerên filistînî bi kevir avêtinê tu zirarekî mezin nadin hêzên kujer yên Îsraîlê. Lê avêtina kevir nîşana xwebûnê ye. Nîşandana vîna xwe ye. Ruhê serbilind û radest nabe, derdikeve pêşberî dagirker û cîhanê tev. Lewra kevir avêtin tenê kevir avêtin nine. Di heman demê da wateya xwe ya sîyasî heye. Filistînî bi keviran peyamên sîyasî didin Îsraîlê û cihanê tevî. Bi vî awayî piştgirî ji gelên cîhanê jî distînin.

Filistînî di şer da berkanîyan jî baş bikar tînin. Berkanî amûrek e. Kurd jî berkanî bikar tînin. Di dema zaroktîyê da, zarokên kurdan bi berkanî leyîstokan dileyizin. Berkanî hem pêlîstoka zarokan e hem jî amûra şer e. Gelek amûr jî hene ku pêlîstok in, lê bi demê ra bûne amûrên şer. Jixwe gelek amûrên bi vî awayî hene ku di şeran da hatine bikaranîn. Heke em bi hûrgilî lê binêrin; di serdema me da jî termal kamera ji bo kar hatîye afirandin, lê paşê bûye amûreka şer. Di heman demê da balefirên şer yên bê ajokar jî di destpêkê da, ji bo şopandina

ajalên çolê hatîye afirandin. Ji alîyê jineka îsraîlî ve. Paşê wekî teknîka şer hatîye bikaranîn.

Berkanî di destê gazîyekî şer da -ku her du lingên xwe di bombebarana Îsraîlê da wenda kirîye- bandor li tevahî cîhanê kir. Lê mixabin gazîyê şer paşê jîyana xwe ji dest dide. Ya girîng ev e ku bi dîmenekî pir rakişîner, piropagandayekî baş di asta cîhanê da hat kirin. Heke rastîyeka şeran ra yek jî şerê ragihandin û piropaganda be, filistînî vî şerî pir baş dikin.

Amûreka din ya ku serhildêrên filistînî bikar tînin kewisik e. Kewisik jî pêlîstokeka kevnar ya zarokan e. Bi darikeka çetel, lastîk û çermê tê çêkirin. Filistînî çi mezin çi piçûk, çi jin çi jî mêr vê pêlîstokê dijî leşker û polîsên îsraîlî bikar tînin. Li dijî Îsraîlê hêrs û dijîtîya xwe tînin ziman.

Girev jî rêbazeka çalakîyan e. Gelê Filistînê li gel îsraîlîyan kar dikin. Girseyeka mezin rojane derbasî qadên îsraîlîyan dibin û dixebitin. Çalakîya girevê neçûna kar e. Dema filistînî naçin kar, peyama xwe digihînin Îsraîlê. Bêguman ji nişka ve sekinandina kar, bandora xwe li ser civaka Îsraîlê dike. Aborî

qels dibe. Karên burokratîk disekinin. Kargeh dema nexebitin, zirarê dikin. Bi vî awayî Îsraîl neçar tê hiştin ku daxwazên filistînîyan bipejirîne.

Nekirîna berhemên Îsraîlê, an ku boykot. Nekirîna berhemên welatekî yan jî şîrketekê, zexta aborî li ser wî welatî û wê şîrketê dike. Aborî qels dibe û diravê welat kêmnirx dibin. Di hêla din da jî bandor li sîyaseta navxweyî dike ku desthilat pê tê qels kirin. Bi vî rengî nekirîna berheman bandorê li sîyasetê jî dike. Çalakîya nekirîna berheman hêdîka berbelav dibe û bandora xwe bi demê ra dike.

Çalakîyeka din ya filistînîyan jî li ser dîwaran nivîs nivîsandin e. Bi gelemperî li ser dîwaran dirûşme tên nivîsandin. Li gel vî armanc û xwestek jî tên nivîsandin. Tiştinên pejirandî yan jî nepejirandî tên nivîsandin. Hêrs û kîna ku di dilê mirovan da hene li ser dîwaran tên nivîsandin. Agahî yan jî daxwazî li ser dîwaran tên xêzkirin. Bi kurtî û kurdî, dîwar tê neqişandin. Tişta ku di hiş da heye, bi hevokekê tê nivîsandin. Her kesê ku nivîsa li ser dîwar dibîne, radiweste û li ser dihizire. Kesek

dikare ji nivîsên li ser dîwaran hatine nivîsandin, xiwestek û pirsgirêkên gel nas bike. Heke li ser dîwarekî "Bimire Sîyonîzm" nivîsandî be, kesek têdigihije ku li wî cihî dijberên sîyonîstan hene. Heke li ser dîwarekî "Rêxistina Rizgarîya Filistînê" nivîsandî be, kesek têdigihije ku filistînî dixwazin xwe ji destê dagirker rizgar bikin. Lewra çalakîyên li ser dîwaran nivîs nivîsandinê, çalakîyên berbiçav û girîng in.

Filistînî astengan (barîkat) baş bikar tînin. Bi kurmancîyê ez dê binivîsim asteng. Lê barîkad (*barricade*) navekî bi firansî ye. Bi tiştinên berdest, girtina rêyan û kolanan e. Lê di dirêjahîya dîrokê da tê dîtin ku astengî ji bo parastina gundan, bajaran, zevîyan û cihên pêdivî pê hebe hatine danîn. Bi mijarê ve girêdayî ez dê di milê asteng kirina dijberan da bigirim dest. Piranî çîn, kom, beşên civakê li hember dijber, serdest û dagirkeran astengan datînin. Ji bo hemû deman taktîkekî derbasdar e.

Gelê Filistînê astengan pêşîya polîs û leşkerên Îsraîlê datînin. Di destê Îsraîlê da teknîk û amûrên şer hene. Ji hêla bejahî û

hewayî ve, Îsraîl dikare filistînîyan biperçiqîne. Lê belê filistînî jî ji bo pêşî lê girtina îsraîlîyan, astengan datînin. Bi vî awayî amûrên bitevger (mobîl) tên sekinandin. Ji ber ku Îsraîl tenê bi leşker û polîsan nikare bi filistînîyan. Ji ber ku filistînî mafdar in û gelheya wan li gorî leşker û polîsan zêde ye. Heke teknîka Îsraîlê were asteng kirin, filistînî dikarin li hember Îsraîlê ser bikevin. Gel xwe di pişt astengan da diparêze. Di navbera xwe û dagirkeran da sînor datîne. Bi vî awayî qadeka xweser tê avakirin. Her wiha asteng tê wateya xwe bi fîzîkî ji dijber qut kirinê.

Bikaranîna molotof-kokteyl. Molotof-kokteyl bi awayekî agirîn şewitandina mekan cih, maşîne û amûran e. Di destpêkê da jî di şeran da hatîye bikaranîn. Di bajaran da, ji alîyê gel ve, li dijî leşker û polîsan jî tê bikaranîn. Amadekirina molotof-kokteylê hêsan e. Heke benzîn û şûşeyên cam yên dev girtî hebin, molotof-kokteyl tê çêkirin. Fitîlekî bi pê ra tê bestin û tê pêxistin. Piranî zirarekî madî digihîne dijmin. Li hemû deverên cîhanê molotof-kokteyl tê bikaranîn.

**JÎN (di dema şer da)**

Girseyên çalakîker yên Filistînê molotof-kokteylê bikar tînin. Li gorî teknîka ku di destê Îsraîlê da ye, molotof-kokteyl sivik dimîne, lê dema bi berbelav û zêde bête bikaranîn, bandora xwe di çalakîyên girseyan da heye.

Molotof-kokteyl ji alîyê tîman ve jî tên bikaranîn. Şev yan roj, veşartî yan aşkera, kesek yan çend kes, dikarin bi molotof-kokteyl çalakîyan bikin. Tişta ku gelê Filistînê jî dike her ev e.

## Întîfadaya Duyem

Întîfadaya duyem ya filistînîyan, di sala 2000î da dest pê dike. Ji ber lêgerînên çareserîyê bi encam nebûn, întîfadaya duyem derket holê. Êdî pirsgirêk bû nav dewletî û nav netewî. Hevdîtin ser hev hatin kirin. Di serî da DYA kete navberê, lê nedikarî çareserîyeka hêja bîne. Gelan jî di asta cîhanê da piştgirîya Filistînê kirin, lê encamekî bê pejirandin derneket holê. Tevî vê partîyeka weka HAMAS jî bi hêz bû û bû xwedî gotin. HAMAS partîyeka bi guman e. Di nava filistînîyan da,

dînê sîyasî pêş dixîne. Bi kar û sîyaseta xwe dihêle ku Îsraîl zêdetir êrîşan bibe ser Filistînê. Wekî hespekî tiruvayê dixuyê. Têkoşîna Filistînê qels dike. Di heman demê da parçe jî dike. Lê gel her çawa be li ber xwe dide.

Di dema întîfadaya duyem da, Îsraîl hin cihên filistînîyan ji nû ve dagir kir. Ew jî bû sedem ku filistînî serî rakin. Ji ber nebûna hêzên leşkerî yan jî hêzên parastinê, filistînîyan rêbazên xwe yên gelêrî bikar anîn. Teknîk û taktîkên wan her wekî întîfadaya yekem bû. Tişta ku cihê mixabinîyê ye, ev e ku: Gelê filistînê di hundir û derve da bûye pêlîstokê hêzên berjewendîperest. Bi vî awayî pirsgirêk nayin çareser kirin û ji êrîşên Îsraîlê ra rê tê vekirin.

## Rewşa Dawî

Filistînî hîna ber xwe didin û berkanî, kewisik, molotof di destê gelê Filistînê da ye. Li gorî daneyên Rêxistina Bexşînê ya Navnetewî, filistînî dema ku ji axa xwe hatin derxistin xwedî gelheyeka 700 hezarî bûn. Niha jimareya wan 5,2 milyon e.

**JÎN (di dema şer da)**

Piranî 100 kîlometre dûrî cihê xwe yê resen in. Li ser welatên cîran belav bûne.

Filistînîyan di sala 2018ê da çalakî dan destpêkirin. Di roja erd da dest bi çalakîya vegerê kirin. Li ber sînorê ku Îsraîlê danîye li ber xwe dan. Filistînî birîndar bûn, jîyana xwe ji dest dan. Lê molotof-kokteyl her di destê wan da bû. Vîneka xurt di filistînîyan da heye. Yan dê mafên xwe bi dest bixin yan jî dê her dem li ber xwe bidin.

Çareserîya bingehîn jî ev e ku: Lazime Îsraîl dev ji netewa dewletdar berde. Ya girîng jî gelê filistînî û îsraîlî vîna xwe ya sîyasî û rêvebirinê derxin pêş û xurt bikin. Her du gel dikarin hizra Netewa Demokratîk bipejirînin û bi hev ra wekî xwîşk û bira bijîn.

## Têkoşîna Zapatîsta (Ezmûneka Balkêş)

Her nerazîbûneka civakî xwe dispêre dîroka wê civakê. Di encama bindestî, mêtinkerî û hwd da civak serî radike û digihê mafên xwe. Zanîna dîrokê û encamên ku jê tên derxistin dihêle

ku civak xwedî li xwe derkeve. Di nava civakê da beşekî mirovan hejmar hindik lê şîyar û zane derdikevin û pêşengtîyê dikin. Wekî ku tov bigihije ax, av û hewayê û şîn bibe; komek pêşeng hizra xwe bera nav civakê dide û ew hizir şîn dibe. Êdî jê şûnda rêya azadî û demokrasîyê vedibe. Kes bi hêsanî mirina xwe didin ber çavan û dest bi têkoşînê dikin. Çi bi çekdarî, çi jî bi rêbazên cur bi cur têkoşîn tê kirin.

*Ji hikûmetên zalim di dest da kum (şapka) na, bi çek mafê xwe bixwazin*. Gotineka navdar ya zapatîstayan wiha ye. Bi vê bîr û bawerîyê dest bi têkoşîna çekdarî kirin. Lê berîya vî pêwîste mirov berê xwe bide dîroka parzemîna Amerîkayê. Parzemîna Amerîka xwedî dîrokeka sade yê şaristanîyan e. Gelên parzemîna Amerîka yên herî zêde tên zanîn maya û aztek in, lê wekî din gelek milet li ser parzemîna Amerîkayê dijîn. Xwedî gelek ziman û zaravayan in. Xwedî kulturekî zengîn in. Bi awayekî xwezayî dijîyan. Heta ku ji parzemîna Ewropa dagirker çûn û jîyana wan serûbin kirin.

Zêdetirî 5 sed sal e li parzemîna Amerîka gelên xwecihî tên

kuştin. Tên penaber kirin. Keda wan tê mêtin û hwd. Serê sedsala 16em û şûnda li Meksîka jî heman dîrok derbasdare. Serê sedsala 20em şoreş tê kirin. Ji 1910 heta 1920an, bi seroktîya Emîlîyano Zapata (emiililjãno saãpata) bi taybet gundî digihijin hin mafên xwe. Jê û şûnda dîrok wekî berê gav bi gav tê hunandin û gundî û kedkar mafên xwe yên jîyanê ji dest didin.

Wekî ku di gelek şoreşan da jî hatîye dîtin, li Meksîkayê jî destpêka şoreşê paytexta welat û zanîngeh in. Komek xwendekar û hînker Markos (Marcos) biryar didin ku ji bo mayayan dest bi têkoşînê bikin. Berê xwe didin herêma Çîyapas (Chiapas). Ev kom xwe wekî zapatîstayî bi nav dikin. Diçin nav gel. Lê ji alîyê gel ve nayin pejirandin. Zapatîstî dihizirin ku çi bikin. Piştra xwe berdidin nava gundîyan û bi wan ra di nav erd û zevîyan da kar dikin. Xwe dixin dilê gel û pêdepêde armancên xwe ji gundîyan ra vedibêjin. Bi vî awayî tên pejirandin. Lê vê carê jî dêr û cizvîtên xirîstîyantîyê pêşîya wan asteng in. Bi vê yekê ra jî têdikoşin. Ji sala 1982 heta sala

**JÎN (di dema şer da)**

1994an xwe rêxistin dikin.

Zapatîstayî dibînin ku bêyî ku hêzekî çekdar hebe tu tişt nikare were kirin. Lewra Artêşa Rizgarîya Netewî ya Zapatîsta (EZLN) tê damezirandin. Gundî, kedkar, jin, xwebexş tevlî vê artêşê dibin.

Desthilatîya Meksîka tevlî peymana NAFTA dibe ku peymaneka ji bo bazirganîya serbest e, an ku bazirganîya lîberal. Di vê demê da desthilatî di makezagona dewletê da jî di xala 27em da guhertinan dike ku ev xal mafê gundîyan diparêze. Ev xal nahêle ku erdên gundan werin firotin û wekî milkê taybet were destgirtin. Bi vê peymanê alozî kûrtir dibe. Lê kanûna paşîn 1994ê ku peyman dikeve merîyetê, zapatîstî dest bi şer dikin. Bajar û bajarokan bi dest dixin û pêdepêde pergala xwe saz dikin.

Bi vî awayî pêvajoyeka nû dest pê dike. Bi desthilatîya Meksîka ra hevdîtin çêdibin. Zapatîstî dest bi meşeka dirêj kirin û heta paytex Meksîkayê çûn. Wekî ku tê xwestin peyman nehatîye bestin. Qanûn nehatîye sererast kirin. Lê belê di

merîyetê da (de facto) pergala zapatîstayan heye.

Berîya ku Tevgera Zapatîsta dest bi têkoşînê bike, di nav niştecihên Çîyapas da pirsgirêkên giran hene. Ji mafên azadî, demokrasî û wekhevîyê bê par in. Rewşa jinan pir di asteka ketî da ye. Tenduristî, perwerde pir bi pirsgirêk e. Aborîya civakî di rewşeka ne baş da ye. Lewra Tevgera Zapatîsta ne tenê li hember desthilatîya dewletê an ku dewletê têdikoşe. Ew têkoşîna bingehîn di nav civaka xwe da dikin. Bi vê rewşa xwe jî pir dişibin gelê kurd. Zapatîstayan hem asta civaka xwe bilind kirin hem jî pergala xwe wekî ew dixwazin xistin merîyetê.

Zapatîstayî demokrasîya civakî an ku redîkal pejirandine. Biryar ji jêr ve di encama galgaleyan da tên girtin. Artêş bi halê xwe ye. Meclîs bi halê xwe ne. Komin jî bi halê xwe, lê hemû di dorhêlekê da digihijin hev. Kooperatîf hene û kominal in. Pergaleka bi vî awayî hatîye pêşxistin.

Gelê herêma Çîyapas an ku mayayî, asta zanebûnê bilind kirine. Di parastina wî gelî da dîyardeya bingehîn jî ev e. Li

**JÎN (di dema şer da)**

Çîyapasê wekî hêzên parastina cewher artêş hatîye damezirandin. Çîyapasî di nav vê artêşê da cihê xwe digirin. Bêguman her yek bi awayekî. Ciwan çek hildigirin, jin tevlî dibin û fermandarîyê dikin, yên mayî jî ji pişt ve alîkarîya artêşê dikin. Şerê dest danîna ser bajaran 7 heta 10 rojan dewam dikin. Piştra dem bi dem bi artêşa dewletê ra şer derdikeve. Bi vî awayî Tevgera Zapatîsta qasî ku tê xwestin çek bikar anîye û şer kirine. Zapatîsta ji derve ve tiştek jiber nekirîye û di welatê xwe da nexistîye merîyetê. Şert û mercên xwe nirxandine û li gor wê rewşê jî rêbazên leşkerî û civakî bi pêş xistine.

Ji têkoşîn û şoreşa Zapatîsta jî em têdigihijin ku Şerê Gel Yê Şoreşgerî şerekî dorfireh e. Di bingehê xwe da perwerde heye. Hem perwerdeyê civakî hem jî perwerdeyê leşkerî. Hevgirtin û bi hev ra têkoşîn kirin jî girîng e. Pêwîste rewşa cîhanê baş were nirxandin û li gor wî gav bên avêtin û sîyaset bê dîyar kirin. Ji ber ku tenê bi hêza çek serkeftin bi dest nakeve. Dîplomasî girîng e. Dan û sitandinên navxweyî divê serkeftî

bin. Bi hêzên cîhanî yên demokrat û şoreşger ra divê girêdaneka ji dil hebe. Li hember dewletan û desthilatan pêwîste şîyarî hebe. Ji ber ku derewîn in û tim xapandinê dikin. Di cîhana me ya gilobal da tora înternetê girîng e. Zapatîstayan ev tor bi serkeftî bikar anîye û dengê xwe gihandîye cîhanê. Çi dewlet çi jî gelên cîhanê, dengên Zapatîsta bihîst. Ji ber ku Zapatîstayan piropagandayekî baş dikir.

Bi têkoşîna Zapatîsta, rastîyeka din derket holê. Bêyî ku dewlet were armanc kirin, civak dikare xwe bi pêş bixîne. Civakeka bindest di welatekî mêtingeh da ne neçar e ku dewleta heye birûxîne û şûna wê jî dewleta xwe damezirîne. Jixwe ji sedsala bîstem, em vê rastîyê baş hîn bûn. Heke dewlet were damezirandin jî kedkar û bindest azad nabin. Nagihijin mafên xwe yên bingehîn. Lewra bi bîrdozîyeka rast û civakî, bi parastina rewa, bi şerekî di cih da, her gel dikare xwe azad bike.

Ji bo parastinê bi çek bikaranînê da Zapatîsta du rêbaz pejirandîye. Ya yekem parastina li hember dewlet û hêzên

leşkerî, ewlekarî û hwd e. Ya duyem jî parastina navxweyî ye. Hêzên leşkerî û ewlekarî aramîya civakê diparêzin. Ji ber vê yekê li herêma Çîyapas asta tawan û tawanbaran, li gor herêmên din pir kêm e. Li Çîyapas ê hêzên parastinê xwe têkilî karên rêvebirinê nakin. Ew meclîs, komin, gund û bajaran diparêzin. Mafê wan yê destwerdanê nîne.

Tevî şoreşa PKKê şoreşa Zapatîsta jî, ji bo sedsala 21em mînakeka balkêş e. Hêza dewletên mezin yan jî piçûk çi dibe bila bibe, li hember wan her gel dikare têkoşîn bike. Dikare şoreşê ser bixe. Ya girîng ne dewletên mezin, hêza wan, artêşên wan, teknîka şer ya wan e, ya girîng bi bîrdozîyeka hemdem rabûna gelan e. Gelê maya li Çîyapasê bi xwîn û keda xwe serkeftin bi dest xist. Hîna dawî li têkoşînê nehatîye û gelê maya bi biryar têdikoşe.

## Di Dîroka Kurdan Da ŞGŞ

Damarên gelê kurd digihijin hezaran salan. Di dirêjahîya dîrokê da, her çiqas navên pêşîyên kurdan hatibin guhertin jî, kurd zêdetirî 10 hezar sal e li ser rêçekê jîyane û xwe gihandine dema ku em niha tê da ne. Pêşîyên kurdan li ser erdê xwe yê niha an ku Kurdistan, jîyaneka berhemdar afirandine û bandora xwe li dîroka cîhanê kirine.

Rastîya dîrokê dide nîşandan ku gelên ku dewlet û împaratorîyên zordar ava kirine, bi demê ra yan pir hindik mane yan jî ji holê rabûne. Lê gelê kurd nebûye xwedî dewletên zordar û împarator û dîktatoran. Lewra jî di her serdemên dîrokê da xwe bi awayekî parastine. Ji ber ku yên zilmê dikin zilmê jî dibînin. Pêşîyên kurdan û kurdan her xwestine bi aştîyane bijîn. Di hişê kurdan da timî xwîşk û biratî heye. Lewra her çiqas pergalên navendî û hişk ava nekiribin jî li ser hemdê xwe mane. Tevî vê yekê, kultur, zanist û zimanekî zengîn kirine malê Rojhilata Navîn.

## Peyman û Bêpeymanî

Bêguman ji bo netew, gel, çîn, dewlet, kom, komik, partî û hwd peyman an ku lihev kirin girîng e. Lihev hatinên bi vî rengî sînerjî çê dike. Dihêle ku serkeftin bi dest bikeve. Di dozên civakî da mafdarbûn bi tena serê xwe têra serkeftinê nake. Lazime lihev kirin hebe. Lihev kirin an ku peyman çiqas bi baş û bi hêz be ewqasî bandorê li şer dike.

Serkeftina mezin û dîrokî ya pêşîyên kurdan damezirandina Konfederasyona Medan e. Bi vê konfederasyonê medan bi babilan ra hevpeyman çêkirine û wisa jî împaratorîya aşûrîyan ya zordar rûxandine. Di dirêjahîya dîroka kurdan da ev yek bi aşkera tê dîtin; her dema ku kurdan peyman bi gelên din ra çêkirine ser ketine. Dema ku kurd bê lihev kirin mane û dijberên wan peyman çêkiribin ew dijber ser ketine.

Sedsalên 19em 20em û 21em bi bê peyman derbas bûn. Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd hewil dide da ku karibe vê çarenûsê biguherîne.

**JÎN (di dema şer da)**

Zêdetirî du sed sal e kurd serxwebûnî û azadîya xwe digerin. Bi taybet serhildana babanzadeyan ku li bajarê Silêmanîyê serî rakirin û şûnda, heta salên dawî an ku çaryeka sedsala bîst û yekem ya dawî, hîna jî kurdan bi tu gel û dewletan ra peymanên sitratejîk -çi nivîskî be û çi jî bi devkî- mor nekirine. Rêber Apo di vî mijarê da şîyar e. Dema ku li sala 1973ê dest bi têkoşînê kir, hevalên xwe tevî kurdan ji nava laz, tirkmen û hwd bijart. Hîma xwîşk û biratîya gelan danî. Piştî ku dîl ket destê dijmin, di hizir, bîr û bawerîya xwe da pêşdetir çû. Lewra bi hizreka hemdem û çareserker, pirojeya Netewa Demokratîk bi pêş xist. Îcar ji ber ku Netewa Demokratîk hizreka rast, xwecihî û serkeftî ye, dibe armanca dagirker û dewletên zirhêz.

Li her çar alîyên welat, bi dehan salan, bi dehan serhildan hatin kirin. Kurdan tu carî nîrê koletîyê nepejirand û dij derketin. Lê belê yên bihêztir tim dagirker û împarator bûn. Heke em serkeftineka misogerbûyî dixwazin, lazime berê xwe bidin nava xwe. Nava xwe paqij bikin û bi gelên Rojhilata Navîn ra peymanên sitratejîk bi pêş bixin. Ji bo me kurdan û gelên ku li

herêmê dijîn, tekane çare ev e. Bi dewletên dagirker, bi dewletên herêmê û bi dewletên mezin ên cîhanê ra jî hevdîtin û dan û sitandin heye. Ev asayîye û lazime hebe. Lê ev hevdîtin û dan û sitandin nabin hevdîtin û dan û sitandinên sitratejîk. Tenê dibin têkilî û peymanên taktîkî û demkî.

Ji ber xweşikbûn û zengînîya erdnîgarîya Kurdistanê, tim dagirkeran çav berdaye. Ser erd û bin erdê Kurdistanê gencîne (xezîne) ye. Çem û robarên xwe yên xwedî ava zelal û pak hene. Di asta cîhanê da jî her ku diçe pêwîstîya ava şêrîn zêdetir dibe. Lewra di paşerojê da, Kurdistan dibe ku bibe armancên dewletên mezin û yên herêmê. Keş û hewayê Kurdistanê pak e. Xwezaya xwe zengîn e. Lewra dikare aborîya xwe bi xwe saz bike. Ji ber van sedeman kurd dibin armancên dewletan. Lê derfetekî zêrîn jî di destê kurdan da heye ku dikarin şoreşê bi ser bixin û bandora xwe li Rojhilata Navîn û cîhanê bikin.

Çawa ku di dema şoreşa gundan da, pêşî li mirovahîyê hat vekirin, kurd dikarin niha jî rêya azadîyê ji bo hemû gelan

vekin. Çawa ku di dema medan da serkeftineka rewşedar (muhteşem) bi dest medan ket; di serdema me da jî kurd dikarin rêyeka ronî vekin û pirsgirêkên mirovahîyê çareser bikin. Ev derfet tenê di destê kurdan da heye. Çi bi başî û çi jî bi nebaşî, kurd her çi bikin bandora xwe di serî da li Rojhilata Navîn û cîhanê dike. Pêdepêde di asta gilobal da dibin jêdera guhertin û veguhertinan. Lewra pir girîng e ku kurd bi gelên Rojhilata Navîn ra peymanan çêkin. Bicivin, lihev werin û hêzeka civakî ava bikin. Di nav vê da hêza leşkerî jî hebe. Ji ber ku di serdema me da bêyî ku hêzên leşkerî hebin, tu hêz nikare bibe xwedî gotin. Bi rengên xwe, bi hev ra û di nav hev da jîyan kirina gelan girîng e. Tenê em bi vê hişmendîyê dikarin paşerojeka azad ava bikin. Tişta ku niha tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd dike jî her ev e.

## Serhildanên Sala 1800î û Şûnda

Serhildanên kurdan her çiqas serkeftî nebin jî, divê were zanîn ku heke ev serhildan nebûna, navê kurdan dê ji dîrokê bihata jêbirin. Lewra her serhildanekî kurdan xwedî wateyeka girîng

**JÎN (di dema şer da)**

e. Çi serhildanên mezin û dorfireh, çi jî serhildanên piçûk û herêmî bin, ji bo nifşa me xwedî girîngîyekî ne. Her çiqas di encama serhildanan da darvekirin, komkujî, sirgun hebe jî, van serhildanan hiştiye ku kurd bigihijin serdema me. Ya girîng ev e ku vê carê em azadî û pergala gelê xwe bi cîhanê bidin pejirandin.

Serhildanên ku çê bûne, heke xwedî serokên hemdem bana dê serkeftî bana. Hizir û bîr û bawerî ne kevnar lê şaristanî bana dîsa dê ser biketana. Di vê dema netewîyetê da, bi bîreka netewî têkoşîn hebûya, dê teqez ser biketana. Ji ber ku di asta cihanê da hin gelan bi hizra netewî xwe rizgar kirin. Lê mixabin bi dehan gel jî ji holê rabûn yan jî bi hejmarekî kêm mane.

Serokên serhildanên kurdan destpêkê mîr bûn. Piştra şêx derketin pêş û seroktî kirin. Salên 1970î û şûnda serokên xwende yê çîna navîn derketin pêş. Wekî Dr. Evdilrehman Qasimlo, Dr. Şivan an ku Saît Kirmizitoprak, Faîk Bucak, Birahîm Ehmed û hwd. Van serokan bi dil û mejîyekî sade

têkoşîyan, lê serkeftî nebûn. Ji ber sedemên navxweyî û derve.

Her serhildanên ku çêbûne bêguman bi gel çêbûne. Kurdan bi artêşeka bi rêxistinkirî û pispor şer nekirîye. Lewra şer û serhildanên kurdan bi temamî gelêrî ne. Ji nav gel fermandarên leheng derketine. Lê serokên hemdem û serkeftî derneketine. Jin û ciwanên kurdan risteka girîng girtine ser xwe. Jinan hem di şer da risteka baş gerandine, hem jî ji bo ku mêr şer bikin, bûne xwedî helwest. Jinan kî li hember dijmin şer kiribe mêr didîtin. Hiştine ku mêr berê xwe bidin dagirkeran û bêtirs şer bikin. Dayîkan şîret li kuran kirine ku heke ew kur li hember dijmin şer nekin, şîrê dêya wan li wan helal û xweş nabe. Dayîkan li ser kurên xwe yên şehîd û serî jêkirî lorandine û gotine: “Min ji bo rojekê wisa şîr dayê.” Ev hişmendîya tevahî dayîkên welatparêz yên kurdan e. Lewra dayîkên kurdan hêmaneka girîng yê şer in ku gel li hember dagirkeran bi hêz dike.

Di hin serhildanan da kêm caran talankarî derketibe jî bi giştî di serhildanan da gel û şerker bi hev ra bûne. Di nav hev da û

bi piştgirîya gel şerkeran şer kirîye. Bi serkeftinên şerkeran gel azad bûye. Di têkçûnan da jî gel rûbirûyê komkujîyan bûye. Ji bo vê yekê li ser erdê xwe bi hev ra li hember dagirkeran şer kirin pir girîng e.

## Ezmûna Komara Mehabadê

Komara Mehabadê bi ruhekî kurdewar û bi ruhekî bilind hat damezirandin. Derfetên demê -ji ber şerê cîhanê yê duyem-dest didan ku komarek were saz kirin. Komar hat saz kirin. Pergala xwe jî danî. Yazdeh mehan li ser lingan ma. Lê di wê demê da amadekarîyên baş nehatin kirin. Komarê xwe nesipart hêza xwe ya cewher. Xwe nesipart hêza gel. Li gor hevsengîyên nav dewletî tev gerîya. Piranî jî dagirker baş nas nekiribûn. Nedizanîn ku di derfetekî herî piçûk da dijmin dê êrîşê wan bike û wan ji holê rake. Yan jî karîn û zanîna wan têra vê yekê nedikir. Di encamê da bi awayekî bi dilêş komar ket. Heke Komara Mehabadê bi hin dewletan ra peymanên baş mor kiriba, dibe ku rewş cuda bûba. Heke artêşeka tekuz hatiba saz kirin û şerekî baş kiriba, dibe ku komar neketiba. Mele

**JÎN (di dema şer da)**

Mistefa Barzanî tevî berdestên xwe nerevîba û xiyanet nekiriba, dibe ku rewş cuda bûba. Wezareta parastinê amadekarîyên baş kiriba, dê rewş cuda bûba. Leşker, pêşmerge û gel bi hev ra li ber xwe dabana; paşeroja komarê jî cuda dibû.

Dersên ku em ji vê ezmûnê derxin ev in:

1) Lazime dijmin baş were nas kirin.

2) Her tim hêza cewher bingeh be.

3) Bi hin dewletan ra lihev kirin çêdibe, lê çênabe pişta xwe bidî dewlet yan jî dewletan.

4) Lazime ji hêla leşkerî ve ji dijminê xwe xurttir bî.

5) Lazime gel ji şer û berxwedanê ra bête amade kirin.

6) Binê erdî û serê erdî ji şer ra bête amade kirin.

## Rojhilatê Kurdistanê (Vegotina Emîrê Kerîmî)

Li Îranê pirsgirêka kurdan bi dewletê ra ne tenê di dema modern da dest pê kir, di dema kevin da jî hebû. Li Îranê

şêwazê dewletê, şêwazê lewaz kirina kurdan bû. Dewleta parsan ya xumeynîyan dema ku li ser esasê ku kurdan (medan) lewaz bike û bi xwe li ser rûnê hatîye damezirandin. Hêzê wan bikar bîne û nahêle xurt bibin. Ew sîyaset her dewam kirîye. Ji ber hindê her tim pirsgirêk di navbera dewlet û kurdan da hebû. Pirsgirêk di dema Sasanîyan da pir zêde bû. Dîroka wan pire li êl an girûpên etnîkî ku li hember dewletê disekinîn û dewlet hewil dida wan serkut bike û li hember wan şer bike. Çi kirine di dema Sasanîyan da? Tiştek pir girîng çêdibe ku dewlet tebeqeyek ji kurdan çêdike. Li gorî xwe û li ser navê sasanîyan li Kurdistanê hikûm dikin. Wê demê tebeqeyeka kurdan ya desthilat çêdibe û dibe destikê dewletê.

Di kontrol kirina civaka kurdan da tebeqeya jor a kurdan jî her tim bi kurdan ra pirsgirêk jîyan kirine. Rist û rola tebeqeya jor a kurdan di nav desthilatîyê da hebû. Ew kes rist û roleka bingehîn di nava desthilatê da lîstine. Lê belê dewlet çi kirîye? Dema xwestine bi hêz bibin, kurdên noker jî tune kirine. Mesela, fermandarê mezin yê leşkerî yê sasanîyan -sasanî jî di

eslê xwe da kurd in- fermandeyên leşkerî yê wan ê mezin hemû kurd in. Ên gel Romayê şerên mezin qezenc kirine, lê yek ji wan jî di şer da nehatîye kuştin. Hemû bi destê sasanîyan hatin kuştin. Ev yek jî balkêş e. Ez çima vî dibêjim, ji bo ku bêjim her tim pirsgirêkek heye. Dewletek heye ku tim dixwaze kurd di bin hakîmîyeta wê da bin. Gerek bên bikar anîn û bihêz nebin. Ew sîyaset dema qecara jî hatîye kirin. Hûn dizanin. Piştî ku ew xîlafeta Ebasî çû û Mexol hatin, demekî di Îranê da hikûmetên herêm, hikûmetên girêdayî Mexol hebû. Ên girêdayî Xanîyan hebû. Ên Qereqoyînlî hebûn. Hema bêje desthilateka ku hemû erdnîgarîyê bigire bin destê xwe tune bû, heta hatina safewîyan.

Safewîyan cara yekem xwestin piştî îslamê şêweyê desthilatîya kevin ya îranîyan vegerîne. Xwestin zindî bikin li ser navê îdeolojîyeka şîî. Erdnîgarîyeka fireh girtin û bi osmanîyan ra jî şer kirin. Ji bo wan kurd heyînekî girîng bû. Yek li gor bîra xwe ya dîrokî ji kurdan ditirsîyan û dixwestin kurdan kontrol bikin. Destpêkê safewî pir giran bi ser da çûn û komkujî pêş xistin.

**JÎN (di dema şer da)**

Piştra ji bo ku karibin li hember osmanîyan bisekinin pêwîstîya wan bi kurdan hebû. Ji ber wê, hinekî têkilîya xwe bi kurdan ra li ber çavan girtin. Li ser kurdên bakurê Kurdistanê gelek xebitîn. Rêxistinên xwe heta Dêrsimê birin. Wisa jî safewîyan pêvajoyek dan dest pê kirin, lê dîsa jî heman sîyaset bikar dianîn û nehiştin kurd bi hêz bibin. Ji ber hindê meyze bikin dema ku şer bi osmanîyan ra hebe kurdan baş bikar tîne. Piştra dema ku hevsengî û tewazunek çêdibe, di navbera wan û osmanîyan da, vê carê ji wan êlan ditirse. Ji ber ku her kes para xwe ji desthilatê dixwaze û formûlê wan jî heye bi taybet jî di dema Şah Ebas da ku hikûmek navendîtir bikin. Ji ber vê yekê çi dikin? Ji bo ji wan rizgar bibin, hemûyan dişînin cihên dur. Lê di esas da wan koçber û sirgun dikirin.

Mînak: Celalîyan dişînin Xorasanê. Parek ji kurdê Dêrsimê jî dişînin Xorasanê. Hinek tirkmen dişînin Gurcistanê. Demografîya diguherin. Bi vî awayî dixwazin kontrolekî çêbikin. Jixwe bi vî awayî pirsgirêk zêdetir bûn. Dema qacar hatin, pirsgirêk berdewam bû. Bi rengekî bi hoz û êlan ra

peymanên qacaran hebûn. Sîyaseteka wan hebû, çiqas di navbera êlan da pirsgirêk hebe, hakîmîyeta wan heye. Sîyaseta wan ew bû: Pirsgirêkan çêke û hikûm bike. Du êl bi hev ra şer bike, her carê alîkarîya yek ji wan dikirin. Ji bo ku her tim qels bimînin. Di nav êlan da konfederasyon hebû, di nav çend êlên mezin. Ji wê desthilatê du bira û du pismaman bi hev ra şer dikirin. Her carê yek destek dikirin. Di nav wan da her tim pirsgirêk çêdikirin.

Qacar di eslê xwe da tirkmen bûn. Ew û sersor an ku qizilbaş di nava peymanê da bûn. Ji bakurê Îranê hatibûn. Di peymana qizilbaşan da li gel safewîyan bûn. Piştî safewîyan, xwestin hikûm bigirin, lê şikestin. Di dema zindîyan da şikestin. Piştra karîbûn xwe bi rêxistin bikin. Navenda desthilatîya xwe ji Îsfahanê anîn Tehranê. Jixwe Tehran wan çêkir. Tehran berê bajarokek bû, wan kire navenda Îranê. Du navendên wan hebûn. Cihê hikûmetê Tehran bû. Yek jî ji bo perwerdeya şahzadeyan Tebrîz bû. Wisa kurd dikirin qacar. Wisa ne tenê bi kurdan dikirin, bi hemû miletan dikirin. Xayîntî, dirutî, fen û

fûtên qacaran navdar in. Belucî pir qala wan dikin. Ereb, kurd qala wan dikin. Ev tiştana qacaran kirin û wekî osmanîyan, di sedsala 19em da qels bûn. Di sedsala 19em da, wekî ku Rêbertî gotîye; tu biryarên qacara bêyî Îngilîstan û Rusya nehatîye girtin. Hamûyan bertîl dixwarin. Rus û îngilîzan hemû mirovên wan kirîbûn û yê nedihat kirîn tesfiyê dikirin û bandora xwe li ser şah jî dikirin. Ew teslîmî sîyasetê wan bûbûn û di sedsala 19em da lewaz bûn û hikûmetên wan bi çêkirina pirsgirêkan mijûl dibûn. Di dema qacaran da jixwe serhildana Şêx Ubeydullah çêbû. Şêx Ubeydullahî beşekî rojhilatê Kurdistanê girt. Zêdeyî xwe kurdên rojhilat êlên herêma Urmîye û jêr da murîdên wî bûn. Ew bi xwe şêxê neqşîbendî bû. Wan destek kirin û Şêx Ubeydullah ta nêzîkî Tebrîzê çû. Lê li vê derê şikest. Bi destê artêşê û fermandarên leşkerî ew hat şikênandin. Ew jî bi xwe kurd e. Di vê demê da jî êlên kurdan bi hêz dibûn. Yek ji wan Cafer Axayê Şikakî bû. Şikakî bi xwe konfederasyonê çend êlên mezin e. Li herêma Urmîye hetanî Xoy û Selmas ew herêm hemû di destê wan da bû.

**JÎN (di dema şer da)**

Pirsgirêk di navbera Cafer Axa û hikûmetê da çêbû. Wê demê ji Tebrîzê bangî wî kirin û soz danê ku pirsgirêk çareser bikin û heta wî xelat bikin. Li ser vê bangkirinê Cafer Axa çû, lê ew li wir girtin û kuştin. Bi xayintî kuştin û ew bû pirsgirêkekî mezin. Bawerîya êlên kurdan bi qacaran nema. Wê demê birayê wî biçûk Simaîl Axayê Simko soz da ku tola birayê xwe hilde. Di sala 1906î da, çawa li Tirkîyeyê şoreşa meşrûîyet çêbû li Îranê jî çêbû. Ji ber vê hindê dewleta navendî lewaz bû. Esas ew şoreşa meşrûîyetê îngilîzan dixwestin. Pîlana wan ew bû ku netew dewletê çêbikin. Wan meşrûîyet dixwestin. Meşrûîyet çêbû. Parlamento çêbû. Rista şah lewaz bû. Wisa dewlet netew gav bi gav çêdibû. Jê ra çi lazim bû? Meşrûîyet tenê têrê nedikir. Ji wan ra hêzek merkezîtir lazim bû. Îngilîzan berê li ser kar kiribûn, di dema qacaran da Nesredîn şahê qacaran bû. Şahê herî mezin yê qacaran ew bû. Di dema wî da îngilîzan endamekî xwe ku eslê xwe hindî bû ji wan zerdeştîyên Hindistanê bû, ji Hindistanê şandin û kirin serokê zerdeştîyên Îranê û şandin nava qesrê Şah Nesredîn ku navê xwe Erdeşîr Jêy bû. Erdeşîr Jêy zilamê taybet ên îngilîzan bû.

**JÎN (di dema şer da)**

Perwerdekirî bû û navê Sêr dabûnê. Sêr Erdeşîr Jêy bi navê keyatîya îngilîzan kar dikir. Ew hat bingeha hizra netewî li Îranê çêkir. Li ser esasê ku Îran berîya îslamê pir mezin e û li Îranê zerdeştî pir pêşketî ne. Şaristanîyek pir mezin hebû. Îslamîyet hat û ew şaristanî xirab kir.

Wê demê dîrokzan hatin Îranê. Bi taybet hinek gîrîşname hatin lêkolîn kirin û dîrokek modern ji Îranê ra çêkirin. Dîrokek ku berê haya Îranê pir jê tune bû. Wan qala parsan û kuruşan kirin. Di dema parsan da Îran împaratorîyek wisa pir mezin bû. Xeyalên wan bingeha netewperestî dida avakirin û xwe xistin nava qesrê û bi bertîl û tiştên wisa cihên xwe yên sîyasî jî çêkirin. Wê demê efserekî leşkerî yê Îranê hebû û bi eslê xwe ji Mazanderanê bû. Ne faris bû navê xwe Reza Mîr Penc e. Ev xistin çavê xwe ji bo kadroyên xwe bidin pêş. Yek jî hebû sîyasî bû. Sîyasîyekî gendel û dîktator bû. Navê xwe Seyîd Riza bû. Ev anîn û bi destê wan derbe çêkirin. Şah anîn Tehranê û ew girtin. Paşê şah bê erk kirin. Seyîd Riza kirin serokwezîr û Reza Mîr Penc kirin serleşker.

**JÎN (di dema şer da)**

Wê demê karê Reza Mîr çi bû? Karê wî serhildanên kurdên Kurdistanê, Kirmaşanê, serhildanên ereban, serhildanên belocan, kurdên Xorasanê û serhildanên Îlamê hemûyan tune bike û wisa jî kir. Ev gel bi piştgirîya dewletên ewropî û îngilîzan tune kirin. Ji bo wan gefa herî mezin Simkoyê Şikakî bû. Jixwe Simkoyê Şikakî bi xiyanet kuştin. Reza Mîr êdî wekî lehengekî vegerîya Tehranê. Şoreşa bakurê Îranê, Îlamê ku sosyalîst ji xwe ra çêkiribûn wan hemû tune kirin. Îcar Seyîd Riza jî dan alîyekî. Ji ber ku milet jê hez nedikir û li parlamentoyê got ez ê komarê çêkim û tiştê ku jê dihat xwestin ev bû ji Riza Xan, dema ku komar çêke li meclîsê melayan gotin: “Em komarê naxwazin.” Îran her tim bi şahtî dihat bi rê ve birin, em şah dixwazin. Wî jî got temam, hûn şah dixwazin ez im şahê Îranê û ew kirin şah û şahê berê yê dawî Ehmed şahê qacara çûbû Ewropa. Gotin venegere, tu ne şahî û bi vî awayî hikûm li Îranê hat guhertin û hikûmdarîya pehlewîyan dest pê kir.

Çi tişt di wê meseleyê da alîkar bû? Şoreşa sosyalîst ya

**JÎN (di dema şer da)**

Sovyetê alîkar bû. Ji ber ku rusan her tim nedihiştin qacar bikevin, nedihiştin osmanî jî bikevin. Dema ku di şerê cîhanê yê yekem da rus vekişîyan, meydan vala bû ku îngilîz hemû pîlanên xwe li pêş bixin. Ji ber vê hindê vekişîna rusan alîkarî da ji bo ku netew dewlet çêbibin.

Wisa bi vî awayî netew dewlet çêbû û hikûmetê pehlewîyan hat ser desthilatîyê. Xwest destpêkê Îranekî yek reng çêke. Gerek yek ziman, yek artêş hebe, pêwîste êlên koçber nemînin. Her êl li cihê xwe sakîn be û çekê xwe radest bike û kî jî qebûl nedikir dibin komkujîyan ra derbas dikirin. Komkujî kirin û zilim kirin û li ku derê serhildan hebû wisa dikirin. Li Kirmaşanê, li Loristanê komkujîyên pir mezin kirin. Wê demê Loristanê li hemberî Riza Xanî, jinek derket. Navê wê Qedem Xêr bû. Hevjînê Qedem Xêr kuştibûn. Wê seroktî ji loran ra dikir. Qedem Xêrê berxwedanîyên pir mezin, li hemberî pehlewîyan kir. Di dawîyê da Qedem Xêr jî girtin û bi dar ve kirin. Belocîyan jî bi her awayî serhildan dikirin. Di dawîyê da bi awayekî giran belocî kuştin. Tirkmen kuştin, ereb dibin

komkujîyan ra derbas kirin. Dewleta modern ya Îranê li ser bingehê komkujîyan çêbû. Her kes gel dibin komkujîyan ra derbas dikirin. Piştra Riza Şah çû Tirkîyeyê serdana Mistefa Kemal kir û got: "Ez dê guhertinên Ataturkî çêbikim." Li Îranê, ew guhertin jî ew bû ku cilên gel qedexe bikin. Mînak: Cilên kurdî, cilên îranîyan jî hebûn, qedexe kirin. Digotin: "Şewqa deynin, cilên modern li xwe bikin, kiravat li xwe bikin" û hicabê jinan qedexe kirin.

Bi vî awayî qonaxeka nû dest pê kir û hikûmekî pir dîktator hat rûniştandin. Li Îranê girûpên çepgir hebûn. Bi taybet ên azerî pir di nav da bûn. Komên kominîst hebûn. Zêdeyî xwe hatin kuştin, koçber bûn, parek revîyan Rusya. Êdî her kes xistin bin hikûmekî. Vana hetanî şerê cîhanê yê duyem çêbûn. Di şerê cîhanê yê duyem da, Îranê xwe ji îngilîzan dur dixist û xwe ji Almanya ve nêz dikir. Heta navê Îranê yê resmî Hîtler pêşnîyar kir. Navê xwe yê resmî li dinyayê Persîya bû. Têkilîyên Almanya û Îranê yên veşartî hebûn. Jixwe ew veşartîbûn ji bo rus û îngilîzan bû. Ev têkilî ji bo kesên li hember almanan şer

dikir pir girîng bû. Ji ber ku Hîtler çavê xwe lê bû ku derbasî Rojhilata Navîn bibe û bigihije navendên enerjî yên Îraq û Îranê. Hîn di şerê cîhanê yê yekem da xwestekên wan hebû, lê nikarîn pêk bînin. Dixwestin vê carê jî biceribînin. Gelek efserên xwe şandin nava kurdan, ereban. Xwestin wan rêxistin bikin li hember îngilîzan, lê îngilîz û rus pê hesîyan û hatin Îran girtin. Rusan bakurê Îranê girtin û îngilîzan başûrê Îranê girtin û Riza Şah girtin û sirgunî Efrîka kirin û li wê derê mir. Wê demê nîqaşa guherîna hikûm çêbû. Kesên nêzî îngilîzan di desthilat da bûn. Çendek wisa nivîskar û rewşenbîr bûn. Bi îngilîz û rusan ra rûniştin û qaneh kirin ku hikûmetê neguherin, Riza Şah biguherin. Hikûm tenê di destê Tehranê da ma û li her cihekî hikûm sitandin. Jixwe azerîyan Komara Azerbaycanê damezirandin. Di bin hikûmê îngilîzan da li Kirmaşanê tevgerên cuda çêbûn.

Di dawîya sedsala 19em da, di hinek herêman da, hinek xwesertî hebûn. Belocistan qet ne di bin hikûmê merkezî ya Îranê da bû. Li herêmên ereban, li Ehwaz hikûmekî xwe yê

taybet hebû. Li hin deverên Kurdistanê li herêma şikakan heta nêzî Mehabad, di bin hikûmê şikakan da bû. Li herêma sincabîyan, her kesek hikûmekî wî hebû. Hikûm jî hîn zêdetir di bin desthilata êlên mezin da bû. Hindek tiradîsyonê milet hevûdu digirt. Lê belê pirojeyekî wan yê nas kirina serdemê tune bû. Wê demê jî destwerdanên derve jî hebû. Ne tenê di navbera wan miletan û Îran da, îngilîzan pir dest werdan dikirin. Rusan pir dest werdan dikirin. Firansa dest werdan dikir. Bi taybet îngilîzan wê demê pirsgirêk di navbera gelan da çêdikir û bi taybet di navbera kurd û aşûrîyan da çêdikirin.

Tê zanîn, li bakurê Kurdistanê komkujî li ser ermenîyan û aşûrîyan çêbûn. Wê demê aşûrî bi hêz bûn û hinek piştgirîya xwe ji derve digirtin. Li bakurê Kurdistanê aşûrî di komkujîyan ra derbas kirin. Bi taybet li herêma Cîlo. Vê carê aşûrîyan xwestin bi kurdan ra bidin û bistînin. Çi nîyet hebû mirov baş nizane. Ji ber ku li ser wî tiştî pir belge nînin. Marşîmonê aşûrî, bi Simkoyê Şikakî ra rûnişt, lê di wê rûniştinê da Simko ew kuşt. Ji alîyê exlaqî ve tiştekî ne exlaqî bû ku di hevdîtinê da tu

yekî bikujî. Lê ew hevdîtin li ser çi bingehê çêbû? Bi rastî pirojeyekî hev girtinê di nav wan û kurdan da hebû yan na? An tiştên din hebûn, an Simko bi tirsnakîyê hesîya bû, yan bandora hêzekî din bi wê tiştî dikir. Pir ne dîyar e. Lêkolînên pir cuda dixwaze û gerek belgeyên wan dewletan hebin. Ji ber ku belgeyên kurdan tune ne. Kuştina Marşîmon bandoreka pir xerab çêkir. Di navbera kurd û aşûrîyan da şer çêbû û ji hevûdu kuştin. Li herêma Urmîyeyê rewşeka wisa hebû. Dema ku dewlet hat, dewleta Pehlewî çêbû, dewleteka navendî û modern çêkir. Birokrasîya xwe hebû û memurê xwe hebûn. Ji memurê darayî bigire heta memurê girtina leşkeran û her tişt û wana hemû ji dervayî herêmê bûn. Li herêmên Kurdistanê kêm çêdibû. Lê kurdekî di nava sîstemê da helîyayî hebû. Dadgeheka nû, yanî sîstema nû ya Îranê kurdekî çêkir.

Li Îranê hiquqa netew dewletê kurdekî çêkir. Milê din jî çawa li Tirkîyeyê hizba Îtîhad û Tereqî hebû, li Îranê jî hizba El-tecedud hebû. Mezinên wî jî zêdeyî xwe ne faris bûn. Ew jî wekî Îthad û Tereqîye, hizb el-Tecedud ew bû ku li

parlamentoyê piştgirîya Riza dikirin. Da ku dewleta modern çêbibe. Li parlamentoyê, li xelkê dixistin û zext dikirin. Elî Ekber Dawer hebû esas navê xwe Erdelan e ji sunîyan bû, esas ev e ku sîstema hiquqî li Îranê çêkir. Teymor Tac, di esasê xwe da tirkmen e, ji Xorasanê ye. Yek ji mejîyê bingehîn yê netewperestîya Îranê bû. Di wê demê da Tedeyun (dînperestî) hebû. Ew jî ji Xorasanê bû û ew bi eslê xwe ne faris bû. Yanî serîyên wan yên esasî ne faris bûn. Di vê pêvajoyê da piştgirî dan û ew sîstem çêbû û ew memurên ku dihatin bi navê dewletê, erkê wan ew bû ku sîstema jîyanî, çandî û hizrî ya wan miletan bikujin. Ji cil û bergên wan bigire pê ve gelek tiştên wan diguhertin. Polîs hebûn ji wan ra digotin emnîye. Erkê wan jî ew bû ku nehêlin kes cilên kurdî li xwe bike. Êşkence dikirin, lê dixistin, heqaret dikirin û di ser da jî dirav (pere) jê distandin. Li hember vê rewşê hinek êl radibin. Li herêma Mukrîyan êla munger hebû. Serokê wan mele bû û rabû serhildan kir. Gava ku dîtin serhildan mezin dibe, dewletê bi wan ra dan û sitandin çêkir û wan dewletê ra got: “Memurê te pir zilmê dikin. Hetanî li ser vê çîrok heye, dibêjin: Dewlet

nunerê xwe dişîne û dixwazin zanibin ew çi dixwazin? Çima serhildan kirine? Nûner dibin ku bi mezinê mengora ra rûne. Dibin gund. Didin rûnişkandin û dibêjin li vir be wê sibe bi te ra hevdîtin çêbibe. Dibe sibe, dibin gundekî din. Dîsa jê ra dibêjin wê sibe hevdîtin bi te ra çêbibe û 12 rojan wisa digerînin. Êdî zilam wisa aciz dibe û dibêje: “Çi ye her tim hûn dibêjin sibe, sibe; ez hatime hevdîtinê bi serokê we ra bikim”. Êdî dibêjin were em herin cem serokê me. Dibîne ku mezinên wan ew sefrete hene yên fêkîyan li ser serê wan bi werîs daliqandî ye û li ser kursîya xwe rûniştîye. Vê dîmenê dibîne û şaş û metel dibe. Mezinê êlê dibêje: “Ez şah im û tacê min jî heye”. Nûnerê dewletê dibêje: “Em hatine zanibin çima hûn serhildanê dikin”. Ew jî dibêje: “Ji bo wî tiştê ku te aciz kirîye van çend rojan, hûn wisa li xelkê me dikin. Îroj here sibê were heqaretê li me dikin. Bi islubê nexweş bi wan ra dan û sitandinê dikin. Dewlet me diêşîne”. Îcar ew diçe bi şah ra dibêje: “Yek ji bo cilan mesele hesas dibe. Ew wekî Tirkîyeyê nakin. Dev ji wê pirojeyê berdin. Bi taybet li Kurdistanê.” Paşê meseleyê cilan sist dikin. Li hevkirinek çêdibe. Tiştê ku nehişt

wekî Tirkîyeyê çêbibe sazîya dînî bû. Sazîya dînî li Tirkîyeyê ewqas ne xurt bû. Sazîya dîn bi xwe Osmanî bû. Li Îranê, li kêleka dewleta qacaran, rêxistina şîîyan hebû û rêxistina şîîyan carna ji dewletê bi hêztir bû. Mele fetweyek dida xelas. Ew jî wekî tengasîyek bû. Ji bo pêk anîna pirojeyên modern. Îrana modern kêm zêde bi pehlewîyan ra çêbû. Bi wê modernbûnê ra, zimanê milet qedexe kirin. Komkujî çêkirin. Tevî ku piştra li qanya sanesîsanê ku zimanên herêman ne qedexe ye, lê zimanê resmî çêkirin û nehiştin ên din bên xwendin. Heta carna kirine pirsekî asayîşî. Demekê li Îranê, nivîsek bi kurdî, bi kî ra bigirtana, dibirin îstixbaratê, gef lê dixwarin. Wê demê li başûrê Kurdistanê nivîs dihatin û diçûn. Wê demê êdî navenda muxalefetê li herêmên bakur û rojhilatê Kurdistanê çêbû. Yek ji wan navendan Mehabad bû ku li wê derê bûyera Komara Mehabadê çêbûbû.

Berîya bûyera Komara Mehabadê, bûyerên pir girîng hene ku pêwîst e mirov wana bizanibe. Tevgereka sîyasî û civakî li rojhilatê Kurdistanê hebû. Navê xwe Komeleya Cikav bû û li

ser usulê cemîyetê çêbû. Cemîyeta Xoybûn hebû. Cemîyeta Hîwa hebû. Partî hîna çênebibûn. Di kurdan da, usulên partîyên sîyasî yên modern nebû. Di îtîhadê da muxalefetekê giştî, cemîyet giştî li dijî Peymana Lozanê çêbibûn. Komele, Xoybûnê nedigotin em ji bo kurdên Tirkîyeyê têdikoşin. Gotinek bi navê kurdê Tirkîyeyê tune bû. Yan jî kurdê Îraqê, kurdê Îranê, ew tişt di mejîyê kurdan da tune bû. Di edebîyata sîyasetê da yek ji wan cemîyetan Komeleya Cikav bû. Cemîyeta Hîwa li başûrê Kurdistanê û cemîyeta Xoyî hebûn, careka din tên cem hevûdu. Civînekê sembolîk li cihekî ku sînorên sê dewletan digihê hev û jê ra dibêjin li hevkirina sê sînor û di wê li hevkirinê da soz didin ku rojekê wan sînoran rakin. Ew pir muhîm e. Piştra di edebîyata sîyasî ya kurdî da ev hiş û feraset nema.

Komeleya Cikav ferqê xwe ji cemîyetên din çibû? Yek jî êl tune bûn. Zêdetir ji tebeqeya navîn cemîyet çêdibûn. Di wê demê da xwendekar ji dibistanên dînî û tiştê wisa derketibûn. Dibistanên modern hîn nû çêdibe. Ew ji tebeqeya navîn bûn û

dibin bandora fikrê çep û dibin bandora fikrê netewî jî hebûn. Digotin: “Dagirkeran welatê me dagir kirine. Di wê dagirkerîyê da rola axa û şêx wekî dagirkeran e.” Ji ber vê yekê endambûna axa û şêxan qebûl nedikirin. Endamtî ji bo axa û şêx qedexe bû. Zêdeyî xwe ji wan tebeqeyên navîn hinek jê jî însanên feqîr bûn. Ji ber hindê tevgereka civakîtir bû ji Xoybûn û ji yên dîtir. Ew tenê ji bo armancên sîyasî çênebûbûn. Ji ber wê hindê bandora xwe li ser civakê bêtir hebû. Milet li hember şêx û axayan ew tişt dikirin. Di esas da hêzekî gel bû. Lê tam rûneniştibû û pêşengên wî însanên rewşenbîr bûn. Dema ku rus hatin herêmê, çalakîyên wan xurt bûn û di desthilatîyê da valatî çêbû. Piştra kurd di esas da ne di bala rusan da bûn. Bernameya rusan hemû li ser azerîyan bû. Lê, kurd jî xwe anîn ser hev û gotin: “Em jî tiştekî dixwazin”. Wê demê rusan gotin: “Heger hûn dixwazin tiştekî we hebe gerek partîya we ya sîyasî hebe û bêyî partîya sîyasî hûn nikarin hikûmetê çêbikin” Mesela li Azerbeycanê Demokrat Firqasî hebû. Wek partîyeka sîyasî bû. Li Kurdistanê jî gotin: Em dê Partîya Demokrat çêbikin. Wê demê çalakîyên Cikav her hebûn û vergerandin Partîya

Demokrat. Heyanî wê demê Qazî Mihemed ne endam bû û piştî partîbûnê Qazî Mihemed anîn nava partîyê.

Di nav Cikav da endamtîya Qazî Mihemed bi pirsgirêk bû. Ji ber ku beşek ji rêvebirîyê ji wê tebeqeya ku nikarê tê da bibe endam ji ber wê yekê hinek îstîfa kirin û Qazî hat. Ev hinek hurgilîyên dîrokî ne. Divê baş li ser were sekinandin. Qazî Mihemed însanekî welatparêz bû û rêzdar bû, lê yên din redîkal bûn. Beşê redîkal Qazî Mihemed qebûl nekirin, lê partîya Demokrat çêbû û Komara Kurdistanê hat damezirandin.

Rola partîyê pir tune bû. Lê tişta ku esas dihat girtin sîstema rêxistina gel bû. Bi awayekî demokratîk rêxistinên wan çêbûn. Sazî û tiştên wan jî hebûn. Sazîyên rêxistina civakê hebûn û gel tevlî dibû. Sazîyên pêwîst di Komara Kurdistanê da dihatin saz kirin. Hêzên çekdarî jî hebûn. Hêzek hebû Qazî Mihemed wekî navê artêş li wan dikir. Hejmarek ji wan şandibûn Rusya ku dewreya efserî bibînin. Di heman demê da hêzên xwe yê çekdarî yên êlên ku li herêmê dijîyan hebûn. Yek ji wan êlan jî êla barzanîyan bû. Wana bi îraqîyan ra pirsgirêk jîyan kiribûn û

ji ber wê ew hatibûn. Di wê demê da hîna ne partî bûn. Wê demê parçecitî tunebû. Ji ber çi Barzanî qebûl kirin? Li ser esasê ku Barzanî jî hêza xwe ya leşkerî tevlî bike. Bi xwe jî Mele Mistefa wekî meqamekî leşkerî qebûl kirin. Hindek dibêjin wezîrê şer bû û hinek jî dibêjin ku ne wezîrê şer bû, lê wezîrê şer cuda bû, feqet tu kesî bi vê rolê nelîstibû. Ji ber wê pirs ev e, çima Komara Kurdistanê bêyî şer rûxîya? Ez bi xwe di wê bawerîyê da me ku li ser şer fikirîn ne ku nefikirîn, feqet kî dê şer bikira? Yanî hêzekî eskerî tam girêdayî komarê wê şerî bikira tune bû û hêzên êlan hemûyan bi dizîka têkilîya xwe bi dewletê ra çêkiribûn. Piştra li ser vê mijarê pir belge derketin. Serokên wan êlan name ji îngilîzan ra şandibûn. Ji şah ra şandine û wefadarî û girêdana xwe anîne ziman. Ez di wê bawerîyê da me ku Qazî Mihemed bawerîya xwe bi wan nedihat. Ji ber rastî li ber çavan bû.

Di nav wê da Barzanî jî girêdayî ye. Li gorî min ji destpêkê girêdana wan bi dewletê ra hebû. Çima? Ji ber ku texrîbatên pir cidî çêkiribûn. Mesela Barzanî hinek êl kirin dijminê komarê.

**JÎN (di dema şer da)**

Êla mameş, li herêma di navbera Zerdeşt û Mehabadê da bû. Serokê wê êlê kuştin. Bêyî ku tiştek hebe di ortê da çûn bûne mêvanê wan û li ser xiwarinê kuştin. Ew êl çû nêzikî dewletê bû. Çima? Barzanî ew tişt kir di wê pêvajoya hesas da. Ez di wê bawerîyê da me ku ew hemû pîlankirî bûn.

Piştra generalekî îranî heye, bîranînên xwe nivîsandîye. Navê xwe serleşker Palîzwan e û li Amerîka mir. Ew ji leşkertîyê rabûye serleşkertîyê. Ne xiwendîye û bi eslê xwe kurd e. Ji Kirmaşanê ye. Lê li herêma Mehabadê çawiştî dikir. Di bîranînên xwe da dinivîsîne ku di navbera kurdan û dewletê da hevdîtin hebû û dibêje ku: “Dewletê her tim xiwestîye dem qezenc bike û nedixwest mesele çareser bike.” Dibêje: “Dewlet ji me ra got ‘di derfetekî da, hinek cihan bigirin’. Dîsa dibêje: “Me cihek girt, tê da hinek kurd me dîl girtin. Kurdên çekdar girêdayî komarê. Hinek ji wan barzanîyî bûn, hinek jî kurdên rojhilatê Kurdistanê bûn.” Dibêje: “Me têlêgraf şande ji şah ra û me got ‘em çi ji kurdên di destê me da ne bikin?’.” Bersiv hat û gotin ku: “Kurdên ji rojhilatê Kurdistanê bikujin û kurdên

barzanîyî jî berdin bila vegerin.” Dibêje: “Min di wê demê da fam kir ku kurdê barzanîyî -di hundirê komarê da- bi me ra ne.” Ew gotina serleşker bixwe ye.

Dema ku hêza şah vegerîya, Rusya xwe paş ve kişand. Rus û îngilîzan bi hev ra lihev kiribûn ku kî ji wan paş ve çû yê din jî biçe. Şah soz da Rusya ku nefta bakur bide rusan û rus jî bi vî awayî paş ve çûn.

Piştî rûxandina komarê, Qazî Mihemed neçû derve. Sedem çi bû? Exlaqîyen digot: “Min ev tişt daye destpêkirin, nabe ku ez biçim”. Ya duyem jî; dizanî ger biçe rus dê wî bikujin. Ji ber rusan serokên azerîyan kuştin, piştra Sitalînî tasfîye da destpêkirin. Piştî şerê cîhanê yê duyem û eger Qazî Mihemed çûba sedî sed wî jî dê bikuştana ku ew tişt zelal bû. Eger çûba jî her dewlet dê bihata.

Hinek êl jî amadekarîyên xwe kiribûn û xwe radest (teslîm) kiribûn. Tenê Qazî Mihemed û yên derûdora wî li Mehabad mabûn. Qazî Mihemed derketa jî rusan dê ew kuştiba. Rusya dê sirgunî Sîbîrya kiriba û li wir kuştiba. Bi qezayekî wekî ku

serokê azerîyan bi maşîne kuştin. Ji ber ku li ser vî esasî, dan û sitandina dewleta Îranê bi rusan ra hebû. Ji ber vê jî ma. Ew girtin û dadgeh kirin. Hikûmê îdamê danê.

Wê demê pirsgirêk çi bû? Kurdan rêbazê şerê gerîlatî ne dizanî. Di dîrokê da tu meyze dikî, kurd di şer da serkeftî ne. Tu dîroka sasanîyan dixwînî; dîroka yewnanîyan dixwînî û Roma dixwînî, kî hatîye Kurdistanê zor û zehmetî kişandine. Ji ber ku rêbazê şer yê esasî yê kurdan heye. Her miletek çanda xwe ya şer heye، rê û rêbazên kurdan yê şer jî cuda bûn. Li Japonya samûrayî hene rêbazê wan yê şer cuda ye, ya çînîyan jî wisa ye. Yanî sipora şer ya taybet heye di wê demê da. Şêwazê şer li cem kurdan çawa bû? Dijmin bîne nav erdnîgarîya xwe, êrîş bike, paş da biçe û dijmin belav bike û di nava newalên Kurdistanê da tune bike. Pirî caran wisa kirin. Dîroka yewnanîyan bixwînin, qala vê taktîkê şer yê kurdan dike. Wê demê şerê gerîlatî di çanda kurdan da heye. Erdnîgarî, hejmar her tişt vê teqez dike. Ew hêza mezin heye, lê piştî ku kurdan xwestin teqlîdê sîstemên desthilat bikin wenda kirin. Piştî

îslamê, tebeqeya mîrên kurdan çêbû. Mîr çi dikir? Ji xwe ra navend çêdikir. Kelayên xwe çêdikirin. Navenda xwe çêdikirin. Leşkerên xwe dixistin. Dema dijmin êrîş dikir, wekî dewletan şer dikir. Dema ew navend dihat girtin -berê navendên kurdan tune bû- mîran şer wenda dikir. Lê berê cihek bihata girtin jî kurdan di cihekî din da şer dikirin. Mîr Bedirxan çima nikarî li ber xwe bide? Li Çîyayên Botanê nikarin şer bikin? Dikarîn, lê rêbaz wenda kiribûn, ew pirsgirêk bû. Ji ber wê ji bo kurdan ew rêbaz ne dimeşî. Axatî û êltî jî ew derfet nedida. Wê demê rêxistinên çekdarî yên xurt nebûn. Lê, çi li pêş ket? Evên ku li komarê mane û pê ve girêdayî parek ji wan revîyan çûn başûrê Kurdistanê. Demekê li Îraqê bûn. Piştî Ebdulkerîm Qasim hat û Mele Mistefa vegerîya, Partîya Demokrat ya Kurdistanê (PDK) li Îraqê çê kirin. Wan êdî li hemberî dewletê şer kirin. Ew çûn gel Mele Mistefa sekinîn. Çêbûna Partîya Demokrat ya Kurdistanê ya li Îraqê pêvajoyek nû ye; di dîroka Kurdistanê da.

Di 1946ê da, Partîya Demokrat ya Kurdistanê çêbû. Bi ava

kirina partîyê ra li başûrê Kurdistanê pêvajoyek nû dest pê kir. Berê serhildanên mîran hene, di dawîya osmanîyan da. Yên herî dawî Mîr Bedirxan Beg e ku serî rakir. Piştra serhildana şêxan heye û piştî wê axa hene. Piştî ku Alayên (lîwa) Hemîdîye çêbûn, parek ji wan Komela Xoybûn damezirandin. Wekî ku min got, Komeleya Cikav cuda ye û Cemîyeta Hîwa ya li başûrê Kurdistanê cuda ye. Zêdetirê wan mirovên xwendekar in. Kêm zêde têkilîya wan bi Partîya Kominîst ra heye û efser in, di artêşê da. Başûr û rojhilatê Kurdistanê hinek cuda bû. Piştra partîyê sîyasî çêbûn. Cemîyet dixwazin li hember dewlet netew û parçe kirina Kurdistanê têbikoşin. Ne ji bo parçeyekê, ji bo doza kurd têbikoşin. Lê pirsgirêk çi ye? Rêberê wan zêdetir ji tebeqeyek serdest e. Ew tebeqe pir girêdana xwe bi civakê ra tune ye. Ew tebeqe zêdetir dixwaze rêka sîyasetê bi fermî ji jor ve ava bike. Şerîf Paşayê Xendan dixwaze firensî û îngilîzan qaneh bike. Xoybûn zêdetir dixwaze îngilîzan qaneh bike. Dixwazin hinek cihan tijî bikin, hêzên çekdarî çêkin. Civak bi rêxistin nekirin û nebûn hêzekî civakî. Bêhtir dixwazin hêzekî leşkerî çêkin. Ji hevsengîyan

sûdê bigirin û dewleteka kurdî damezirînin. Bêguman hizra netewîyetê pêşketî ye. Di dawîya sedsala 19em da, li ba kurdan jî hizra netewîyetê bi pêş ket. Lê dema ku partîyên sîyasî çêbûn, partîyeka sîyasî di Komara Mehabadê da jî çêbû. Lê di komarê da rola xwe nelîst û tenê wekî nav ma. Zêdetir sazî girîng bûn. Komar bi xwe girîng bû û hêla xwe ya demokratîk jî hebû.

Partîya destpêkê ku çêbû Partîya Demokratîk ya Kurdistanê ya Îraqê bû. Ev partî ji hêla Mistefa Barzanî ve nehatîye damezirandin. Yê ku ev partî damezirand Birahîm Ehmed wan in û gotin em Mele Mistefa Barzanî bînin bila ew vê partîyê bi rê ve bibe. Ji ber ku hêz li ba wî heye. Nedizanîn ku ew axa ne û desthilatîyê nas dikin. Hem jî têkilîyên wan bi derve ra hene. Barzanî KDP ji destê wan derxist û xwe kire wek hakim û edebîyata sîyasî ya kurd hat guhertin. Di nav kurdan da parçe bûn dest pê kir. Partîya Demokrat ya Kurdistan - Îraq çêbû. Piştra bi modela wê KDP ya li Tirkîyeyê çêbû. Partîya Demokrat ya Kurdistanê li Sûrîyeyê hat damezirandin. Kurdan

cara yekem e ku xwe girêdayî dewlet netewê kirin. Parçebûn pejirandin û her wan bi hêza dewletên navendî, pirsgirêk dijîn. Hêzên wan çekdarî hebûn, pêşmerge çêbûn, lê wan çi bandor li ser civakê kir? Yekem: Rêvebirê wan jî heman axa bûn yanî tebeqeyên serdest bûn. Bi heman usûl diçûn dîplomasî dikirin. Formul ew bû; eger dewletek mezin li pişt min be, ez dikarim şer bikim. Ji ber vê yekê zêdetir li hîmayetê derve digerîyan û piştgirîya derve kî bûn mesela te li hember Îraqê şer bikira, Îran û Îraq pirsgirêkên wan bi hev ra heye diçûn Îranê û digotin em alîkarîya te dixwazin. Şertê Îranê çi bû? Ku li hember kurdên rojhilatê Kurdistanê tiştekî bikin. Yan diçûn cem dewleta Îraqê, ew şert tê da hebûya Tirkîyeyê, yanî ji wir û şûnda ew bazirganîya sîyasî bi navê kurdîtî dest pê kir. Ew li gor feraseta dijminê dijminê min dostê min e tev gerîyane. Lê ew dijminê dijminê te li beşekî din yê Kurdistanê dijminê gelê te ye û ev li ber çavan negirtin û çûn. Bi taybet Partîya Demokrat ya Kurdistanê li Îraqê, Barzanî ew tişt pir bi pêş xist. Ji bo ku bikaribe li hember dewleta Îraqê şer bike bi Îran û Tirkîyeyê ra têkilîyên xweş çêkir. Wan jî li hember dewleta Îraqê destek

kirin lê di wê pirojeyê da kurdên parçeyên din lewaz ketin. Bi taybet jî kurdên rojhilatê Kurdistanê. Wan doktor Şivan kuştin. Xwestin li rojavayê Kurdistanê Osmanê Sebrî bikujin. Osmanê Sebrî xwe ji destê wan rizgar kir. Li rojhilatê Kurdistanê, ew kurdên rojhilatî, piştî komarê çûbûn cem wan, ew girtin cem xwe. Wê demê îstixbaratê Îranê ji barzanîyan ra got: “Divê ew di bin kontrola te da bimînin, nehêle hereket bikin.” Hinek pêşmergeyên rojhilatî pêşmergetîya Mistefa Barzanî pejirandin. Yek ji wan navê xwe Ehmed Tewfîq bû. Cemaetekî din ew qebûl nekirin û gotin: “Mafê me ye ku em li hember vê dîktatorîya şah bisekinin.” Îranê Komara Kurdistanê ji holê rakirîye. Ji ber wê yekê şah wê wezîfeyê da Barzanî ku wan jî tune bike. Ji holê rakirîyan yek jî Sileyman Muînî bû. Sileyman Muînî Komîteya Şoreşgerî çêkiribûn, ji partîya Demokrat. Yanî ew komîte ji nû ve çêkirina hizra şoreşê, di Partîya Demokrat da bû.

Sileyman Muînî bû yekî din hebû navê wî Mele Ewara bû, Îsmaîl Şerîf Zada bû, wan komek çêkiribûn. Nêzîkî heft kes

bûn. Dixwestin tiştina bikin. Wê demê di salên 65 û 66ê bû, dest pê kirin û Barzanî Sileyman Muînî wan girtin û gotin: “Gerek tu teslîm bibî, lê Sileyman Muînî ew yek nepejirand û wê demê ew kuştin û cenazeyê wî teslîmî şah kirin.

Wekî din şah bi desteka xayinên herêmî yên din jî hemû tasfîye kirin û bi dehan wisa însanê sîyasî teslîmî dewletê şah kirin. Hemû ketin zîndanê, êşkence dîtin, hinek jî kuştin, hinekî din jî di xebatên çekdarî da hatin şehîd kirin. Bi alîkarîya Barzanî, şoreşa rojhilatê Kurdistanê nedikarî çêbibûya.

Min di cihekî da xiwend; ji rewşenbîrên Îranê, rewşenbîrekî bi nav û deng hebû navê xwe “Celalê Alê Ehmed” bû. Jê dipirsin û dibêjin: “Nêrîna te li ser kurdan çi ye?” Dibêje: “Madem Îran wisa piştgirîya Barzanî dike, gereke kurd pir dengê xwe nekin.” Sîyaseta dewletê ev e ku bila pirsgirêka kurd di bin çengê Barzanî da be û dewleta Îranê aniha di nav da dixwaze, tirk jî sûrîyeyî jî vî tiştî dixwazin. Îraq û dewletên mezin vî tiştî dixwazin. Ew dixwazin pirsgirêka kurd ger di bin çengê Barzanî da be, kurd her tim rola ku ew dixwazin dilîzin. Hetanî

**JÎN (di dema şer da)**

Barzanî xurt bûn li Îranê, kurdan nedikarîn li rojhilatê Kurdistanê hereketekî, tevgerekî sîyasî damezirînin. Îstixbarata Îranê xurt bû. Perwerdeyên xwe li Îsraîl û DYAyê digirtin û çavên milet pir tirsandibûn. Nediwêran nêzikî sîyasetê bibin. Her wiha kurdên sîyasî zêdeyî xwe revîyan başûrê Kurdistanê. Parekî wan wenda kirin, kuştin. Hinek jî piştra çûne Bexdayê. Ew pêvajo wisa bû hetanî Barzanî şikest, ew jî di encama peymana Cezayîr da bû.

Wê demê ji bo rojhilatê Kurdistanê derfetek vebû. Kengî Barzanî xurt bû te nedikarî şoreş li rojhilatê Kurdistanê pêş bixista. Wê demê li rojhilatê Kurdistanê komîteyên piçûk yê veşartî, girêdayî Partîya Demokrat hebûn lê veşartî kar dikirin.

Li Îranê kî xurt bû ji alîyê sîyasî ve? Partîya Tude xurt bû. Ev partîya kominîst ya herî mezin ya Îranê bû, sîyaseta xwe tam li gorî rusan eyar dikir. Di wê demê da pir bi hêz bû, lê pir redîkal nebû. Ji ber ku rusan nedihiştin redîkal bin. Tenê dixwestin zext li dewleta Îranê bikin. Heta radeyekî dikirin, ji wê zêdetir na. Wan nedikarîn biryar bidin. Di dema Musediq da li Îranê ku

şoreş çêbû, eger partîya Tuda biryar girtiba, dikarîbûn nehêlin li hember Musedîq amerîkayî kudeta (înqilab) çêkin. Heta dikarî dewleteka hîna baştir çêbibe. Lê ji ber ku girêdayî rusan bûn, wî tiştî nekirin û şah careka din hate ser desthilatîyê. Îstixbaratekî nû çêkir û bi hezaran ji wan girtin û bi dar ve kirin. Ji ber ku îstixbarat pir ketibû nav wan.

Di nav wan da gencek bi navê Evdilrehman Qasimlo hebû, xelkê herêmek nêzî Urmîyeyê bû. Di tevgerên wan yên ciwanan da kar dikir. Piştra ew partîya Tuda Evdilrehman erkdar kir ku biçe têkilîyê bi Partîya Demokrat ra çêbike. Esas Tuda ew şand nava Partîya Demokrat.

Piştra di nav Hizba Demokrat da ma. Di wê demê da bû beşek ji wan girûpên ku li hember barzanîyan têdikoşin. Bi Ehmed Tewfîq wan ra. Her wiha Qasimlo dixwest Hizba Demokrat ji bin çengê barzanîyan derbixe. Ji ber wê jî barzanîyan tu carî ji Qasimlo hez nedikir.

Ez bîranîneka xwe bêjim: Ez nav nabêjim ji ber ku dostekî bi taybet ji min ra gotibû. Wî dostî got: “Em li cem barzanîyan

rûniştibûn û behsa Partîya Demokrat dikir. Min jî got: Heyf! Piştî Qasimlo partî lewaz bûye. Wan vegerandin û gotin: Ne heyf e ji bo Qasimlo, heyf ji bo Şerefkendî. Şerefkendî jî piştî Qasimlo zêdetir nêzîkî wan bû. Gotin em ne xembar in ji bo Qasimlo, bila here.” Bi aşkera KDP ji Qasimlo aciz bû.

Wê demê Qasimlo çû Ewropa. Li Çekoslovakya xiwend û li wir jin anî. Piştî Sovyêt hat, Silovakya wî carekê girtin û paşê ew revîya Firansa. Li Firansa Sosyal Demokrat hebûn. Ji ber ku li gel wan kar dikir xwe nêzî wan dikir. Wan jî ew wek beşekî ji xwe qebûl kirin. Piştî wê hat Îraqê. Di navbera wî û Sedam Hiseyn xweş bû. Heta ji ber ku aborî xwendibû di teşkîlat û pîlansazîya Îraqê da kar dikir. Piştra kes nizane ku çi çêbû, hema bi carekê ve jê ra gotin; di nava 24 saetan da ger tu ji Îraqê dernekevî em dê te bikujin. Qasimlo çi kir? Bi kê ra dixwest têkilî çê bike em nizanin.

Ev tişt gerek ji arşîvên dewleta Îraqê derkevin, lê bawer nakim ku arşîv bidin derve. Di wê demê da biryarek wisa girtin. Qasimlo jî carek din derket çû Ewropa. Dema ku li Îranê li

hember şah serhildan çêbû, Qasimlo têkilî bi sefaretê Îraqê ra çêkir. Wî got: “Ez dixwazim rayedarên dewleta Îraqê bibînim”. Wan jî derfet danê. Dîsa çû Îraqê û gotinê em dikarin derfetek li Kurdistanê çêbikin. Wê demê li Bexdayê hejmarek sîyasî nêzî çil kesî bûn, ew kom kirin. Partîya Demokrat ji nû ve ava kirin û bi alîkarîya dewleta Îraqê derbasî rojhilatê Kurdistanê bûn. Ew dem bû dema ku tam dewleta şah wê birûxe di vê serdemê da bû.

Heta wê demê kurd nerazî bûn, lê rêxistinên wan yên xurt tunebûn. Rêxistinên piçekî veşartî ew jî tenê di herêma Mukrîyan û Mehabad da hebûn. Wê demê li zanîngehên Îranê, ciwan û tevgerên çepgir hebûn. Piştî ku partîya Tude hatibû lewaz xistin, tevgerên şoreşger wekî çawa li Tirkîyeyê Denîz Gezmîş derketin, li Îranê jî tevgerên çepgir digotin: “Gerek em çalakîyan bikin.” Ji wan ra digotin: Çirîkên fedayî.

Hindek gencên kurdan li zanîngehan, di bin bandora wan da bûn. Gencek ji wan endezyar bû ku bi navê Fuad Mistefa Sultanî bû. Komek bûn, mirovên pir baş bûn. Çepgir bûn. Wan

jî tevgerek çepgir damezirandin. Êdî li Kurdistanê dest pê kiribûn. Bi taybet li herêmên Erdelan, Omarî û Sine. Potansîyel zêdetir hebû. Dema ku şah rûxîya, Partîya Demokrat vegerîya herêmê û Mehabad kirin navenda Partîya Demokrat û Sine bû navenda Komele. Komele partîyeka çepgir bû. Ji wan ra digotin Partîya Piroleterya. Wisa xwe bi nav dikirin. Tevgerên din jî pir bûn. Lê ew du tevgerên esasî bûn li rojhilatê Kurdistanê.

Dema ku Xumeynî hat ser desthilatdarîyê, bi dewletan ra dan û sitandin çêbûn**.** Xumeynî yek ji kesên ku qet mafê kurdan qebûl nedikir bû. Şer destpêkê li Sine çêbû. Êrîşî bajarê Sine kirin. Wê demê kurdan berxwedanîyek pir mezin kirin. Bi taybet Komele li ber xwe dida. Rêxistinê bajaran yê Komele, Şora bû. Şora wek kominan bûn. Bi taybet bi hizrê çepgirî çêkiribûn. Şorayan di berxwedanîyê da roleka pir esasî lîstin. Ez wisa encamekî derdixim ku li ku derê rêxistinên civakî kominal hebin, tu dikarî berxwedanîyê li wir pêş bixî. Sine berxwedanîyek baş kir. Ji ber wê dema ku dewletê ew

berxwedanî dît, dest bi dan û sitandinan kir û qebûl kir ku li Kurdistanê hilbijartinên azad çêbibin û rêvebirîya xwe hilbijêrin. Di wê demê da, ji ber berxwedanîyê gavekî girîng bû ku hate avêtin. Piştra li Îranê xwestin referandûmê çêbikin ji bo erê kirina Komara Îslamî. Kurdan deng nedan Komara Îslamî û tevlî hilbijartinê nebûn. Îranîyan deng dan dewletê û hemû partîyên kurdî gotin: “Em vê referandûmê wekî hîleyekî dibînin.”

Piştra, ji bo rêvebirîyê, konsey çêdikin. Êlîta, Qasimlo wekî nûner li ser herêmên kurdan bû û deng jî anîn. Hikûm derxistin, kafir û fasid derxistin û gotin ku: “Qasimlo nikare bê û biçe Tehranê.” Lewra dîsa pirsgirêk çêbûn. Dîsa şande hatin xwestin ku hevdîtin çêbikin, lê belê dewletê her dixwest dem qezenc bike. Hatin tiştê destpêkê dîtin ku partîyên kurdan hevûdu qebûl nakin û dewletê ev nakokî ji xwe ra bikar anî.

Qasimlo bêtir bi sîyasetekî dîplomatîk nêz dibû. Lê Komele zêdetir sîyasetekî xwe yê redîkal hebû. Ew pirsgirêk dîtin û di dan û sitandinan da îmayek wisa didan ku esas em dikarin

**JÎN (di dema şer da)**

Hizba Demokrat ra li hev werin, lê Komele ra mirov nikare lihev were. Ji ber wê jî pirsgirêk di navbera Komele û Partîya Demokrat da zêdetir dikirin. Partîya Demokrat ew sucdar dikir û her tim dixwest otorîteya xwe çêbike û digotin: "Divê hûn tim di bin otorîteya me da bin." Lê wan jî qebûl nedikirin. Di encamê da şer di navbera wan da derket û derbeyek pir mezin li hereketê kurdan ket. Di wê demê da, nêzî 1000 pêşmergeyî ji hevûdu şehîd xistin. Ez bi xwe zarok bûm, dema şoreş çêbû. Hemû gelê ku di bin zilma şah da bûn bi carekê ra azadî dîtin û gel çû qereqol girtin, dest jî danîn li ser çekan. Her kes bi çek bû û gel tevlî pêşmergeyan bû.

Di wê demê da rêvebirîya kurd ji vî tiştî ra ne hazir bû. Ne dikarîn rêxistin bêtir pêş bixin, ne jî kadroyên xurt hebûn, di heman demê de perwerde jî tune bû. Ji ber vî jî nêzikbûnên şexsî pir bi pêş diketin. Tiştê ku sîstem pir zeîf dixist ew şerê ku di navbera wan da bû. Yek jî şerê barzanîyan bi kurdên rojhilatê Kurdistanê ra derket. Piştî Mele Mistefa miribû, tiştek çêkiribûn, navê wê rêvebirîya demkî bû. Kî bûn ew: Mesud û

**JÎN (di dema şer da)**

Îdrîs bûn û di esas da li hev nedikirin. Mesud digot: “Eslê min barzanîye, dêya min jî zêbarî ye. Ez gereke bibim rêvebir. Dêya Îdrîs ne ji êlê bû. Tevî ku xwedî tecrubeyek bû û her tim bi Mele Mistefa ra bû, lê nedixwestin ew bibe rêvebir.

Îdrîs û Mesud destpêkê name ji bo Xumeynî şandin. Wefadarîya xwe jê ra îlan kirin û gotin: “Em hazirin bi te ra kar bikin”. Şertê Xumeynî jî dîyar bû. Ji bo şertên Xumeynî bi cih werin, komplo bi pêş xistin. Barzanîyî çûn û gotin ku ji Partîya Demokrat ya Îranê Seyîd Reşo, cenazayê Mele Mistefa ji goristanê derxistîye û avêtîye, lê ew derewekî mezin bû. Seyîd Reşo ji alîyê gel ve jî pir dihat hez kirin.

Seyîd Reşo tiştekî wî taybet li hember Mistefa Barzanî tune bû. Ew propaganda dan dest pê kirin û şer ragihandin. Herêmên di navbera Urmîye û Mehabadê ji destê pêşmergeyên rojhilatê Kurdistanê derxistin û bi sedan pêşmerge şehîd xistin. Pêşmergeyên ku xwe radest kirin jî şehîd xistin. Pêşmergeyên birîndar jî şehîd xistin. Her weha dihat gotin ku pêşmerge bi zindî dixistin nava gorê. Aniha jî vîdyoyên wan bûyeran hene.

**JÎN (di dema şer da)**

Yek ji berpirsyarên piropagandaya barzanîyan Elî Ewnî ye û berpirsê wan şeran bû. Ev şer yekser ji alîyê Mesud û Îdrîs ve dihat meşandin û bi vî awayî derbeka pir mezin li şoreşa rojhilatê Kurdistanê xistin.

Di wê demê da, tê bîra min ku radyoyê Partîya Demokrat pir behsa xiyaneta wan dikir. Dr. Qasimlo jî pir qala xiyaneta wan dikir. Her wiha pirtûkek jî bi navê “Xîyaneta Qiyadîya Mueqet” hate nivîsandin. Ev pirtûk ji alîyê Qasimlo û yek ji endamê navendî Mele Evdellah Hesen Zade ve hatîye nivîsandin. Qasimlo piştra bû serokê Partîya Demokrat. Ev pirtûk hîn jî berdest e.

Piştî derbeyên mezin lê xistin, şer sekinî. Pêşmerge neçar man ku ji bajar derkevin. Ji ber wê dewlet vegerîya bajaran. Jixwe piştî ku dewlet vegerîya hikûmekî leşkerî hebû. Artêş hebû û milîsên dewletê jî hebûn. Xelk digirtin, mal talan dikirin. Her wiha pêşmergeyan çalakî dikirin. Bi rojane milet di tûnelan da bûn û li jor jî şerekî pir giran hebû. Tê bîra min; şerekî şer bû. Ji qereqola bajar hawan diavêtin. Suîqest dikirin. Helîkopter jî

radibûn.

Piştra pêşmerge êdî li gundan diman. Operasyon li dijî wan dikirin û pêşmerge derbasî herêmên sînor bûn. Parek ji wan başûrê Kurdistanê ra derbasî Îranê dibûn û çalakî dikirin. Wê demê şerê Îran û Îraqê jî hebû. Îraq partîyên rojhilatê Kurdistanê destek dikirin û Îran jî partîyên başûrê Kurdistanê destek dikirin. Di wê demê da Doktor Qasimlo wan jî hemû li Qendîlê diman. Ev pêvajo wisa jî dewam kir.

Piştî ku dewlet hat, hîna hikûmê eskerî dihat meşandin. Rewşa taybet jî hebû. Tevger qedexe bû. Wê demê jî çi kirin ji bo ku hakim bibin? Parek ji xayinan pir bikar anîn. Tê bîra min; êlek li herêma Mehabadê hebû, bi kurdan ra pirsgirêk jîyan dikir. Ji ber wê ew çûn alîyê dewletê. Dewlet jî her ew destek dikirin û çek didan wan û bi destê kurdan li wan zilim dikir. Wê demê di bajaran da rêxistinên bajaran çêkirin. Zêdeyî xwe genc bûn. Ji bo ku karên çalakîyên leşkerî bikin û zêde şexsên îstixbarat û girêdayî dewletê dikirin hedef û dikuştin. Navê wan jî Hêzên Bergirî bû. Tê wateya Hêzên Berxwedanê. Çalakîyên pir mezin

kirin. Tê bîra min, rojane kesên girêdayî dewletê bûn dihatin kuştin. Zêdeyî wan têkoşeran jî genc bûn. Dewlet jî piştî wan çalakîyan, operasyonên pir mezin derxist. Tê bîra min, li Îranê, sala 1983ê, 59 kes girtin. Parekî wan genc bûn. Xelkê normal bû. Ne însanên sîyasî bûn. Heta ne çalak bûn. Hemû jî bi dar ve kirin. Her wiha berîya bi dar ve kirinê, êşkenceyan li wan dikirin û dianîn ber televîzyonê û didan axavtin. Ew jî li xwe mikur dihatin û diaxivîn. Cenazeyên wan darvekirîyan hîn jî nayê zanîn ku li ku ne.

Hinek îtîrafcî û xayin hebûn. Kesên xwe teslîm kirin jî hebûn. Yek hebû ji nav wan revîya bû û xwe teslîm kiribû. Bi maşîneya leşkerî digerîya. Destê xwe şanî kê bikira ew mirov diçû. Piştra ew kes bi destê jinan hat kuştin. Jinan ew di kolanekê da girtin û bi keviran dawîya wî anîn. Di cenazeya wî da dewlet bi xwe pirovakasyon derxist. Hejmarek milet kuştin û xistin li ser milê partîyên kurdan. Jixwe şaşitîyên partîyên kurdan jî hebûn û lewazî hebûn. Di Salên 1987 heta 1988an, tim çalakî hebûn.

**JÎN (di dema şer da)**

Piştî şerê Îran û Îraqê sekinî, her du dewletan jî partîyên di nav erdê xwe da sekinandin û heta çek jî ji wan sitandin û bi vî awayî xebata hemûyan sekinî û vemirî. Piştî wê demê qonaxek bêdengî di Kurdistanê da dest pê kir. Partîyên başûrê Kurdistanê biryar girtin ku Kurdistanê bihêlin û biçin. Rayedarekî wan bi navê Cewher Namiq hebû. Ew demekê serokê parlamentoya başûrê Kurdistanê bû. Piştra li xwe mukir hat û got: "Me biryara çûyînê girt, lê belê Sedam êrîşî Kuweytê kir. Ew jî bû derfetek, careka din em vegerin." Ne ji wê ba îflasê xwe îlan kiribûn. Li başûrê Kurdistanê tenê PKK mabû. Dema ku şerê Îraqê dijî DYAyê derket, partîya kete nav bajaran PKK bû. Wekî din kes nema bû.

**Ji Vê û Şûnda Rewşa Îranê û ya Kurdan**

Bi li hev kirina ku di navbera Îran û Îraqê da çêbû, tevgerên kurdan yên her du beşan hema bêje sekinîn. Vê jî bandorek pir xerab kir. Di wê demê da piştî mirina Xumeynî li Îranê Refsencanî hate ser desthilatîyê. Xamenî bû rahber û Refsencanî jî bû serokkomar. Refsencanî jî xwe wekî xeta

navîn nîşan dida. Tundî jî di dema xwe da çareser kir û hinek têkilîyên aborî yên pir mezin bi Ewropa ra bi pêş xist. Berîya wê jî Ewropa Qasimlo da Îranê û gotin: Guhertin çêbûye. Refsencanî hatîye û gotin gerek bi Îranê ra rûnin. Bi veşartî çûn li gel heyetek Îranê ra li Vîyanayê rûniştin û şande ne dîplomatîk bû. Di esas da û bi wî awayî Doktor Qasimlo hat terror kirin. Tiştekî pir bi êş e. Çima Doktor Qasimlo bi xwe bi wê heyetê ra rûnişt? Ji ber ku kadroyên xwe yên dîplomasîyê tune bûn! Xuya bû ku kadroyên xwe çênekiribûn yan jî bawerî nedida tu kesî heya ku bikaribe kadroyan bide ava kirin. Partîya wî pir bi hevdîtinan ne agahdar bû. Piştî şehadeta Doktor Qasimlo Partîya Demokrat pir lewaz ma. Pey wî ra salek an du salan Şerefkendî -ku şûna Doktor Qasimlo girtibû- li Berlînê bi heman şêweyî hat terror kirin û derbeyên pir mezin xiwarin.

Li başûrê Kurdistanê guhertin çêbûn. Şer bi dewletê Îraqê ra çêbûn û serhildan derketin û bû derfetek ji bo partîyên başûrê Kurdistanê. Di esas da ji ber berdana wan ji milet ra ji alîyê gel

ve qet nedihatin qebûl kirin. Bi taybet KDP, ji bo hakîmîyeta xwe li ser milet bikin pîlan danîn. Pîlan jî ew bû ku milet hemû koçber bikin. Gotin: Vaye Sedam Huseyn bi kîmyasalê lê dide û milet bi hezaran koçber kirin. Bi wî şêwazî piropagandayekî sîyasî li ser gel meşandin û ew pir westandin. Hinek li Îranê ji ber serma û birçîbûnê mirin. Li Tirkîyeyê jehr xistin ava wan. Bi vê pîlanê ra civak dan tirsandin û westandin ku wan ber bi xwe ve bînin. Vê carê jî pîlana duyem şerê li hember PKKê bû. Gotin: Em dê parlamentoyê çêkin. Tirkan jî gotin: Ger hûn bixwazin em parlamentoya we qebûl bikin, dive hûn li hember PKKê şer bikin. Wan jî pesend kir. Di sala 1992ê da êrîş kirin, lê bi ser neketin. Soza Tirkîyeyê ew bû ku 20 milyon dolar bidin KDP û YNKê, lê 5 milyon dolar dan û avêtin ser çavê wan û gotin: “We ewqas şer kirîye.”

Di navbera KDP û YNKê da şerê hundirîn jî dest pê kir. Bi şerê hundirîn ra civaka başûrê Kurdistanê hemû ji hal xistin. Ji ber ku Îraq di bin ambargoyê da bû. Wisa civaka başûrê Kurdistanê ji kurdîyetê, sîyasetê dûr xistin. Ji her tiştî westandin û derîyê

rêxistin kirina partîyên îslamî ya girêdayî Tirkîyeyê û Îranê vekirin. Bi zanebûn wisa kirin û li gor xwe dest bi rêxistin kirina gel kirin. Ji ber ger ku tu bixwazî bêtir li ser civakekê hakim bî, divê ew milet ji alîyê sîyasî ve kêmtir be, kêmtir welatparêz be û zêdetir biçe nav îslama sîyasî. Wisa hakîmîyet dê li ser gel zêdetir çêbe. Wisa pîlan bi pîlan xwestin koka vî gelî biqelînin. Wê demê KDP û YNK anîn başûrê Kurdistanê. Her du partîyan ji PKKê xwest ku teslîm bibe. Osman wê demê teslîmî tirkan bû û çû li Zelê rûnişt. Rêbertî û Komîteya Navendî ya PKKê ew tişt nepejirand û Osman mehkeme kirin û gotin: Em ne tevgerekî wisa ne ku biçin bin hikûmê wan. Ji ber ku sîyaseta wan dîyar e. KDP di berê da girêdayî Tirkîyeyê ye.

Wesîyeta Mele Mistefa Barzanî heye, ji zarokên xwe ra dibêje: “Tu carî ji tirkan qut nebin.” Ew tişt bi tevgerên rojhilatê Kurdistanê jî kirin û gotin: “Dive hûn çalakîyên xwe bidin sekinandin û ji sînor dur kevin.” Piştra wan li Koyê bi cih kirin û dest bi terror kirina hemû însanê wan yê ber çav û sîyasî kirin. Ev tişt bi fermî hatîye belge kirin; zêdeyî 500 kes yên ji

rojhilatê Kurdistanê li başûrê Kurdistanê bêyî yek kes jî bê girtin hatin teror kirin. Ev ji ber destên YNK û KDP tê da heye wisa bû. Di dervayî kontrola wan da kî hebû, girtin û ji holê rakirin.

Êdî di wê demê da Îran kete nav jîyana wan. Pê lîst û hereket dan sekinandin. Wê demê valatîyek cidî di qada rojhilatê Kurdistanê da çêbû. Rojhilatî ji çend tiştan aciz bûn. Yek: Hereketê sîysî sekinîye. Du: Zilmê dewletê pir zêde ye. Sê: Helwest li hember xiyanetê tune bû. Ji ber partîyên rojhilatê Kurdistanê rihet teslîmî talabanî û barzanîyan bûn, wî jî acizîyek çêdikir, di nav gel da.

Wê demê Îran êrîşekî sîyasî pir mezin ji bo Kurdistanê da destpêkirin. Ew êrîş çawa bû? Esas şoreşê Îranê hemû ne Îslamî bû. Rista çepgiran jî tê da hebû. Tevgerên îslamî ne yên girêdayî Xumeynî jî hebûn. Navê wan Mucahîdî Xelq bû. Wekî min got: Ji çepgirên redîkal hebûn, çepgirên din hebûn, kurd û hemû miletên wir bi hev ra şoreşê Îranê çêkirin. Lê belê îslamî bêtir xwedî rêxistin bûn.

**JÎN (di dema şer da)**

Di vê demê da çend tişt hebûn: Ji wan yek tevgerên çepgir bi sedemên çalakîyên redîkal, bi xwesteka NATO hemû serokên wan û hemû kadroyên wan yên esasî hatin kuştin. Lê yên îslamî herî zêde du, sê sal cezayê zindanê dixwarin, piştra sirgun dikirin. Yek kadroyên îslamî yên sîyasî nehat kuştin. Bi taybet ên nêzî tevgera Xumeynî. Ew herî zêde hatin sirgun kirin. Xumeynî jî yek ji wan bû. Her wiha mizgeft bi kar dianîn. Di her taxekî da mizgeftên wan hebûn. Mînak: Xumeynî diaxivî, kasetên wî li mizgeftan belav dibûn. Mizgeft kiribûn cihê perwerdeyê.

Tevgerên çepgir çalakî û meş dikirin, lê wisa di hundir da xwe rêxistin nekiribûn. Di kolanan da jî xwe rêxistin nekiribûn. Piştî şah çû yekser hikûmet negirtin destê xwe. Çi kirin? Gotin: Bila hikûmetek lîberal hikûm bike. Xumeynî qedexe kir ku mele bikevin hikûmetê. Çima? Ji ber dizanî bû ku pirsgirêk dê derkeve. Hikûmet rûxîyaye, aborî lewaz e û tiştek nemaye. Mînak: Serokê hikûmetê zilamek bû wî got: “We kêrek da min lê hesinê xwe tune ye û tenê bi destik e.” Xumeynî û alîgirên

wî ji taxan û mizgeftan dest pê kirin. Bi aborî jî xelk rêxistin kirin û çek jî belav kirin û ciwan kom kirin. Ji wan ra jî digotin; komîteya şoreşê û di esas da hêz ew bûn. Hêza dewletê nema bû. Artêş jî zêdeyî xwe belav bibû. Ji kîjan hêz hez nekirina, ew komîte dişandin ser wan û wisa hêzên çepgir tasfîye kirin. Ew komîte hemû, bûn parêzvanê şoreşê. Wan wisa xwe rêxistin kirin û bi lez artêş çênekirin. Wê demê Xumeynî digot: “Em 20 milyon in. Divê em artêşekî 20 milyonî ava bikin û tişt bi rêya rêxistinên gel werin kirin.” Komara Îslamî her tim wekî hereketek îdeolojî, sîyasî û partî tevgerîya, ne wekî dewlet. Ew hêza xwe ji edebîyata zilmê Şîîtîyê digirin. Şîî dewlet be çi be xwe di mijara Kerbela da mezlum dike. Bi wê edebîyatê her tim xwe mezlum nîşan dida. Hem desthilat e hem jî muxalefet e. Di wî karî da pir jî jêhatî ne.

Bi navê Besîc hatin di nav gel da rêxistinên xwe çêkirin. Besîc jî tê wateya seferberîyê. Îraq jî êrîş kiribû û hin herêm girtibûn. Bi wî awayî xelk rêxistin kirin. Ji wan ra tiştên taybet çêdikirin. Helbest û sitranên li ser Huseyn, mezlumîyetê Kerbela çêkirin.

**JÎN (di dema şer da)**

Ew diçûn xwe li mayinan diqelibandin û li Kurdistanê jî parek ji wan şer kir. Wê sîstemê koka xwe berda bû nava gel, çavên xwe li her derê hebûn. Ji ber wê nefes li çepgiran qut kiribûn. Kê bilivîya hêza heman herêmê diçû ser wan. Wisa xwe li her cihekî belav kirin. Piştî nemana partîyên kurdan, ew Besîc anîn li herêmên kurdan jî rêxistin kirin. Jixwe bi pere û her tişt bikar dianîn. Tê bîra min, dema em zarok bûn, pêşmergeyan şer dikirin û ji bo me ew qehreman bûn. Her kes muxalifê dewletê bû. Kesê ku di bingehê xwe da welatparêz bûn hebûn, xwe muxalifê dewletê didît. Kesê ku bi dewletê ra bana dîrek navê cehş lê dikirin. Di nava gel û cehşan da sînorekî kûr hebû û milet ji wan hez nedikir.

Piştra rêxistina Besîc cehştî di nav gel da kir tiştekî normal. Her wiha tu Besîc bûya pir derfetên te hebûn. Yên xiwendinê, kar û hwd bi dest dixistin. Ajan pir ava kirin. Wekî din çi kirin? Di Kurdistanê da hinek berpirsên kûr anîn. Ew zilamê wan bûn û xiwestin bi destê wan Kurdistanê xera bikin. Mînak: Fermandarê Sine zilamekî kurd bû. Di dema wî da madeyên

hişbir, gendelî, ajantî her tişt di bajarê Sine da berbelav bû. Dest bi rizandin û herimandina civaka kurdan kirin. Jixwe civak tiştan dibîne, lê hêzên kurdan nemaye ku vê civakê biparêzin. Tenê xwedî refleks e û rêxistina xwe tune ye. Gel dixwest ji wê rewşê rizgar bibe.

Kurdan nas kirin ku partîyên kilasîk nema dimeşin, ew têrê nake, yanî divê hêzek li hember dewletê hebe û hêzeka ku li hember tiştê ku başûrê Kurdistanê dike jî hebe. Tevgerek hebe, hem ji bo civakê têbikoşe, hem jî netewî be. Yên ku qala sosyalîzm dikin û çepgir bûn, ew xwedî li kurdîtîyê dernediketin. Tê bîra min, em li zanîngehê bûn, çepgir nedihiştin ku tu qala kurdan bikî. Wan digotin: “Hûn netewperest in.” Min jî digot: “Ger hûn sosyalîst in, çima bi farisî sosyalîst in, bi kurdî sosyalîst bin! Çima yê faris wek kurd fêrî ziman nabe, em kurd in û ne netewperest in, lê divê em li tiştê xwe jî xwedî derkevin.” Wan ji me ra gotin: “Hûn faşîst in.” Vê carê çepgir li milet xwedî dernediketin û koka xwe çênekiribûn. Hinek wisa êlît diman. Kesê ku behsa

netewîyetê dikirin ji alîyê civakê ve pir paşverû bûn. Zilamê îqtîdarcî û kurdîyetî tenê di sembol da, di cil û ziman da bû. Ji ber ku formulek ji meseleya netewî heye. Tiştê wisa tune bûn. Tenê hest bûn û yên berê li ser hatîye kar kirin û kesên şehîd dayîn.

Wan tiştan li însan bandor dikirin. Ez bi xwe pir bandor bûm. Tê bîra min, serê sibehekê pêşmergeyek li ber derîyê mala me şehîd bibû û mejîyê wî bi derî ve zeliqî bû. Me qehremantî didît. Hindek ji wan bi rastî jî qehreman bûn. Hindek jî di çand da lewaz bûn. Ber bi çetetîyê ve diçûn. Hindek însan jî pir bi şexsîyet bûn. Ew jî zu tasfîye dibûn û derfet nedidan wan di nav hereketê da îdeolojîyek ku safî bike tune bû. Têkoşîneka wisa tune bû. Van tiştan valatî çêdikir.

Ne ew netewperestîya kilasîk bersiv bû û ne jî ew çepgirî bersiv bû. Lêgerînek hebû, wê demê çi derket? PKK derket.

PKK berê li herêmên sînor hebû. Her tim jî xebatên xwe yên çekdarî û lojîstîkî dikirin. Lê rêxistinek zêde di nav gel da nebû û yê zêde tevlî bibû ji herêmên kurmancan bûn. Ji Makuyê û

Urmîyeyê bûn. Her wiha pir hindik ji wan ji herêmên Soran û Hewramanê jî hebûn. Di esas da min PKK ji gencên başûrê Kurdistanê nas kir. Dema ku hatibûn Rojhilat. Tê bîra min, ji bo ku milet sempatîyên xwe ji bo başûrê Kurdistanê hebû, ji ber ku şer li hember Sedam hebû, yanî milet nediwêrîyan wêneyên Qasimlo eşkere hildin. Hatin mala me û ji mala me jî wêneyên Mesud û Mistefa Barzanî daliqandî bûn. Gencekî ji Kerkukê bû, wisa meyze kir, ez pêhesîyam ku ne razî ne. Min jî jê ra got: “Tiştek heye?” Wî got: “Çima wan wêneyan li wir in?” Min got: “Ew kurd in, têdikoşin û tiştê wisa.” Bersiv dan û gotin: “Hûn li ser têkoşîna wan çi dizanin?” Gotin: “Ev ji Sedam xirabtirin.” Em şaş û metel man ku çawa tiştê wisa dibêjin. Wan got: “Belê wisa ye. Ew qet nebûn kurdê rasteqîne.” Vî carî anîn bîra me ku li rojhilatê Kurdistanê çi kirin. Ew tecrubeyê me jî hebû, me got wisa ye. Piştra me li ser kurdê rojhilatê Kurdistanê ku çawa nahêlin xebat li pêş bixin nîqaş kir. Me got: “Kurd divê çi bikin?” Bersiv dan û gotin: “Ger kurdîtîyek hebe û têkoşîn bike PKK ye. Me got: “PKK kî ne?” Wan gotin: “PKK partîyeka redîkal, welatparêz e. Li

bakurê Kurdistanê dixebitin. Pir cidî ne. Pir bi disiplînin û însanên wan hemû perwerdekirî ne, xwedî zanist in.” Tiştê ku em lê digerîyan di ruh da ew bû. Însanê xwedîyê hizir, xwedîyê bawerî û bixwazibin teslîmî paşverûtîyê nebin. Wê demê ji bo kurdan yên ku tiştekî bikin ew bûn. Ev wek meraqekî di mejîyê me da ma û me xwest em PKKê bibînin. Carekê ez bi wî meraqê çûm Mikolê. Min PKKyî dîtin. Min bi çavên xwe dît ku PKK xwedîyê hizir e. Di şexsîyetê hevalan da dan û sitandinên wan, pir xwe ferz dikir û ew jî di sala 1994ê da bû. Ew sekin pir li ser me bandor kir. Piştra min hevalên jin dîtin. Berîya wê jî min jinên sîyasî li rojhilatê Kurdistanê dîtibûn, lê pir kêm bûn û ne xwedîyê rol bûn. Lê ew heval xwedîyê rolekê bûn. Ew ji bo me tiştekî nû bû. Ji ber em fêr bibûn ku tenê çend kesên sîyasî li jor bûn yên din jî hemû pêşmergeyên ji rêzê bûn. Tiştekî nizanî bûn. Me dîtibû hetanî sîyaseta partîya xwe nedikarîn vebêjin.

Tê bîra min, li gundê me, carekê civîn çêkirin. Yek ji wan hevalan got: “Partîya me ji Kurdistanê ra otonomî ji Îranê ra

demokrasî dixwaze.” Taybetmendîyên pêşmerge çi bûn? Hemû xelkê herêmê bûn. PKKyî yek ji Dêrsim, yek ji rojhilatê Kurdistanê yek ji rojavayê Kurdistanê bû, yanî hem bi hev ra şer dike û hem jî bi hev ra sîyaset dike û li ser van esasan bi hev ra kar û xebat didin kirin. Kesek ji nav milet rabû û got: “Ew otonomî çi ye tu behs dikî?” Bersiv dayê û got: “Çi zanim partî wisa dibêje. Tu jî pir pirsa dikî.” Lê zanebûna hevalan pir cuda bû. Wê demê min ji hevalan ra got: “Ez pir bandor bûm û ez dixwazim bi were kar bikim.” Wisa jî têkilîyên min û yên hevalan bi hev ra çêbûn. Jixwe ez tecrubeyên xwe dibêjim û bi wê têkilîyê ra em çûn zanîngehê. Tiştên ku min jîyan kirin bi hevalên xwe ra parve dikir û em bûn komek û heval hatin. Piştra hevalekî me yê sineyî hebû, pê ra çûn Sine, yê Kirmanşanê wisa hetanî Îlamê çûn. Piştra çûn ta Xorasanê û Tehranê. Her cihekî ku derfet heba xwe digihandin. Civak ji wan bandor dibû. Bi taybet ciwan diçûn di nav baxçeyan û gundan da civîn çêdikirin.

Îran bi vî tiştî hesîya. Gef li tevgerê xiwar û got: Em dê wan

bigirin, teslîmî tirkan bikin. Em dê we ji sînorên xwe derxin. Piştra di navbera me û wan da şer çêbû. Di şer da leşkerên Îranê mirin û yek du hevalên me jî şehîd bûn. Ev tişt bêtir li ser gel bandor kir. Ji ber cara yekê ye ku partîyeka ji parçeyê din di nav parçeyê wan da li beramberî dewletê li ber xwe dida û şer dike. Ji ber yên Barzanî, bi fermî û bi aşkera dihatin. Partîyên din jî wisa bûn, me van tiştana bi çavên serê xwe didît. Sîyaseta wan ew bû. Rast e, dijminekî hevpar Tirkîye heye, lê PKK bi tu carî nebûye zilamê Îranê. Ew aşkere gotin. Rojhilat parçeyek ji Kurdistanê ye. Ji ber vî jî heqê me ye ku em xwe li wir birêxistin bikin. Ev tişt Rêbertî li Sûryeyê jî kiribû û wisa rêxistin pêş ket. Îranê hinek heval xist zindanê. Ji bo ku hevalan teslîmî tirkan nekin, Rêbertî hinek hevalên ji rojavayê Kurdistanê û yên jin jî şand wir. Wê demê hevaleka ji başûrê Kurdistanê hebû, hevaleka jin bû, di zindanê da kete gireva birçîbûnê. Heya asta ber bi şehadetê ve jî çû û eger şehîd biketa, di zindanê Îranê da pirsgirêk pir mezin dibû. Girseyên gel hemûyan digotin: "Keçeka PKKê di zindanê da ber xwe dide." Wisa tiştek ecêb didîtin. Ew heval dîsa radestî hevalan

kirin. Wisa rihet ew hereket pêş neket. Piştra di nava gel da tevlîbûn çêbûn.

Dema dîl girtina Rêbertî, gelê rojhilatê Kurdistanê li Rêbertî xwedî derket. Hinek dibêjin tenê hest bû. Belê hest tê da heye û hestên welatparêzî di kurdên rojhilatê Kurdistanê da xurt e. Lê belê PKKê xwe gihandibû gel, lê kes wê qonaxê nabîne, li wir ji 1997ê û şûnda PKKê xebat dikir. Ji ber wê gel PKK nas dikir û rêbazên wê pejirandibûn, ev jî rastîyek e. Rêbertî nas kirin, pirtûkên Rêbertîyê bi soranî dixwendin û di nava gel da vîdyoyên Rêbertî belav bibûn. Wana jî tamaşe dikirin. Piştî wê tevlîbûnek mezin çêbû. Wê demê jî Rêbertî sipasîya gel kir. PKKê jî wê demê ji gel xwest ku bila serhildanên xwe ji bo xwe birêxistin bikin. Wê demê partîyên rojhilatê Kurdistanê ev tişt çewaşe kirin û gotin: “PKK ji gel ra gotîye bila gel li hember rejîmê tiştekî nekin û ew pîlanên Îsraîl e.” Di rastîyê da jî ew tişt tune bû. Lê belê ew serhildan pir girîng bû. Însan şehîd diketin, însanan xwe dişewitandin ji bo Rêber Apo.

Piştî tevlîbûnên mezin ji nava gel ji refên gerîla ra, di sala

**JÎN (di dema şer da)**

2000î da, li Qendîlê konferans çêbû. Wê demê nav lê kirin Konferansa Rojhilata Navîn. Li gorî sitratejîya nû ya hereketê gerek her hêleka Kurdistanê têkoşîna xwe ya azadîyê kiriba. Te dît berê digotin: “Em dê parçeyekî rizgar bikin, piştra em dê biçin parçeyên din jî rizgar bikin. Wisa wê Kurdistana mezin û azad çêbikin.” Paşê hemû parçe wekî konfederasyonekê xwe ava bikin. Bêyî ku dewlet çêbibe, Kurdistaneka azad wisa çêdibe. Di wê konferansê da biryar hate girtin ku li rojhilatê Kurdistanê hereketeka bi navê Yekîtîya Demokratîk çêbe. Wan xwe li çend navendan bi rêxistin dikirin û bandoreka baş dikirin. Heta wê demê dewletê nedihişt ku sazîyên medenî çêbibin. Kesî nedizanî çêke jî. Di esas da cara yekem Tevgera Apoyî ew tişt çêkir.

Di encamê da yek: Serhildana ji bo Rêbertî, bi cesaretekî mezin çêbû. Serhildanê hêza sîyasî ya kurdan nîşanî her kesekî da û giranîyek çêkir. Du: Li rojhilatê Kurdistanê tevgereka sîyasî û medenî çêbû. Li Îranê belav bû û cesaretek medenî û sîyasî di nav gel da çêbû. Di sala 2000î da şerê PKK û YNKê çêbû. Bi

alîkarîya Tirkîyeyê û Îranê êrîş kirin ku PKKê ji holê rakin. Ji ber vê jî destpêkê êrîşî Qeredaxê kirin. Li wir jî di destê hevalan da çek tune bû, ji ber ku cihê perwerdeyê bû. Hevalên ku nû tevlî bibûn bi destê YNKê hatin şehîd xistin. Jixwe şer wisa dest pê kir. Esas dixwestin ku PKKê tasfîye bikin. Wê demê jî hinek kes xayin derketin û revîyan nava YNK û li cem YNKê gotibûn, kes ji PKK nerazîye û kes şer û berevanîya wan nake, lê PKK pir cuda ye. Sala 1992 jî hatin bi ser PKKê ve, bi wî awayî ku girûpek nû ye, nikare şer bike û hatin. Lê berxwedanîyek pir mezin çêbû û YNK şikest û PKK bêtir fireh bû. Êdî qonaxeka nû dest pê kir. Ez tiştekî bêjim: Tevlîbûna rojhilatîyan bi PKKê ra, şerê di sala 1997ê da, li hember KDP bû, bandorek pir mezin kir. Ji ber ku cara yekem e em dibînin ev berxwedanî li hember xiyanetê çêdibe. Hereketek an ku tevgereka kurdî bi wê cesaretê şer dike. Tevgerên rojhilatê Kurdistanê şer dikirin, lê zu bi zu teslîm dibûn. Li başûrê Kurdistanê çûn teslîm bûn. Lê PKKê mêvantî qebûl nekir. Partîyên rojhilatê Kurdistanê KDP kir xwedîyê mal. PKK pesend nekir ku tevgerek din li başûrê Kurdistanê bibe mêvan.

**JÎN (di dema şer da)**

PKK bi tu carî qebûl nekir ku Kurdistan milkê KDPê be û tiştê ku bi pirojeya NATO ra ne digirt jî ew bû. Ji ber ku her dixwestin Kurdistan bibe milkê KDP, lê PKKê ew hişmendî şikand û bi vê hişmendîyê jî, pir moral da rojhilatê Kurdistanê. Bi vî moralî şerê YNK dikirin û digotin: Êdî bi hêsanî hûn nikarin me ji holê rakin. Di wê demê da pêwîstî bi tevgereka çekdarî hebû, ji bo rojhilatê Kurdistanê bê parastin nemîne. Ev rast bû. Lê belê formulasyona xwe pêwîst e çawa be? Wekî ez dizanim divê bêtir bihata dîqet kirin. Wê demê hêzên çekdar hatin damezirandin û di nav PKKê da tasfîyekarî hebû. Tasfîyekaran her tim dixwestin xwe bêtir nêzî DYAyê bikin. Hereketê qet ew tişt qebûl nekir. Ji ber ku sîyaset ne ew bû. Hêzên çekdar divê bêtir ne di çarçoveya hereketekî kilasîk û gerîlayê kevin da be, diviyabû di çarçoveya hêzên parastina gel da hatiba bi rêxistin kirin. Diviyabû di nav gel da bêtir bihata birêxistin kirin. Şertekî wê demê hebû, ew derfet nedan tevgerê hem li der û dora tevgerê hem jî li der ve. Ya din jî li Îranê derbeyê leşkerî çêbû. Ne bi resmî, lê redîkal hatin û dest danîn ser her tiştî. Ehmedê Necad hat û dest bi girtinan kir. Partîya

**JÎN (di dema şer da)**

Jîyana Azad (PJAK) hatibû damezirandin. Piştra Hêzên Rizgarîya Kurdistanê (HRK) hat damezirandin. HRKê di nav rojhilatê Kurdistanê da dest bi tevgerê kir. Li gel xebatên sîyasî, piropagandaya çekdarî dikir. Her wiha dewletê biryar girtibû ku kontrolekî sîyasî hişk li ser Îranê çêbike.

Di hin deveran da şer derket. Bû sedema şehadeta hevalan û leşkerên Îranê jî hatin kuştin. Wê demê, qonaxeka nû dest pê kir. Îran di sala 2007ê da cara yekem hikûmê îdamê da hevalan. Ew heval ji bakurê Kurdistanê bûn. Bi birîndarî bi dar ve kirin. Ev qonax bi vî awayî dest pê kir. Kî li ser navê PJAK bûya ceza dikirin.

Tirkîye û Îranê di sala 2007ê da rûniştinek bi hev ra çêkirin û biryar girtin ku têkoşîna hevpar li hember kurdan dest pê bikin. Îranê jî PKKê xiste lîsteya terorê û tirkan Parêzvanên Şoreşê yên Îranê perwerde dikir. Bi taybet ji bo ku li hember gerîla bisekine û kontratî bikin. Li rojhilatê Kurdistanê pir kontra çêkirin. Wan kontrayan cilên gerîla li xwe dikirin. Bi şêwazê tevgerên gerîla tev digerîyan û eger gerîla şehîd bixistana,

tirkan pereyekî baş dida wan kesan û Îran jî pere dida wan. Bi vî awayî hinek tevgerên kontra çêbûn. Piştra ev hemû tevger li serê wan bûn bela. Ji ber ku çûn pir însanên medenî kuştin û cilên gerîla li wan dikirin û difirotin dewletê. Yek ji wan hebû navê wî Hîwa Tab bû. Mesela însan ji başûrê Kurdistanê dihatin rojhilatê Kurdistanê. Ji bo karekî li wan deveran bikin. Kesên wisa dikuştin û cilê hevalan li wan dikirin û difirotin. Wisa jî dirav bi dest dixistin. Van tiştan pir acizbûn di nav gel da çêkir. Îranê bi xwe ew girtin, lê em nizanin çi bi wan kirin. Di nav tirkan da çi bi Yeşîl kirin, wisa ji wî kesî jî kirin û wenda kirin. Gotin îdam kirine. Lê belê kes nizane û ne yeqîn e.

Li Îranê şêwazê kontratî hîn jî heye. Bi alîkarîya tirkan kontratî dikin. Her wiha li Îranê çalakî jî çêbûn. PJAKê çalakîyên pir bi bandor kirin. Piştra dan û sitandin çêbûn û agirbes hat ragihandin.

Di 2011ê da, şerê Qendîlê çêbû. Îranê dixwest Qendîlê bigire û girtina Qendîlê hemû başûrê Kurdistanê dike bin hakîmîyeta

**JÎN (di dema şer da)**

Îranê. Li ser vî esasî êrîşekî mezin dest pê kir. Di vî şerî da berxwedanîyek dîrokî çêbû. Bi hêzekî mezin, bi fermandarîya Şehîd Simko qehremantîyek pir mezin dan nîşandan ku bi rastî îradeya dewleta Îranê şikandin. Li ber çavên cîhanê ev tişt nîşan dan ku berxwedanîya Apocîyan çi ye, di şer da. Ew bû moraleka pir mezin, di nav gel da. Derfet heye ku li hember artêşa mezin bisekinin. Pirî caran leşkerên artêşa Îranê çekên xwe avêtin. Li xwe dixistin ji bo neçin şer. Ji ber vê gel moraleka pir mezin girtibû.

Pey vê ra bi Îranê ra qonaxa agirbestê çêbû. PJAK çalakîyên xwe yê leşkerî sekinand, lê bi şertê ku Îran tiştekî neke ku PJAK neçar bibe û bersivên leşkerî bide. Ji ber ku mafê parastina rewa heye. Ji ber ku tevgera me ji alîyê leşkerî ve tenê pêş nakeve. Civak ji dewletê aciz e. Her wiha milet dixwaze tolê hilde. Wê demê edebîyat dibe eskerî. Lê em dixwazin rêxistin di nav gel da jî pêş bikeve. Her wiha di sîyaseta me da ku em rejîmê biguherin tune ye. Lê em guhertinên demokratîk çêbikin ku gel xwedî îrade be. Tu

dewletê mecbûr bikî ku îradeya gel qebûl bike. Îran dixwaze ji derve çeperên şer pê ra vekî lê belê tu neyê hundir. Jixwe her tişt hikûmê îstixbaratî û leşkerî ye. Ji ber ku şer bêtir wê meseleyê bi hêz bike. Yek jî bi taybet meseleyê gelan û ya gelê kurd hesasîyetek pir zêde heye, divê kurd şerekî nekin. Ger nekevê xizmetî wan. Îran bi gelek welatan ra pirsgirêkên xwe hene. Em nebin beşek ji wê meseleyê. Ger em şerekî bikin, dive destkeftîyên wê ji bo gelê me be. Ne ku em şer bikin ji bo xelkê. Piştra li ser me bazirganîyê bikin. Ji ber wê doza kurd li rojhilatê Kurdistanê pir hesasîyeteke sîyasî dixwaze. Li gel wî jî tevgerek di nav civakê da xurt be, ji ber wê jî qonaxa agirbestê berdewam dike li rojhilatê Kudistanê. Lê belê yê girîng çi ye? Di Îranê da divê mirov çi bike? Gereke îradeyê xweparastinê hebe. Em bi wê têkoşîna edebîyata hiquqî demokratîk dikin, nabe. Ji ber ku sîyaseta tasfîyekirinê heye. Digire bi dar ve dike. Mînak; Ferzad Kemanger mamosteyekî dibistanê bû. Girtin û dar ve kirin. Tiştek bi te ve dike. Te dike ajan, te dike her tişt û her wiha te dike dijminê Xwedê, dijminê îslamê û bi vî awayî hikûmê îdamê didin. Dadgeha leşkerî heye

li Îranê. Dadgeha şoreşê jê ra tê gotin, ew dadgeh du sê deqa berdewam dike. Heqê te yê parastinê nine. Melayek li wir rûniştîye û îstixbaratekî kevin e. Dibêje tu dijminê îslamê yî, tu qebûl dikî nakî? Jixwe te di êşkenceyên mezin ra derbas dikin. Hema dibêjin hikûm darvekirin e. Pir heval wisa îdam xiwarin. Apoyîyan li hember wî zindan kirin cihê berxwedanê. Berî wê demê di zindanê da berxwedanîyên ferdî hebûn, lê berxwedanîyên mezin û sîyasî ku li hember dijmin berxwedanîyê bike xwe bi rêxistin bike wisa tune bû. Bi Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd ra ew tişt lê zêde bû û li Îranê hîn zêdetir bi pêş ket. Mînak; Şehîd Ferzad li mafê xwe xwedî derket, dengê xwe bilind kir û gihand cîhanê. Digotin: “Em dizanin ku em şehîd in. Lê erkê we jî heye ku hûn dengê me bigihînin cîhanê.” Çawa ku di zindana Amedê da bû, êdî zindan bû cihê têkoşîna sîyasî û berxwedanî li hember dewletê û wisa têkoşîneka bi vî rengî dewam dike.

Têkoşînên berxwedanîyê li Îranê divê mafê parastina çekdarî yê gel hebe. Gerek gel vê mafê ji xwe ra bibîne. Ev zagonên

nav dewletî dibêje, divê çek tenê yê dewletê be, lê tu îtîrazek medenî bike, herî zêde gilî bike ji wê zêdetir divê gel xwe biparêze. Ji ber li Îranê kontra hene. Dest diavêjin namûsa civakê. Madeyê hişbir belav dikin. Mesela ne ku tenê leşkerkî bikuje, aniha bi vekirî îstixbaratê Îranê belav kirina madeyên hişbir bi rêxistin dike. Baş e, kê wan ciwanan biparêze? Fihuşê jî belav dikin. Zarokên welatparêzan xerab dikin. Divê li hember wê berxwedanî bê kirin. Hinek însan jî divê bên ceza kirin, ev mafê wî gelî ye. Rêxistina wê jî ne ku îlegal, li serê çîya be. Gereke dewlet bizanibe ku rêxistin û îrade di nav gel da heye û refleksa wî heye. Gelê rojhilatê Kurdistanê ji wî tiştî ra amade ye. Lê dijwartîyeka pir mezin heye li Îranê. Rihet însana dikuje. Bi pêşketina têkoşînê, tirsa civakê ji dewletê şikestîye. Berê milet pir ditirsîya. Niha wek berê natirsin.

Li ser Îranê mirov çend tiştan dikare bêje; we pirsek kir ku, çima ewqas serhildan li Îranê çêdibin û guhertin di nav Îranê da çênabe?

Jixwe ew pirs di PJAKê da bû sedema vekolînê. Bi rastî em

dijminê xwe nas dikin an na? Rê û resma vê dewletê çi ye? Em gihan wê encamê ku em nas nakin. Em li gor çi diçin? Em li gor edebîyata ku Îranê resmî bi xwe dide derve, çawa ew xwe dide nas kirin em wî wisa nas dikin. Ew jî dibe sedem ku em her tim di sitratejîya xwe da li hember dewletê şaş bikin. Di wê vekolînê da encam derket. Sîstema desthilatdarîyê ya Îranê taybet e. Ew sîstem pir kûr e û xwe bi rêxistin kirîye. Sîstema herî navendî ya desthilatdarîyê, li Rojhilata Navîn ya kevin, şah bû. Hêza şah pir ji siltanên osmanîyan xurtir bû. Hakimî can, namûs û her tiştê civakê ye. Her tiştên li Îranê milkê şah dihat hesibandin. Li Tirkîyeyê Sencaq hebû. Di hikûmê şahtîya Îranê da sencaq tune ye. Ji ber ku milk her yê şah e. Di sîyasetnameyê da sîstem pir cuda ye, vê ferqê tu dibînî. Mesala hikûmeta xîlefeta îslamî di gel hikûmdarîya şah da xuya ye. Wê demê Îran jî dixwaze vegere. Me nav lê kiribû sîstema xusrewî. Sîstema ajantî di nav gel da cara yekem îranîyan pêş xistîye. Ji bo desteser kirina derve di nava sîstema leşkerî da pêş xistîye. Lewra jî niha dixwaze ku çawa gel kontrol bike, ev sîstem bi temamî bi kar anîn. Ji bo bawerîyên cuda di nav gel da bikuje û

îdeolojîyek pir giran ku kes hêz negire ku dengê xwe li hemberî wan bike. Îcar heya ku bikaribe li ser gel hakim be bawerîya zerdeştîyê ji bo xwe bikar anî. Sîstema leşkertîya taybet, mînak artêş heye û artêşa nemir heye. Ji alîyê din ve artêşa ku tenê şah û sîstemê diparêze heye. Her wiha li ser van esasan îdeolojîyek dimeşîne ku ev bîrdozî niha jî heye. Yên ku jê ra dibêjin Parêzvanên Şoreşê vê rolê dileyizin. Birokrasîya desthilata wan pir xurt bû. Ji ber wê jî parek ji sîstema osamanîyan ji sîstema Îranê bû. Mînak; di sîstema îranîyan da harem heye. Harem cihekî perwerdeyê yê taybet e. Ew xulaman perwerde dikin, piştî Kapî Kulu çêbû, hem ew xulamên ku ji pirojeyekî cinsî bigire, perwerde kirî ne hetanî dibûn kadroyên sîstemê. Wisa jî pirojeya Îranîya ye. Çima hemû siltanên osmanîyan farisî dizanîn? Ji ber ku sîstem Îranî bû. Ji wan ra dibêjin, xunkar û munkar, hemû jî edebîyata Îranê ne. Xunkar tê wateya xwedawend an xwedê.

Ew sîstem heye, nimûneya sîstema Komara Îslamî bêtir xurt e. Hem îdeolojîk e hem jî şahê xwe heye. Di şah da jixwe

taybetmendîya ku xweda şandîye heye. Ew bixwe wisa destnîşan dikin. Mînak: Niha Xumeynî nehatîye hilbijartin, xwedê wî tayîn kirîye û karê xwe dike. Li hember wî çawa em ê karibin têkoşîn bikin? Li hember wî çi sîstem hebe? Mînak; partîyên sîyasî bi tiştekî bandor bûne, lê belê rêxistinên civakî bi bandortirin. Alîyên wan yê civakî bi qasî yê sîyasî xurt e. Rêxistina Mazdekî, Manî, Babekî hene. Ev hemû rêxistinên civakî yê kominal in. Bi têkoşîna xwe çandeka cuda ava dikin. Ji ber ku sîstem, çanda civakê bandor dike û çandeka taybet ava dikin. Di wî civakî da çandeka taybet yê berxwedanîyê bi pêş dixin. Bi wî jî êrîşekî li hember sîstemê çêdikin. Her wiha parastina wî yê leşkerî jî heye. Parastina bawerî heye. Hizrê ku dewlet wî fasid kirîye wê hizrê ji nû ve didin jîyandin. Ji ber vê jî gihiştina bawerîya wê ye; divê PJAK jî wê rêbazê bikar bîne. Bi sîstema kominal kar bike. Alîyên wê yê sîyasî, çandî û fikrî bi qasî yên leşkerî xurt be, wekî din jî nabe. KODAR li ser vî esasî hat damezirandin. Ji bo pirojeya civakî ya KCKê an ku ya Rêbertî, di rojhilatê Kurdistanê da pêş bixe. Li ser vî esasî jî qonaxeka nû dest pê kir. Dema ku em bêjin tevgera me jî ev e

**JÎN (di dema şer da)**

ku bi gerîla şer kirine, partîyên kilasîk pêşmerge ye, ew edebîyat li cem gel naskirî ye. Ji ber wî jî gelê rojhilatê Kurdistanê yekser şer dixwaze. Em dixwazin ev tişt bê guhertin. Divê bi qasî ku gel şerê çekdarî bixwaze, berxwedanîya çandî û fikrî jî bixwaze. Em niha bandorê li rojhilatê Kurdistanê dibînin. Gav bi gav nifşê nû mezin dibe ku li ser wî tiştî tevger dike. Xwe ji xetên kilasîk qut dike. Dîrok dibêje bibe berpirsîyar, xwe ji desthilatdarîyê rizgar bike û wisa vîneka nû çêbike.

Eger tu dixwazî di Îranê da tevgerekî berxwedanîya gel hebe, wekî **Şerê Gel Yê Şoreşgerî**, bingeha wê divê biratîya gelan be. Di esas da divê ne netewperest be. Alîyên xwe yên netewî hebin û em wekî çepgirên kevin nekin ku qala enternasyonalîzmê bikin û bêjin netewîyet ji me ra tiştek paşverû ye. Gerek ne wisa be. Ji ber ku em bi çanda xwe parastî ne. Ger çanda me bi navê çepgirîyê tune be, ew jî nirxê xwe namîne. Ji me ra pir pêwîst e ku em parastina netewa xwe bikin. Di heman demê da, ji me ra pir girîng e ku em di

pirojeyekî demokratîk û hevbeş da bi gelên din ra jî jîyan bikin. Ew ji ber çi ye? Di Îranê da, Îran ne tenê dewlet e. Li Îranê Împaratorîya Safewîyan ava bûye, heya Libnanê çûye. Li Ewropa rêxistinên xwe bi pêş xistîye. Li Îraq û Sûrîyeyê jî her wisa ye. Ji ber ku cîhan jî dixwaze bikeve hundirê Îranê. Pir girîng e ku em bizanibin çi dikin. Niha Tirkîye bi leşkerî netewperestîya tirkan pêş dixe. MHP wî tiştî bi pêş dixe. Li Îranê, niha, tebeqeyeka navîn li bajaran heye. Netewperestî bandora xwe li ser gel dike. Ji ber ku tevgereka sîyasî yên din tasfîye kirine, hemû çepgir bûn, hemû demokrat bûn, dostê gelan bûn, çi hiştin? Tebeqeya ku populîst e, tirk dest diavêje wan û pir pere serf dike. Dikişîne nav Tirkîyeyê û perwerde dike. Rast e, hêzên wan çekdarî nîne, lê ger tiştek bibe hêzên xwe yên çekdarî jî dê damezirînin. Şerê Azerbaycan û Ermenistanê derfetek bû ji bo Tirkîyeyê. Ketin wan deran, netewperestîya azerîyan xurt kirin. Îsraîl jî hat wê derê, pîlan jî ew bû ku eger Tirkîye di şerê li hember wan da ser bixe û dema DYA bixwaze mudaxele li Îranê bike wê bi destê azerîyan be. Heta çeteyên îxwan mislimîn ya li Sûrîyeyê wan jî amade

kirine ku resmîyetek ji wan ra jî çêkin. Dixwazin ji Amerîka ra bêjin, ger şer bi Îranê ra çêbû ew leşkerên me ne. Bi vî awayî dewletên ereban jî razî bike. Welatên ereban ew tişt qebûl nekirine. Ji ber ku gumanên wan ji sîyaseta Tirkîyeyê û ya Îxwanê Mislimîn jî heye. Ji ber wê jî neketine wî tiştî. Ji Îranê aciz in, lê Tirkîyeyê jî tirsnak dibînin. Amerîka ew tişt qebûl nekir. Valatîya çêbibe Rusya dê xwe bixe navberê. Ji wê jî şerê Ukrayna eger Amerîka bigihe encamekê ku rus êdî nikaribin mudaxele bikin wê şer biqewime û li Îranê dê mudaxele bikin. Lê belê niha Amerîka pirojeyekî wisa destek nake. Dixwazin pirsgirêk ji bo Îranê çêbikin. Ew jî ji bo kurdan hesasîyetek mezin çêdike. Gelo çima? Niha di pêşbirkeka futbolê da, şerê kurd û azerîyan çêbûye. Li ser ala tirkan. Ew tişt li bajarê Xoyê bûye. Pirsgirêk wekî barûdekî ye. Agirek biçûk jê ra bes e. Netewperestîya tirk yê kurdan jî dixe tehrîkê. Tehlukeyên hember wê çi ne? Yek: Partîyên kurdan xwe nêzikî KDP kirine û pirojeya KDP ji bo hêz kirina tirkan e. Ji ber wê jî, eger şerekî çêbibe, partîyên girêdayî KDP û KDP bi xwe dê piştgirîya azerîyan bikin. Azerî kû derê bixwazibin herêmên ku

nav lê dikin Azerbaycan û kurd tê da bin û herêma Kurmanizişîn ji ber tirkan dixwazin 30 kîlometreyan dervayî sînorê xwe li başûr, li rojhilat û li rojavayê Kurdistanê kurdan der bixe û demografî biguhere. Wê deme hemû kurdan ji wir derbixin. Pîlana wan wisa heye. Ji ber wê jî partîyên kurdan yên kilasîk xwe di nav kurmancan da rêxistin nakin. Partîyên Komele û Demokrat bela xwe li kurmancan nadin. Ji bo ku ger şerek derket li wan jî xwedî dernekevin. Hazirin bifiroşin. Bi şertekî ku çend bajar di destê wan û KDPê da bimîne.

Vê carê ew meseleya têkilîyên kurdan û azerîyan pir hesas e. Divê neçê alîyê netewperestîyê. Niha bajarên me yên hevpar bi azerîyan ra hene, Mako, Xoye, Selmas û Urmîyê heta Hemedanê diçe. Em neçar in jîyaneka hevbeş û rêvebirîyeka hevbeş bi azerîyan ra bibînin. Em bêjin ew herêm ya kurdan e û Kurdistan e û ya azerîyan Azerbaycan e, dê qir kirin bi xwe ra bîne. Divê pirojeya Biratîya Gelan KODAR pêşkêş bike. Em çawa bi hev ra bijîn? Em çawa bi hev ra bimeşin û çawa taybetmendî û nirxên xwe biparêzin? Azerî hemû ne faşîst in.

**JÎN (di dema şer da)**

Divê em bizanibin; ew civak e û civak jî jîyanê dixwaze, şer naxwaze. Her wiha ew jî tehlukeya faşîzmê dibînin. Parek ji wan çepgir in, kevin in. Ji ber wê jî faşîzm tebeqeyeke ku civak her tim dixe tehrîkê û pirovakasyonan çêdike û dixwaze civak bixe seferberîyê. Civakeka ku di bin zilmê dewletê da ye û ji sîyasetê dur ketîye, di alîyên çandî da pir derfet ji wan ra jî nebûye. Ji ber wê van tiştan dikin. Jixwe desthilatdar dixwazin bi faşîzmê gelan bikar bînin. Êlên dijber ji holê rakin, ne ku dixwazin gelan ji bin zilmê rizgar bikin. Pêwîste ji bo azerîyên demokrat, helwestekî me hebe. Tu çi şerî dikî bike, divê sitûna wê ya esasî hebe. Ew jî biratîya gelan e. Ji bo azerîyan dibe, li herêmên rojhilatê Kurdistanê dibe, bi ereban ra, bi farisan ra, gerek e. Wekî gel, kokê me yê dîrokî yek e.

Li rojhilatê Kurdistanê lor hene. Gav bi gav vedigerin li ser nasnameya xwe. Parek ji wan xwe kurd dibînin, parek jî xwe cuda didin nas kirin. Ew ne pirsgirêk e, lê hevparbûna me ya çandî bêtire ku em bi hev ra bi kar bînin û sîstema hevpar ava bikin.

**JÎN (di dema şer da)**

Divê formulekî demokratîk yê redîkal hebe. Ji bo Îranê û gelan. Gelên Îranê hemû yên bindest sempatîya wan ji bo têkoşîna me kurdan heye. Divê mirov bi wê alîyê berçav bigire. Alîyekî din, hevsengî hebe. Li Îranê gelheya azerîyan (nifus) pir zêde ye û şîî ne. Şîî bûna wan bûye sedem ku bibin beşekî mezin ji dewletê. Ne wekî kurdan in. Ji ber ku kurd dervayî sîstemê ne. Bi navê şîîtî yên ku faşîzmê li pêş dixin her tim beşek ji wan bûne berpirs û rayedar, li Kurdistanê. Pareka mezin jî zilim bi destên wan hatîye kirin. Di paşeroja Îranê da tevlîhevî çêbibe, şerê kurdan û azerîyan dê çêbibe. Jixwe di esas da îranî jî vî tiştî dixwazin. Da ku her du jî bi destê hev lewaz bibin. Gelo sîyaseta dewletên derve, parçe kirina Îranê ye? Ez bi xwe ne di wê bawerîyê da me. Îrana mezin, wekî netew, ji bo Îsraîlê lazim e û ji bo Ewropa jî lazim e. Jixwe belav kirina dewletan ne di bala wan da ye. Em li Sûrîyeyê vî tiştî dibînin. Dixwazin dewlet netewan tevlî pergala gilobal bikin. Ji wê jî hinek kurdên me yên kilasîk hene dibêjin: Wê Îran parçe bibe. Heke şer derkeve, dê parçe bibe. Tiştekî wisa û îlanekî wisa nîne. Ji ber vê yekê wê çi bikin? Dê Îranê tenê pê biêşînin yan rejîm wê

qebûl bike yan jî rejîmekî din ku qebûl bike bîne ser desthilatdarîyê. Mutleq edebîyata wan navendî ye. Mînak: Ew çeteyên ku xwe wekî oposîzyona dewleta Sûrîyeyê nîşan didin; ji dewletan faşîsttir in û netewperestîtir in. Oposîzyonê Tirkîyeyê jî wisa ye, ya Îranê jî. Mînak: Niha hinek wek alternatîf kurê şah nîşan didin. Kurê şah jî qet kurdan napejirîne û edebîyata wî jî heman edebîyata bapîrê wî ye. Îranekî girtî, bi yek zimanê farisî, çi tişt dide guhertin, wê çi bê guhertin? Mucahîdên xelq jî wisa ne. Yek ji wan jî pirsgirêkên gelan qebûl nakin.

Eger ew dewletê nû yê teslîm bûye, belkî piştra bi tirkan ra jî li hev bikin. Dîsa careka din, netewperest û şîî, azerî û dewleta navendî hevûdu bigirin, wê êrîşî kurdan nekin? Wê bikin û ew dibetî (îhtîmal) heye.

Qasî Netewa Demokratîk ku xwîşk û biratîya gelan bingeh digire, bi qasî sîstema xweser, ji bo Îranê derman be, belkî ewqas ji bo welatên din ne derman be. Ji ber ku netewên din yên ku farisan dibêjin; em helandine, ew jî dest pê dikin û

behsa netew û nasnameya xwe dikin. Wê demê yan wê her kes dê bi hev ra şer bike û Îran bibe fena dojeh û wê kesek tê da şer qezenc neke û azerîyan bi destekê tirkan welatekî xwe ava bikin. Ew jî jixwe xewn e, nabe. Ji ber ku parçebûn nabe, azerî û kurd wê tenê wekî pirsgirêk bimînin. Hetanî sîstema gilobal wan qebûl neke û ew sîstema xwe ava bikin, êdî wê careka din êrîş di ser wan da dijwartir çêbibe. Ji ber vê jî divê hin tedbîrên sîyasî, leşkerî û civakî li gor wê be. Netewa Demokratîk û Biratîya Gelan û Ziman, formûl û bawerîyeka esasî be, ne tenê bi gotinan be. Ji bo vê yekê ger ev sîstem birêkûpêk bibe di nava hemû gelan da, divê ku gelê me bizanibe rê li pêş komkujîyan tê girtin. Divê ew ji hev nemînin. Heke Netewa Demokratîk pêş nekeve, dê tirk netewperestîyê pêş bixin. Di paşerojê da, ne tenê di navbera me û dewleta Îslamî ya Îranê da pirsgirêk dê çêbin. Her kes dê dev ji Îranê berde. Dewletên ereban, Pakistan, DYA, Îsraîl, tirk û her kes jî di vê alîyê da xetên kilasîk yên kurdan bi rêbertîya KDP xwe daye ber pirojeya tirkan. Çawa niha li Şingalê beşek ji komkujîyan in, li wê derê jî dê wisa bikin. Wê demê divê kurd xeta sêyem û

îradeyeka xweser ji xwe ra bingeh bigirin. Guhertinên ku di cîhanê da dibin, nas bikin. Guhertinên ku li Rojhilata Navîn çêdibin, nas bikin. Hişmendîyeka sîyasî û bîrdozîya fireh lazim e. Nêrînên zanistên civakî pêwîst in. Kurd ger bixwazin paşerojeka azad bi dest bixin û xwe ji komkujîyan rizgar bikin, neçar in ku pêşengtîyê bikin. Ji ber ku yên din xwedî hestên netewperest in. Kurd dikarin bi pirojeyên tevlî kirina gelan, li ser Netewa Demokratîk, nehêlin komkujî çêbibin û gelên din bi xwe ra azad bikin.

**JÎN (di dema şer da)**

# Serhildana Jin Jîyan Azadî

**Destpêk**

Li pişt her bûyereka civakî dîrokek heye. Gelo li pişt serhildan yan jî şoreşa jin jîyan azadî çi heye? Ez dê kurte dîrokekê pêşkeş bikim.

Rêber Evdellah Ocalanî di sala 1973, li Ankarayê dest bi damezirandina komê kir. Komê demekê bi navê "Şoreşgerên Kurdistanê" kar kir. Paşê wekî rêxistin "Yekîtîya Ciwanên Şoreşgerên Kurdistanê" damezirand. Paşê partî yanî PKK sala 1978 ê hat damezirandin. Dema li bajarên Kurdistanê şoreş gur bû, dewletê hewil da ku derbe bike. Di vê demê da biryar hat girtin ku Rêber Ocalan derkeve dervayî sînorên dîyarkirî yên Tirkîyeyê. Rêbertî berê xwe da Kobanê Daku biçe Beyrûtê û amadekarîyan bike ku bi derbeya ku dê çêbibe ra kadroyan amade bike.

Di vê demê da Rêber Ocalanî heval Mihemed Karasungur

erkdar kir ku here rojhilatê Kurdistanê, heman amadekarîyan li wir bike. Ew hewildana yekem ya PKKê ye ku xwestîye li rojhilatê Kurdistanê jî dest bi têkoşînê bike. Bakur û rojhilatê Kurdistanê bigihîne hev, şoreşekî civakparêz û demokratîk û azadîxwaz bi pêş bixîne.

Lê mixabin heval Mihemed Karasungurî, dema ku kar û barê şoreşê dikir, di heman demê da dixwest partîyên kurdan jî li hev bîne û wan ber bi yekîtîya netewî ve kaş bike. Di demeka wisa da ku li kampa Partîya Kominîst ya Îraqê bû, ji hêla YNK ve êrîş hat kirin. Di encamê da heval Mihemed Karasungur tevî hevalekî din şehîd ket.

Paşê li rojhilatê Kurdistanê valahî çê bû. Wekî ku dihat xwestin û dihat pêşbînî kirin, têkoşîn pêş neket. Lê belê PKKê li gorî derfetan qada Îranê û rojhilatê Kurdistanê ji bo şoreşê bikar dianî. Demekî wisa derbas bû, di vê demê da ji rojhilatê Kurdistanê tevlîbûn çê nedibûn. Gel jî Rêber Ocalan û PKK wekî pêwîst nas nedikir, şopandin ji dur ve bû. Dema em nêzikî mîlenyumê dibûn, hêdîka be jî li rojhilatê Kurdistanê liv û

tevger hebû.

Dema ku bêbextîya 15ê sibatê hat kirin, tişta ku tu kes ne li bendê bû, bû. Li rojhilatê Kurdistanê gel rabû serhildanê. Wekî her deverê welat û dervayî welat, ji bo Rêber Apo xwe şewitandin çêbû. Li rojhilatê Kurdistanê jî gel ji bo Rêber Apo bedena xwe da ber agir. Dihat zanîn, lê vê serhildanê peyitand (îspat) ku ka gelê rojhilatê Kurdistanê çiqas welatparêz e.

Rêbertî salên 1990an û şûnda hewil dida ku sitratejî û paradîgmaya PKKê biguherîne. Piştî ku bêbextîyeka dîrokî û nedîtî hat kirin, Rêbertî lez da guhertina sitratejî û veguherîna bîrdozîya partîyê. Li gorî vê pergaleka nû û civakî dihat bipêş xistin. Di encamê da, ji bo her beşekî Kurdistanê ku dibin dagirkerîya dewletekê da ye, têkoşîn, rêxistin û pergaleka gelêrî dihat xwestin.

Li ser van kar û xebatan ji bo rojhilatê Kurdistanê partîyeka ku têkoşînê bike hat damezirandin. Ev partî jî PJAK bû. Kongreya damezirandinê 15ê îlona 2003 hat kirin. Paşê têkoşerên rojhilatê Kurdistanê hêzên leşkerî bi rêk xistin. Her weha

dawîyê jî wekî pergala gel KODAR hat damezirandin. Kar û xebat her hebû û bi berdewamî dihat kirin. Li rojhilatê Kurdistanê dem bi dem şer derdikeve pêş, dem bi dem jî têkoşîna sîyasî tê kirin.

Heke sala 2022, bi rengekî civakî serhildanê dest pê kir, ev serhildan xwe dispêre dîrokeka bi vî rengî. Her kesê ku haya xwe ji vê dîrokê tune ye dibêjin: “Di serhildanê da sîyaset tune ye. Lewra jî serkeftî ye.” Ev kesên weha dinirxînin, haya wan ji civak û sîyasetê tune ye. Lewra jî bi vî rengî dinirxînin. Çi serhildan nîne ku sîyasî nebe. Di heman demê da, pirsgirêkên civakî tim sîyasî ne. Çareserî jî sîyasî çê dibe.

Dîsa gotinek li bazarê ye digere, tê gotin ku: “Partîyên sîyasî di serhildanê da tune ne, lewra gel baştir li ber xwe dide.” Ev jî têgihiştineka şaş e. Ji ber ku PJAK ji sala 2003 ve, têkoşîneka giran dike. Di nav da nebim jî ji nêzik ve dişopînim. Kadroyên xwebexş û xebatkarên xwebexş, karên pir pîroz kirin. Gund bi gund gerîyan, li hemû çîya û banan kar kirin. Xebata gel û ya gerîla wisa bi pêş ket. Di encamê da, hin xwebexş dîl ketin

destê Îranê. Hin ji wan êşkenceyên giran dîtin. Hin ji wan hatin bi dar ve kirin. Hin ji wan hîna jî di zîndanê da ne. Ji binî ve ne rast e ku serhildana Jin Jîyan Azadî ji van bûyer û têkoşînan qut were dest girtin. Ev nezanî û nepolîtîkbûn e, bi navê rewşenbîr û hunermendîtîyê.

Divê bi hurgilî ev jî were zanîn ku rewşenbîr û hunermendên rasteqîne şoreşger û xebatkarên şoreşê ne. Pîvanên rewşenbîrîyê di wan da heye. Yên din kesayetên çîna navîn û çîna burjuwazîya piçûk in. Hestên civakî li gel wan kêm in. Berîya her tiştî jîyana xwe ya takekesî dihizirin, rîsk nagirin. Jîyana xwe qet tu carî naxin xeterîyê. Hinek ji wan jî rewşenbîrtî û hunermendîtîyê ji bo bidest xistina diravan û xweşkirina jîyana kesî rewşenbîrtî û hunermendîtîyê dikin. Divê vê rastîyê gelê me baş bizane. Divê bizanibe ku li Kurdistanê bê partî sîyaset û xwebexşan, pel jî naheje.

Di nav kesên ku xwe zane dihesibînin da gotinek bi salan e digere. Dibêjin: “Dema bîrdozîyan nema ye.” Hizirandineka wisa ji hêla xwedîyên bîrdozîya lîberalîzmê ve hat pêşxistin.

**JÎN (di dema şer da)**

Daku ji wan pê ve kes bîr û bawerî ji bo doza xwe pêş nexe. Lîberal jî karibin bîrdozîya xwe di asta cîhanê da serwer bikin. Dahfikek bi vî awayî pêşîya kesên ku dihizirin hat danîn. Ev ên ku ketine vê dehfikê, her wisa dihizirin ku dema bîrdozîyan bihorîye. Lê ya rast bîrdozî, dozkirina mafên civakî û netewî ye. Ji bo çareserî û pêşxistina civakê ger e. Dema hat gotin: "Dema bîrdozîyan bihorîye." Tê gotin: "Dema têkoşînê bihorî ye, dema çareserkirina pirsgirêkan bihorî ye." Ev jî tê wateya bêtêkoşînîyê. Tê wateya oportunîzmê ku ji bo bîrdozîya lîberalîzmê ji vê hizirandinê baştir hizirandin tune ye ku lîberal xwe tim serwer bikin. Gel û çînên bindest jî tim di bindestîyê da herin.

Em di sedsaleka wisa da ne ku têkoşîn bi temamî girêdayî têkoşîna bîrdozîyê ye. Kî bîrdozîya xwe serwer bike, pêş bixîne, di têkoşînê da jî ew serwer dibe. Lewra wekî ku Rêber Ocalan ji berê da gotîye: "Em çawa bijîn", pir girîng e. Bê guman em dê bi bîrdozîyeka rast û sûderwer bijîn, têbikoşin û wisa jî ser bikevin.

**JÎN (di dema şer da)**

Wekî her gelekî, gelê kurd jî saf û zelal nîne. Di nav kurdan da jî xayin, noker û hevkarên mêtinkar û emperyalîstan hene. Lewra divê em bi baldarî tev bigerin. Yanî em îdeolojîk bin. Ji bo ku ji hêla sîyasî ve neyên xapandin. Dijber û dijminê Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd, hundir û derve jî hene. Her roj û bê navber, sîyasî û îdeolojîk êrîşê me dikin. Ji milekî ve ev asayî ye. Ji ber ku em li hemberî hev sekinîne û rojane têdikoşin. Dijberên şoreşê û taybet dijberên serhildana Jin Jîyan Azadî, hewil didin ku serhildanê ji rê derxin. Heke karibin dê têxin xizmeta xwe. Taybet ji hêla sîyasî ve. Lewra bi şîyarî tevgerandin pir girîng e. Gelek kes, tv, malper û rojname di nava hewildanan da ne ku serhildanê ji bo berjewendîyên xwe bikar bînin. Lewra ew dibêjin: "Têkilîya PKKê bi Îranê ra heye. Têkilîya PJAKê bi Îranê ra heye. PKK alîkarîya gelê rojhilatê Kurdistanê nake û hwd."

Divê were zanîn, çi PKK be çi jî PJAK, têkilîyan bi her rêxistin û dewletan ra datînin. Ev tiştekî asayî ye. Lewra asayîye ku PKK yan jî PJAK bi Îranê ra bide û bistîne. Lê dema ev dan û

sitandin çêdibe, li ser bingeha azadkirin û bidestxistina mafên gelê kurd yê netewî çêdibe. Ev kesên ku dev diavêjin PKKê û PJAKê bixwe di bin ra yan jî aşkera bi Îranê ra lihev dicivin. Di rojeva wan da jî bidestxistina mafên netewa kurd nîne. Ew ji bo kes, malbat û êla xwe têkilîyan datînin. Di ser da jî ji bo PKKê û PJAKê propaganda reş dikin ku gel dûrî van partîyan bikeve. Baş e, heke gel ji van partîyan dûr ket, çi dibe? Erê, tişta ku bibe ev e ku ev kes, partî û kompanî dê têkoşîna gel ji bo perjewendîyên xwe bikar bînin. Yanî gel dê têbikoşe, ev jî dê herin bi dagirkeran ra rûnin, bi bedîla vemirandina rabûna gel, ji dagirkeran sîyasî û aborî destkeftîyan bi dest bixin. Lewra jî lazim e gelê me yê welatparêz û têkoşer şîyar û serwext be. Her kesê ku têdikoşe û bedelan dide, divê karibe sîyasî û bîrdozî jî bihizire û pêşîya xwe bibîne. Daku têkoşîn encamgir û ji bo gel sûdewer be.

**Pêşengtî**

Rêber Evdellah Ocalan dibêje: “Di gorê da bim, dîsa ez dê kar

bikim.” Rêber Apoyî felsefe, bîrdozî, sîyaset û pergaleka wisa bipêş xist ku bi awayekî fîzîkî nemîne jî dê kar bike. Dîsa Rêbertî notên hevdîtinê yên Îmralîyê da dibêje: “Kurd jî bûn xwedî pirtûk. Ev pirtûkên ku min nivîsandin, heta 300 salan besî kurdan in.” Bi taybet Kurdistan û bi giştî jî li rojhilatê Kurdistanê ya dimeşe Rêber Apo ye. Yê ku kurdan radike ser pîyan, bîrdozîya Rêber Apo ye. Yê ku kar dike ne em Rêber Apo ye. Asteka wisa hat pêşxistin. Em wekî gel çiqas serwextî bîrdozîya Rêber Apo bin, ewqas em dê serkeftî bin. Ya ku li rojhilatê Kurdistanê tê kirin jî her ev e.

Rojhilatê Kurdistanê ev bû 25 sal e, ji nêzik ve Rêber Apo dişopîne. Gel keç û kurên xwe şandin nava PKKê. Beşekî vana di şer da şehîd ketin. Beşekî vana birîndar in. Yên mayî li hemû deverên Kurdistanê, her cihê ku pêwîstî hebe têdikoşin. Xwebexş û xebatkarên rojhilatê Kurdistanê ne, li Kurdistanê berbelav in. Li dervayî welat jî kar û barê xwe dikin. Ev jî hêzeka mezin dide gelê rojhilatê Kurdistanê.

KODAR tevî PJAK û YRK û rêxistinên jinan, pêşengtîya vê

serhildanê dikin. Têkoşîna bakurê Kurdistanê û ya rojavayê Kurdistanê jî dibe îlham. Ezmûna li van deveran sûdeka baş dide rojhilatê Kurdistanê. Li rojhilatê Kurdistanê gel rabûye serhildanê. Ne ku gerîla ketîye tevgerê û şer dike. Gerîla piştgir e. Gerîla alîkar e. Gerîla garantor e. Heke pêwîst bû, gerîla dê xwe berde nav serhildanê.

Li rojhilatê Kurdistanê têkoşîn bi xwebexşan tê kirin. Wekî pergal KODAR kar dike. Wekî partîya sîyasî tevî partîyên din PJAK têkoşînê dike. Rêxistinên jinan û ciwanan jî hene. Ku pêşengê serhildanê jin û ciwan in. Dewletên herêmê û dewletên zirhêzên cîhanê jî dixwazin xwe tevlî serhildanê bikin. Ew dê bixwazin serhildanê ber bi xwe ve bikişînin û sûdên sîyasî û aborî bidest bixin. Ji ber ku kaos heye, her hêz dê bixwaze xwe tevlî kaosê bike û sûd jî bigire.

Lê belê ya bingehîn civaka rojhilatê Kurdistanê ye. Divê kurd di nav xwe da, bi hêza xwe ya xwecihî paşeroja xwe dîyar bike. Ji ber ku her guhertin û veguhertina ku di hundir da çêbe, rast û sûdewer e. Heke guhertin û veguhertin bi destê hêzên derve be,

dê serhildan ji rê derkeve û sûda xwe ji bo gel nebe. Jixwe hêzên ku serhildanê dikin, di vî warî da şîyar in. Dê nehêlin ku serhildan ji rê derkeve.

# Rengê çalakîyan

Li rojhilatê Kurdistanê hêrsa gel li hember komara îslamî ya Îranê her hebû. Lewra li Îranê her tim gelê kurd opozîsyon bû. Ev jî diçe heta serhildana Simkoyê Şikakî. Komara Mehabadê jî wisa hat damezirandin. Komele û PDK jî her wisa têkoşîyan.

Li Îranê wekî dewletên din yê Rojhilata Navîn, hilbijartin bi sextekarî tên kirin. Di rastîyê da ti desthilat ser nakeve. Lê wekî tîyatroyekî hilbijartin tê pêşkeşkirin. Ji nav komên serdest, komek dibe desthilat. Her çiqas desthilat were guhertin jî gel her wekî xwe dimîne. Lewra em dibêjin divê pergala konfederal anku xweserîyên demokratîk werin damezirandin û tê da gel xwedî gotin be. Ev hilbijartinên ku çê bûne, kurdan ti carî deng nedaye dewleta îslamî ya Îranê. Bi vî awayî kurdan dewleta îslamî ya Îranê, ya xwe nedîtîye. Jixwe dewleta îslamî

ne ya gelên Îranê ye. Dewlet ya kom û komikên serdestan e. Lewra heke gelê kurd deng nedabe dewletê, ew helwest di cih da ye û rast e.

Sala 1979ê, li Îranê, Humeynî fetvaya cîhadê da. Sine, Mehabad, Şino û li gelek bajaran êdî bû şerê sing bi sing. Ji wê dîrokê heta niha, dewleta îslamî li gel kurdan rewa nebû. Dema Sadiq Xalxalî hat ser desthilatê, bû serokê înqilaba îslamî. Bi hezaran kes bi dar ve kir. Li Îranê bi sedan serhildan heta roja îro çêbûne. Her tim rengê kurdan dîyar bûye. Di hemû serhildanan da kuştin, girtin û birîndarkirin hebû. Bi vî awayî, komara îslamî, hîna di roja damezirandina xwe ve dewleteka zordar û kujera gelan e. Van çend salên dawî, gelek serhildan ser hev û du çêbûn. Lê belê ji ber bîrdozîyeka sûdewer û pêşengtîyeka xwebexş û rast tune bû, serhildanan encam nedigirt.

Li Îranê rêxistina besîc heye ku ji bo rizandin û tepisandina civakê kar dike. Gelek dewlet, tevî rêxistinên wekî artêş, polîs, salox dadimezrînin. Van rêxistinan ji bo bindestgirtina gel bes

nabînin. Lewra jî rêxistinên wekî besîc, cerdevanên gundan, nobedarên taxan û hwd dadimezrînin ku her kêlî û her bostek erd, di bin kontrolê da be. Dîsa ji gel xulam û peyayên bedîlî diravên baş û jîyana cudayî gel peyda dikin. Bi vî awayî kar dikin. Heke gel têgihiştî, perwerdekirî û serwextî rewşa xwe be, dikare dewletê hilweşîne. Ji ber ku dewlet ji komek mirovan pêk tê. Bi pênaseyeka din, dewlet û di navê da desthilatî, ji sedî 10ê civakê ye. Yanî dewlet di rastîyê da tune ye. Dewlet xwe li ser lewaztîyên gel ava dike. Heke gel wekî pêwîst rêxistinkirî be, dewlet ji sedî 10 e û ne ti tişt e.

Li Îranê jî rewş her wisa ye. Dewlet xwe dispêre civaka belawela û ne rêxistinkirî. Bi vî awayî jî xwe li ser gelan ferz dike û dimeşe.

Herî dawî komara îslamî ya Îranê, bi çêkirina komîte anku polîsê exlaq, qaşo kesê ku hîcaba wê nebe digirin. Bi sedan kes bi destê vê komîteyê hatin girtin, hatin êşkence kirin, dest avêtin wan. Hêrsa gel jî her ku çû zêdetir bû. Ya rast, beşek civakê, bi rêxistinkirin û piştgirîya dewletê, li ser beşekî din

zextê dike. Jixwe serkeftina dewletê jî di vê xalê da ye.

Mijara hîcab û polîsên exlaqê, ne mijareka vê sedsalê ye. Ev sedsal sedsala jinê ye ku jin dê her bi çi awayî be, dê azadîya xwe bidest bîne. Lewra dewletên wekî Îran û Îran heke di van qanûn û kiryaran da bi israr bin, dê bi destê xwe dawîya xwe bînin. Ya rast, pêwîst e hîcab neyê ferzkirin. Jixwe jinê bi dilê xwe ti caran hîcab nepejirandîye. Ya din civak hewceyî polîsên exlaqê nîne. Dewlet nikare polîsên exlaqê dîyar bike. Ji ber ku bêexlaqîya mezin ji dewletê tê. Ew dewleta ku bi pergal û kulturê xwe bêexlaq be, nikare exlaqekî civakî şanî civakê bide. Şûna wê tişta ku were kirin ev e: Pêwîst e bi awayekî demokratîk û azadîxwaz civak ji hêla kesên kamil ve werin perwerde kirin. Bi taybet jî zarok û ciwan, pêwîst e di nava pergaleka demokratîk ya perwerdeyê da werin perwerde kirin. Dem vê dixwazê, serdem vê dixwazê. Êdî ev derfetên ku di destê desthilatan da ye jî dê ji dest wan biçe. Heke na civak dê bi darê zorê van desthilatan bide alî. Ev jî tê wateya kaosekî civakî. Heke kom û komikên desthilatîyê di ya xwe da israr

bikin, di dawîyê da rûxandina wan jî dê pir giran be. Dibe ku di pêvajoyeka wisa da ew desthilat nemînin. Lewra çareserkirina pirsgirêkên civakî bi rêbazên sîyasî zêdetir ji bo wan komên desthilatîyê baştir e. Wekî ku pêşîyan gotîye: “Yê zilm bike, dê zilm bibîne.” Heke dewleta îslamî ya Îranê zilma xwe zêde bike, dê bi zilmeka mezintir jî bibîne û birûxe û biçe.

Bûyera Jîna Emînî, dibe ku ji hezaran bûyeran yek be. Lê di xwezaya civakê da, tiştinên wisa hene ku carna çirûskek dibe sersedem û agirek gur jê bilind dibe. Ew kêlî û ew cih dê kûr be, ji berê ve nayê zanîn. Çirûskek bi çi rengî dê pêkeve nayê zanîn. Lê ev çirûsk girîng e. Bi mehan e navê Jîna Emînî li ser lêvên me ne. Jinan û civaka Îranê bi giştî tevî navê Jîna Emînî dirûşmeya jin jîyan azadî jî bilind kirin. Di heman demê da em têgihiştin ku vê carê dê serhildan çawa be.

Bi taybet ji sala 1987ê û şûnda Rêber Ocalanî giranî da pirsgirêkên jinê. Di tevahîya mijaran da cihekî taybet ji bo jinê veqetand. Rêbertîya me rewşa jinê nirxand. Paşê têkilîya jinê bi jîyanê ra danî. Tevahîya dîroka mirovahîyê lêkola. Hat dîtin ku

jin jîyan bixwe ye. Têgiha jîn yan jî jîyan, ji têgiha jinê zêde bûye. Ewqas jin û jîyan di nav hev da ye. Lê ev jina ku jîyan afirand, ne azad e. Yekem netewa ku hatiye bindestkirin e. Lewra jî ji bo jinê û jîyanê azadî divê. Têkilîya jinê bi jîyanê ra hat danîn û têkilîya her duyan jî bi azadîyê ra hat danîn. Bi vî awayî -qasî ku dizanim- diruşmeya Jin Jîyan Azadî ji hêla jinên kurd yên têkoşer ve hat bilind kirin. Ev dirûşme di encama felsefe, bîrdozî û têkoşîna Rêbertî û jinan da derket. Niha li hemû deverên cîhanê tê qêrîn. Bê guman ji bo kurdan ev serbilindî ye ku dîyardeyekî wisa dîyarî mirovahîyê kirin. Lê lazim e pê neyê lîstin û bi awayekî rast were bilêv kirin.

Di vê mijarê da jî têgihiştinên şaş hene. Bi zanebûn yan jî bê zanebûn zirar tê dayîn. Êdî zanebûn be yan jî di encama nezanîyê da be, dirûşmeya Jin Jîyan Azadî şaş girtina dest dijitîya têkoşîna Rêbertî û jina kurd e. Lewra pêwîst e bi baldarî cewhera diruşmeya Jin Jîyan Azadî were parastin.

Jîna Emînî dema hat girtin û paşê bi êşkenceyê hat kuştin. Bi taybet li serê wê, li mejîyê wê dabûn. Hemû dagirker vê yekê

dikin û peyam didin me ku mejîyê me yê azadîxwaz dê biperçiqînin. Lê gel hemû ji nişka ve rabû. Bi hizra ku jin jîyan e û azadîyê dixwaze.

Hêrsa gelê rojhilatê Kurdistanê bi bîrdozîyeka hemdem ra bibû yek. Lewra serkeftî û dirêj e. Ev rabûn ne wekî ya berîya xwe ye. Ji ber ku gelê kurd li gorî şert û şirûtên sedsala 21em tevdigerin. Gelê kurd girîngî dide şoreşa navxweyî. Gel hewil dide xwe perwerde bike. Di encamê da, bi awayekî rast xwe birêxistin bike. Gel dizane, rûxandina dewletekê û şûna wê damezirandina dewleta din, pirsgirêkên azadîya civakî çareser nabin. Li gorî vê têgihiştinê, gel rabû ser pîyan û dest bi çalakîyan kir. Kolan bi kolan, tax bi tax, bajar bi bajar, gel xwe birêxistin kir. Bi vî awayî bi mehan e, dikare çalakîyan bike û dike.

Ez vê jî bêjim, daku kêm nemîne: Parastina rewa mafê her kes, kom û gel e. Mafekî xwezayî ye. Li ser vê hişmendîyê gel hatiye perwerde kirin. Lewra tişta ku artêşek nikarî bike, gelê rojhilatê Kurdistanê kir û dike. Hêz di teknolojîya şer û artêşên

dewletan da nîne. Hêz di civakê bixwe da ye. Bila civak tenê serwext be û karibe pêşîya xwe bibîne.

Gelê rojhilatê Kurdistanê li hember polîsên exlaq û li hember rêxistina besîc sekinî. Çalakîyên hatine gel hev kirin. Sazî û dezgehên dijî civakê ne, bûn armanca çalakgeran. Polîsên exlaq û besîcî, bûn armanca çalakgeran. Di kolan û meydanên bajar û bajarokan da, gel bera besîcî û polîsên exlaqê dan. Hin ji wan hatin kuştin. Hin ji wan kuştîyan jî payebilind bûn. Ciwanan di kolanan da kumê molayan firandin. Ev jî çalakîyeka balkêş bû ku di nava têkoşînê da hat afirandin. Heke jin û ciwan bi vî rengî rabin, çalakîyên cihêreng jî dikin.

Serhildan veguherî şoreşê. Ev şoreş jî bi rengê sedsala 21em e. Guhertin û veguhertina hiş û hişmendî bi bingeh digire. Lewra jî girîng e ku em baş binirxînin. Bi taybet di sedsala 20em da hat dîtin ku şoreş ne rûxandina dewlet û şûna wê damezirandina dewleteka din e. Yan jî netewek xwe rizgar bike û ax û welatê xwe bi sînorên dîyarkirî dîyar bike. Şoreş di mejî û kesayet da tê kirin. Pergala dewletê û sînorên dîyarkirî yên

netew dewletekê, tim dibin sersedema şeran û hev qirkirina gelan.

Gelê rojhilatê kurdistanê, di dema serhildanê da, xwe gihand rewanekî netewî. Gel xwedî li hev derdikeve. Birîndarên xwe derman dike. Bijîşk jî bi karê xwe yê civakî radibin û birînên birîndaran dipêçin. Gel wek hev dihizire û parîyek nanê tisî jî hebe ji hev û du ra parve dike. Rakirina şehîdan û çilrojîya şehîdan bi girseyî tê kirin. Kulturekî şoreşgerî bipêş dikeve. Stran û awazên serhildanê tên gotin. Nîgarkêş wêneyan wisa xêz dikin ku her yek ji wan qasî pirtûkekê hînker e. Bi vî awayî ev dem û serdem dibe dem û serdemeka nû û ya şoreşê.

Di vê mijarê da, baldarîyek jî pêwîst e. Di asta cîhanê da, kulturê kapîtalîst zal e. Hemû kultur û rê û resmê civakî dike armanc û ji holê radike. Vê bi tor û hesabên medyaya civakî, bi reklaman, bi televîzyonê, bi sînema dike. Ev kulturekî pir vekirî, sist û şehitî ye.

Kulturê ku ji sala 1979ê ve tê pêşxistin jî heye. Ev kultur di bingeh da, dijî kulturê pergala şah bû ku ew xwedî kulturê

burjuwazî bû, lê ji rê hat derxistin û îslamîzmeka çeloxwar hat pêşxistin. Heke perwerde û baldarî nebe, dîsa kulturê şah yanî kulturê lîberalîzmê dê xwe ferz bike. Ya rast û girîng ne kultur û jîyana lîberalîzmê yan jî kultur û jîyana komara îslamî ya Îranê ye. Pêwîst e gel, tevî hemû kom û komikên civakî, li hev bişêwirin û xwe bi xwe rêya xwe ya kulturî dîyar bikin. Ji derve ve anîn û jiberkirin dê şaşitîyên nû bi xwe ra bîne. Pêwîst e jîyan û kultura me xwe bispêre dîroka me. Xwe pispêre kulturê me yê resen. Lê bi awayekî hemdem nûjen bike û ava bike. Di vî kulturî da xweparastin, azadîya jin û ciwanan, demokrasî, jîngeh esas e. Ev jî têkoşîneka zehmet e û sebrê dixwaze. Ji ber ku guhertina civakê bi awayekî rast û pêşketî zehmet e. Tevî gel û kulturên din yên tevahîya Îranê, kurd dikarin ji vî milî ve jî pêşeng bin. Kurd dikarin kulturekî berxwedanê ava bikin. Da ku careka din gelên îranê bindestîya ti desthilatîyê nejîn. Ev derfet heye. Bawerî bi gelê kurd û gelên Îranê jî heye ku bibin mînak.

**JÎN (di dema şer da)**

**Tevger û hewildanên gelên din. Belûc, azerî, ereb, fars, kaspîyen (gîlekî)**

Ji bo vê mijarê, di serî da vê bêjim: Pêwîstîya me bi belgeyên kurmancîyê heye. Bi taybet di derbarê Îranê da. Di navê da jî gelên ku li Îrana îro dijîn. Wê demê em dê baştir karibin serwextî rewşê bibin.

Li Îrana îro gelek netew di nav hev da û li kêleka hev dijîn. Heke gel bixwe rêvebirîya xwe saz bikin, dê bi awayekî li hev û wekhev bijîn. Lê tê zanîn, netew ji hêla desthilatan ve tên jahrîkirin û tên qirkirin. Gelek berê xwe dide gelekî din û şer derdikevin. Di encamê da netewên ku hene lewaz dikevin û desthilat bihêz dibin. Êdî dem hatiye ku ev çarenûs were guhertin. Serhildana ku çêdibe jî dê vê çarenûsê biguhere.

Li Îranê gelê Belûçê heye ku di navbera sê dewletan da hatiye dabeşkirin. Belûçî wekî nijad Aryen in û li gorî hin dîroknasan jî kurd in. Beşekî mezin yê belûçîyan li Pakistanê dijîn. Beşê duyem yê herî mezin jî li Efxanistanê dijîn. Li Îranê jî 5 milyon

belûçî hene. Rabihorîya kurdan û belûçîyan hema bêje mîna hev e. Di vê serhildanê da jî belûçîyan mil da kurdan û netewên din yên ku li Îrana îroj dijîn.

Qasî em dişopînin, pirsgirêka hişmendîyê li gel belûçîyan heye. Piranî bi referansa dînê îslamê tev digerin. Bi bandorkirina jinên kurdan yên têkoşer, di nav belûçîyan da jî liv û tevger heye û jinên Belûçê derdikevin pêş. Ji bo ku gelê belûç jî bigihîje mafên xwe yê netewî pêwîstî bi têkoşîneka xurt ku xwe dispêre civakê heye.

Belûçî hem çalakîyên girseyî dikin hem jî çalakîyên leşkerî. Heke belûçî zimanê serdemê hîn bibin û li gorî vê têbikoşîn, teqez dê mafên xwe yên netewî bidest bînin.

Azerî hem xwedî dewlet in hem jî li Îrana îro netew in. Li ser azerîyan lîstokên komara îslamî û yên Tirkîyeyê hene ku dixwazin wan ber bi faşîzmê ve bikişînin û bikar bînin. Lê belê di azerîyan da jî potansîyeleka demokratîk ya xurt heye. Wan jî xwe tevlî serhildanê kirin û dan nîşandan ku ji bo azadî û demokrasîyê hêmanekî xurt in. Heke hêzên demokratîk

yekîtîya xwe xurt bikin, azerî dê ji bo guhertin û veguhertina Îranê, risteka girîng bigirin ser xwe.

Fars her çiqas desthilat bin jî gel ji desthilatîyê ne razî ye. Van mehên dawîn girseyên li Tahranê dijîn xwe ji têkoşîna azadî û demokrasîyê nedan paş. Bi taybet jinên ciwan û xwendekaran gelek çalakî kirin. Rasterast berê xwe dan desthilatîyê û Humeynî. Daxwaza mirina desthilatan kirin. Desthilatî kirin armanc ku biruxînin. Li nav û dervayî zanîngehan, xwendekaran xwe bi rêxistin kirin û çalakî kirin. Çi li ser textê reş, çi jî li ser kartonan, daxwazên xwe xêz kirin û bûn xwedî helwest.

Îrana kevnar warê bav û kalên me ye. Em wekî gelên Aryen paşeroja xwe digerin. Dema em vê yekê dikin, em berê xwe didin rabihorîya xwe. Dîroka me dirêj e. Kulturê me zengîn e. Çima em dê nikaribin li ser dîrok û kulturê xwe, xwe ji nû ve saz bikin?

## JÎN (di dema şer da)

### Hiş û destwerdanên dewletê

Dema bûyer qewimî, Dewletê gelek hewil da ku serê vê bûyerê binixumîne, lê serkeftî nebû. Piştî israra malbatê, termê Jîna anîn bajarê wê ku Seqiz e. Jixwe li vî bajarî jî ji dayîk bûbû. Dewletê gelek astengî derxist. Lê belê gel bi şanazî xwedî li Jîna Emînî derket. 147 roj e (16.09.2022 heta 10.02.2023) li rojhilatê kurdistanê û bi giştî Îranê bê navber serhildan didome.

Komara îslamî ya Îranê, wekî her car, vê carê jî dest bi destwerdanê kir. Bi taybet besîc û polîsê exlaqê xistin nava tevgerê. Carna bi cilên fermî, carna jî nixumandî, van hêzan berê xwe dan gel. Li kolanan, pêşîya çavên her kesî dest bi êşkence û girtinan kirin. Ew wekî ku tevî desthilat û zordaran bi hev ra û bi awayekî komî digerîyan. Di destê wan da çek û amûrên êşkenceyê hene. Di vê derbarê da bi sedan çêdibe bi hezaran vîdyo hatin weşandin. Dinya alem tev li van vîdyoyan meyzand. Lê belê gel jî tirsa ku heye şikandibû. Lewra cih bi cih li ber xwe didan.

**JÎN (di dema şer da)**

Dewleta îslamî ya Îranê, di nava civakê da, pergala sîxurtîyê pir bi pêş xistîye. Di dema serhildanê da, ev sîxur jî ketin nava tevgerê. Lewra her kesê ku sîxurtîyê dike, bû armanca serhildêran. Bi vî awayî derb bi pergala sîxurtîyê jî ket. Hin ji wan ji alîyê gel ve hatin cezakirin.

Dewletê bi hejmarekî zêde kes girtin û avêtin zîndanê. Êşkence hem li kolanan hem jî li zindanan heye. Hin bajar û tax, demkî be jî ketin destê serhildêran. Bi vî awayî dewleta îslamî bi yek carî hat tune kirin. Şerê barîkatan ku rêbazekî şer ya kevnare ye, dihat kirin. Heta niha jî dewletê rasterast hêzên leşkerî ji bo destwerdanê bikar neanîye. Lê divê were zanîn ku gel jî hêzên xwe yên leşkerî bikar neanîye. Ji ber ku serhildan bi temamî civakî ye. Xwe dispêre mafdarbûna gel. Pêdepêde heke têkoşîn were xurtkirin, dê teqez encamên xwe jî hebe.

Bijîjkên dildar, di vê serhildanê da, bar hildan ser milên xwe. Hinek ji wan hatin girtin û hatin şehîdkirin. Bi vî awayî, hema bêje hemû beşên civakê, di serhildanê da cih girtin û bedel jî dan.

**JÎN (di dema şer da)**

Hunermend, lîstikvanê sînema, lîstikvanê gogê her yek bi awayekî, di serhildanê da cih girtin. Yan rasterast di serhildanê da cih girtin yan jî nerasterast piştgirî dan serhildanê. Ev jî nîşaneya civakîbûna serhildanê ye. Lewra dewleta îslamî ya Îranê, neçare ku daxwazên gel bipejirîne û xwe bi awayekî cidî ji nû ve saz bike. Heke na civak dê xwe bi xwe xwe bi rê ve bibe û pirsgirêkên xwe çareser bike. Heke wisa jî bû, ew civak dê dewletê wekî dewleteka rewa nebîne.

Hin kesên ku tevlî serhildanê bûne, li ber çavên alemê hatin bidarve kirin. Jixwe bidarvekirin, li Îranê qanûnî ye. Lê ev qanûn û ev rêbaz, di serdema me da, dibe rêbazê hirç û hovan. Dibe sedema tirajedî û xembarîyan. Divê di vê serhildanê da, tişta ku were kirin, ji wan tiştan yek jî rakirina cezaya bidarve kirinê be.

Dewletê di dema serhildanê da, înternet qut kir. Bi vê yekê xwest ku serhildêr ji hev agahdar nebin. Qaşo bi vî rêbazî dê pêşîya xwerêxistinkirina civakê bigire. Lê belê ev jî ji bo dewletê bêsûd e. Teknîk bipêş ketiye û gelek rê û rêbez hene ku

serhildêr xwe digihînin ragidandinê. Xwe digihînin raya giştî ya cîhanê. Teknîk bipêş ketiye û êdî pêşî lê nayê girtin. Teknîk heke bi awayekî rast were bikaranîn, di demokratîkbûna gelan da roleka demokratîk digerîne.

Dewleta îslamî ya îranê, anku dewleta mollayan hatiye durêyanê. Ji van her du rêyan yekî dê hilbijêre. Heke rêya zilim û zordarîyê bipejirîne, dê di zilma xwe da here û tune bibe. Heke di rêya demokrasî û naskirina mafên gelan da here, dê karibe pêşîya rûxandineka mezin bigire. Gelên ku li Îranê dijîn jî dê nefesê bi asanî bidin û bistînin. Êdî ev jî maye li ser dewletê û di navê da desthilatî. Dewlet bêçare ye ku tiştekî bike. Lê belê gelên Îranê ne bêçare ne. Dikarin doza xwe bilindtir bikin û ser bikevin.

## Daneyên serhildanê

Daneyên serhildanê 16.09.2022 heta 10ê sibatê 2023ê.

Divê were zanîn, derfetekî wisa nîne ku daneyên ji sedî sed werin zanîn. Lê daneyên ku tên dayîn ne zêde lê dibe ku kêmtir

bin. Dane bi giştî kêmtir yan zêdetir tên zanîn. Dane jî girîng in ku bi awayekî rast werin zanîn. Lewra di tax û bajaran da serhildêr pêwîst e girîngî bidin komkirina dane û amaran. Çêdibe hinek birîndar bûbin û ji bo aşkera nebin birîndarîya xwe veşartibin.

Dane û amar wisa ne.

- 19 hezar û 763 kes hatine girtin.
- 528 kes hatine kuştin.

Gelek kesan ji ber tirsa rejîmê negotine ku mirovên wan jîyana xwe ji dest dane.

- 4 kes hatine bidarve kirin.

## Encam

Li kurdistanê û dervayî welat yê ku kar dike Rêber Apo ye. Yê ku kar dide kirin Rêber Apo ye. Rêbertî bi hişmendî û bîr û bawerîya ku saz kiriye, kar dike. Bi sedan partî û rêxistin hene. Vana rojane têdikoşin. Bi milyonan xwebexş û xebatkar hene,

bîst û çar saet ji bo gelê kurd kar dikin. Di cewher da azadîya gelê kurd tê bingeh girtin. Di giştî da jî azadîya mirovahîyê tê bingeh girtin. Dewleteka netewekê di nav sînorên dîyarkirî da, bingeh nayê girtin. Bi vê hişmendîyê sedsala 19em û 20em ji dest gelan çûn. Carekî din ev şaşitî dê neyê kirin. Çi dibe bila bibe azadîya civakî armanca sereke ye. Civaka azad û rêxistinkirî dê sedsala 21em bike sedsala gelan.

Bi taybet rojhilatê Kurdistanê û bi giştî li Îranê, serdemeka nû dest pê kir. Guherîn û veguherîneka cidî heye. Ji ber ku civakî ye. Lihevkirina civakî û bi hev ra bûyin girîng e. Heke civak dûrî dewlet û desthilatdarîyê be, dikare pirsgirêkan hemûyan çareser bike.

Ji bo şoreşeka wisa divê keda gel hebe. Mal bi mal, tax bi tax, divê gel xwe birêxistin bike. Sîyaseteka civakî bike. Parastina xwe bi awayekî bi pergal saz bike. Aborîya xwe bike aborîyeka civakî. Pergala perwerdeyê bi pêş bixîne. Her kesê ku dilsoz e, dest biavêje karekî, dawîya dawî jî dê şahîya gelan be.

Têkoşîna vê sedsalê civakî ye. Wekî berê tenê bi zora gerîla

yan jî artêşa gel, ti gel nikare xwe rizgar û azad bike. Lewra girîngîdana azadî, demokrasî, ekolojî û azadîya jinê pir girîng e.

Em di serdemeka teknolojîyê da dijîn. Înformasyon berbelav e. Bi komunîkasyonê agahî pir zû tên belavkirin. Lê em ji bîra nekin ku têkoşîna vê serdemê, têkoşîneka bîrdozîyan e. Divê em hayîdarê xwe bin. Îdeolojîk, polîtîk û exlaqî bin. Înformasyonên ku ne ji bo berjewendîya gelê me bin, divê em guh nedinê. Ji ber ku bîrdozîya, sîyaset û têkoşîna me heye. Bi serkeftinên rojane jî xwe peyitandîye (îspat kirîye). Heke wisa here û kurd kêmasîyên sitratejîk nekin, ev sedsal teqez ya kurdan e. Serkeftinên vê sedsalê jî di sedsalên pêşîya me da ne, ji bo me gelê kurd misoger bike.

## Serhildana Başûrê Kurdistanê di 1991ê da

Li alîyê Ranya û Keladizê du herêm hene. Ranya û derûdora vê ra tê gotin herêma Bitwên. Keladizê û derûdora wê ra tê gotin, Piştder. Girêdayî Ranya navçeyeka bi navê Hecîawa heye.

**JÎN (di dema şer da)**

Fîşeka yekem li Hecîawa hatîye teqandin. Paşê li başûrê Kurdistanê serhildana gel dest pê kir.

Divê em baş bi bîra xwe bixin ku dema serhildana başûrê Kurdistanê dest pê kir, pêşmergeyên YNK û PDK ne li başûrê Kurdistanê bûn. Gel bixwe û jixweber dest bi şer kir û di 05.03.1991ê da Ranya hat rizgarkirin.

Dema ku dewleta Îraqê ket şer û bi bin ket, li başûrê Kurdistanê serhildana gel bêyî ku pêşmerge hebin dest pê kir. Herêma ku serhildan lê dest pê kir, herêmeka bi temamî kurd bûn. Hemû niştecihên xwe resen kurd in. Welatparêzîya wan xurt e. Hîna di dema osmanîyan da herêm her tim bi şer re rû bi rû bûye. Mîrek û êlên kurdan radestî împaratorîya osmanîyan nebûne. Her tim xwestine xwesertîya xwe biparêzin. Li herêma Piştder û Bitwên kulturê kurdî zindî ye. Gelê ku li van herêman dijîyan girêdayî Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd e. Di rewşên herî zehmet da jî xwe gihandine hewara Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd. Civakekî wisa bi kok û resen in. Li dijî dagirkerîya Sedam rabûn û dest bi serhildanê kirin.

**JÎN (di dema şer da)**

Gelê resen yê Piştder û Bitwên li hember dagirkerîya Îraqê bi hêrs bûn. Dema ku derfetek piçûk bi dest wan diket, gel serî radikir û dida dû leşkerên îraqî, bi wan ra şer dikirin û sazî û dezgehên dewletê desteser dikirin. Dema ku qewimî jixwe leşkerên îraqî jî dest bi revê kirin. Lewra pir kuştin û birîndar kirina leşkeran çê nebû. Pêngava gel wisa dest pê kir û herî dawî jî li Kerkûkê bi dawî bû.

Ji hêla din ve herêmên çîyayî yên Zaxo hene. Di van herêman da rêvebir û gerîlayên PKKê lê bûn. Herêma Heftanîn û Metîna, herêmên gerîla ne. PKKê di dema serhildana başûrê Kurdistanê da, pêvajoya kongreya çarem dijîya. Amadekarî dihatin kirin ku li bakurê Kurdistanê dest bi şerekî astbilind bike. Dema ku serhildana başûrê Kurdistanê dest pê kir, PKKê bi lez dest li rewşê werda.

Tevî hin kesayet û gelê başûrê Kurdistanê, gerîlayên PKKê, di serî da Sedkar rizgar kirin ku girêdayî Zaxo ye. Ev pêngava rizgar kirinê gihişte Duhokê. Lê pirsgirêkek hebû ku ev jî; hejmara gerîlayan têra vê yekê nedikir. Jixwe gerîlayan ji bo

şerê bakurê Kurdistanê xwe amade kiribûn û derbasî bakurê Kurdistanê dibûn. Heta ku li Qada Rojhilata Navîn an ku Qada Rêber Apo gerîla û têkoşer hatin, êdî dereng bû. Lê dîsa jî tiştên pêwîst hatibûn kirin.

Di vê mijarê da vegotin û şîroveya pêşengê Tevgera Azadîyê ya Gelê kurd Cemîl Bayik (Heval Cuma) girîng û bi nirx e. Ew dibêje: “Dema ku me dest bi rizgar kirina başûrê Kurdistanê kir, tu hêzên pêşmerge li herêmê tune bûn. Dema ku NATO û Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA) dît ku bandora PKKê li ser başûrê Kurdistanê çêdibe, pêşmergeyên YNK û KDP ji rojhilatê Kurdistanê anîn, da ku pêşîya pêşketina PKKê bigirin.” Dîsa Cemîl Bayik dibêje: “Dijî PKKê, YNK û KDP anîn gel hevûdu. Ji wan ra parlamento damezirandin. Bi şertê ku li dijî PKKê şer bikin. Qada hewayî girtin ku her du partîyên başûrê Kurdistanê werin parastin. Hêzek leşkerî jî anîn û li herêmê bi cih kirin. Vana tev ji bo pêşî lê girtina şoreşa PKKê bû.”

Ji şîroveya Heval Cuma em tê digihijin ku li başûrê Kurdistanê

pêşîya têkoşîna gel bi YNK û KDP hatîye girtin. Hêzên hegemon tevî Tirkîyeyê vîna gel şikandin. Çarenûsa gelê başûrê Kurdistanê xistin destê wan her du partîyan. Divê ji bo ŞGŞ ev rastî baş were dîtin. Ji ber ku di sala 1992ê da YNK û KDP tevî Tirkîyeyê şerê PKKê kirin. Heta niha jî bi taybet KDP li gorî berjewendîyên hêzên hegemon, NATO û Tirkîyeyê tev digere. Êdî wisa lê hatîye ku qasî dewleta faşîst ya tirkan KDP jî pêşîya azadîya kurdan asteng e. Heta ev astengî ranebe, kurd nikarin ŞGŞ bi serkeftî ser bixin. Piştî serhildana başûrê Kurdistanê, ji sala 1991ê û şûnda, bi salan partîyên sîyasî yên xwedî bîrdozîyeka curbicur, yên başûrê Kurdistanê şerê hev kirin. Bêyî ku tu sedem hebe. Şerekî ji bo bi dest xistina desthilatdarîyê hat kirin. Di encamê da du partî serkeftî bûn. Ji vana yek YNK û ya din jî PDK ye. Ji vî şerî ra şerê birakujîyê jî tê gotin. Şerekî bê wate bû. Feraseta kuştina hev hat asayîkirin. Êlan cih guhertin. Hin êl ji herêma zer ya PDK derbasî herêma kesk ya YNK bûn. Hin êl jî ji herêma kesk ya YNK derbasî herêma zer ya PDK bûn. Koçberîyeka nedîtî bi destê partîyên kurdî hat kirin. Ev şerekî navxweyî ku di

navbera PDK û YNK da bû, şerê birakujîyê ye. Çi sûdeka xwe ji bo gel tune bû. Jixwe ev gelê ku serhildan rakiribû ne di nav vî şerî da bû.

Bi vî awayî partîyên kurdî ji xeta gel û civakê dur ketin. Her çiqas serkeftin li Kerkûkê hatibe ragihandin jî gel xwe ji sîyaset û kiryarên kirêt yên hin partîyan dûr girt. Di rewşa niha da ku kêm maye çaryeka sedsalê biqede, desthilatîya başûrê Kurdistanê ketîye destê xayin û nokeran. Ev kesên ku destpêkê qêrîyan û gule bera sîngê dijmin dan û ev kesên ku niha başûrê Kurdistanê bi rê ve dibin pir dûrî hev in. Lewra pêdivî pê heye ku li başûrê Kurdistanê, di pêşengtîya Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd (TAGK) da, şoreşekî hişmendî û bîrdozîyê bê kirin. Ev jî bê guman e ku dê gelê başûrê Kurdistanê bike.

## Şoreşa Rojavayê Kurdistanê

Parçeyek ji parçeyên Kurdistanê şoreşekî mezin ser xist. Bi berxwedanîya xwe bû rojavayê Kurdistanê. Rojava parçeyê herî piçûk yê Kurdistanê ye, lê belê şoreşekî wisa kir ku di asta

cîhanê da deng veda. Gelo, di bingeha vê şoreşê da çi heye?

Di serdema osmanîyan da, rojavayê Kurdistanê, di nava sînorên osmanîyan da bû. Piranî jî beg û axa hebûn di herêm û bajarên wê da. Dema ku şerê cîhanê yê yekem dest pê kir û împaratorîya osmanîyan rûxîya, rewşa rojavayê Kurdistanê jî guherî. Rojavayê Kurdistanê tevî gelên Sûrîyeyê ket bin destê Firansa. Li Efrînê heta Dêrika Hemko, kurdan serî ji dagirkerîya Firansa ra netewand. Di heman demê da rojavayê Kurdistanê li hember serhildanên bakurê Kurdistanê û başûrê Kurdistanê hestyar bû. Xwe tevlî serhildanê van deveran dikir. Li hember dagirkerîya Firansa jî piştî demekî û şûnda serî rakir. Serî rakirin her çiqas herêmî be jî serî rakirin e. Rewşenbîr û têkoşerên bakurê Kurdistanê jî dema ku nedikarîn li bakurê Kurdistanê bimînin, wekî bijarteyekî pêşîya wan rojavayê Kurdistanê hebû. Berê xwe didan rojavayê Kurdistanê û lê cih dibûn.

Damezirandin û têkoşîna Xoybûnê jî hêjayî gotinê ye ku qala wê bê kirin. Xoybûn wekî rêxistina têkoşînê, di dîroka rojavayê

**JÎN (di dema şer da)**

Kurdistanê da xwedî cihekî taybet e. Di demeka nazik da li Sûrîyeyê û Libnanê xebat kirîye. Ji bo doza kurdî têkoşîyaye. Ji bo çanda kurdî karên rewşenbîrî kirîye. Ji bo kurmancîyê kar hatîye kirin û berhem hatine derxistin. Karê dîplomatîk jî kêmek hatîye kirin.

Kurdan di desthilatdarîya Sûrîyeyê da jî cih girtine. Serokkomartî ji komarê ra kirine. Lê belê di nava pergala dewletê da ji bo kurdîtîyê tiştek nehatîye kirin. Jixwe bi demê ra Komara Sûrîyeyê wekî Komara Ereban hatîye bi nav kirin. Bi vî awayî qet rengê kurdî di komarê da dîyar nebûye. Sala 1960î û şûnda kurd yekcar tune hatine hesibandin. Bi sed hezaran kurd bê nasname mane. Van kurdan ne dikarîn bixwînin ne jî dikarîn bibin xwedî sermaye. Tevî vê kembera ereban li ser wan hatîye sepandin. Ji bo pişaftina kurdan kar hatîye kirin. Li gel pişaftinê xwe pişaftin pêş ketîye. Bi vî awayî di navbera dewlet û kurdan da nexweşî derketine pêş.

Bi hatina Rêber Apo ra rewş gav bi gav hatîye guhertin. Di destpêkê da ji bo şoreşa bakurê Kurdistanê piştgirî hatîye

wergirtin. Ciwanên kedkar û xwendekar tevlî PKKê bûne. Pêdepêde bi awayekî ne yekser di nava kurdan da rêxistinên PKKê hatine damezirandin. Peyva dost ji vê demê maye. Ji bo ku rêxistin û xebatkar nebin armanca dewletê hatîye bikaranîn. Rêber Apo qasî bîst salan li Sûrîyeyê û rojavayê Kurdistanê karên şoreşê dikir. Bi yekser û ne yekser tim Rêbertî li rojavayê Kurdistanê û li Sûrîyeyê sergêrî dikir. Rêbertî rojavayê Kurdistanê wekî qadeka perwerde kirina kadroyan bikar anî. Birîndarên şer li vir hatin derman kirin. Beşek ji van birîndaran vedigerîyan qadên cur bi cur û têdikoşîyan. Rêbertî piçûk mezin gelê rojavayê Kurdistanê jî perwerde dikir. Rêbertî rêbazeka wisa saz kir ku kadro gel perwerde dikir û gel jî kadro perwerde dikir. Rêbertî û kadroyên pêşeng yên PKKê gel gihand astekî baş. Kadroyên kevin û nû dema di nav gel da kar dikirin, hem hêz didan gel hem jî ji gel hêz digirtin. Êdî rastîyeka wisa derket holê ku tu hêzan nedikarî bandora Rêbertî li rojavayê Kurdistanê kêm bike. Hin partîyên qaşo kurd jî dixwestin bend li pêşîya PKKê deynin, lê xwesteka wan di gewrîya wan da ma.

**JÎN (di dema şer da)**

Dema ku sala 2011-12 li Sûrîyeyê alozî gur bû, jixwe kurd ji berê da amade bûn ku li ser lingên xwe bisekinin. Wekî bîr û wekî hiş Şerê Gel Yê Şoreşgerî li gel kurdan hebû. Bi hêsanî dikare were gotin ku li Sûrîyeyê dema alozî derket, pêxirtengî kûr bû. Ji her gelî zêdetir gelê kurd amade bû ku dest li rewşê werde. Wisa jî piştî amadekarîyan di 19ê Tîrmehê da li Kobanîyê şoreş dest pê kir û gav bi gav rojavayê Kurdistanê hemû hat rizgarkirin. Tişta ku tu kes ne li bendê bû bi pêş ket. Li rojavayê Kurdistanê şoreş hat kirin ku ev şoreş yekser yê gel bû.

## PKK û ŞGŞ

PKKê di Kurdistanê da rêbazeka din ya şer ceribandîye û ser xistîye. Ev ceribandin jî xwe dispêre kesayeta Rêber Apo. Rêbertî tevî gelek serpêhatîyên xwe qala du serpêhatîyên xwe jî dike ku girêdayî mijarê ne. Rêbertî, di gund da, ji êla dijber hevalek ji xwe ra çêdike. Heval Hemze (Hesen Bîndal) dibe hevalê Rêbertîyê yê dozê. Heval Hemze heta ku şehîd ket, tim li gel Rêbertî bû. Doza wî şopand û di rêça wî da meşîya.

**JÎN (di dema şer da)**

Bingeha netewîbûnê jî wisa hat danîn. Vê ferasetê hêzeka baş da gelê kurd.

Serpêhatîyeka din ya Rêbertî jî ev e ku: Rêbertî wekî her zarokekî gund şer nake. Tevî ku dêya Rêbertî jê dixwaze jî lê ew şerê kilasîk yê kurdî nake. Çi dike? Bi pîlan tev digere. Mîna gerîlayekî pîlan datîne û Cimoyê ku ji Rêbertî bi hêztir e jî bin dixîne û Cimo careka din xwe têkelî Rêbertî nake.

Di pevçûn û şerên Rêbertîyê da serkeftin heye. Serhildanên kurdan yên sedsalên dawî ne serkeftî ne. Wan serhildanan em gihandin van rojan an ku nehiştin ku em ji holê rabin. Tevî ku leheng û şerkerên baş bûn, ser nediketin. Ew serhildan, dîrok û pîrozîyên me ne, lê pêwîste werin dahurandin ku careka din gelê kurd bi bin nekeve. Tişta ku Rêber Apo kirîye jî ev e. Serkeftin bingeha têkoşîna Rêbertî ye. Rêbertî an ku PKKê cudabûnek xist navbera xwe û serhildanên kilasîk yên kurdan. Lewra jî tim serkeftî ye. Tevî ku hêzên cîhanê êrîş dikin, PKK her tim pêşîya xwe vedike. PKKê lehengîya kurdan ya dîrokî û ezmûnên serkeftî yên cîhanê gihand hev. Dîroka kurdî û zanista

şer di nav hev da hunand. Lewra ji bindestîya dûrûdirêj ya kurdan ra bû bersiv. Niha nalenala dagirker û hemû nokerên wan e. Tola sedan salan wisa tê hildan. Her serhildaneka kurdî ku bi darvekirin, komkujî, êşkence û penaberîyê bi dawî dibû, lê di xwe da hêvî jî dihewand ku ev hêvî jî ev bû ku; rojek ji rojan nevîyê wan serhildêran dê rabin û tola wan hilînin. Tişta ku Rêbertî û PKKê kir ev e. Ji ber vê çendê girîng e, dîrokî ye, bersiva hêvîyên dapîr û bapîran e.

Formûle kirina rewş û dîyardeyan girîng e, lê jê girîngtir jî pêkanîn e. Rêbertî şerê gelê kurd formûle kir. PKKê jî xiste merîyetê. Bi vî awayî gelê kurd xwe gihand asta şerê şoreşgerî. Lê pêwîst e were zanîn ku gelê kurd bi qonaxan ra derbas bû û asteka baş girt. Hîlvan û Sêwregê şer hat kirin. Di sala 1989ê û şûnda bi rengekî din şer hat kirin. Ji salên 2000î û şûnda lêgerîna ji bo şerekî baştir û pêşketîtir hebû. Qonaxek heta sala 2010ê heye. Jê û şûnda jî şer bi awayekî baştir û serwexttir tê kirin. Şerê Gel Yê Şoreşgerî ku qala vî tê kirin, xwedî dîrokeka wisa ye.

## Destwerdana NATOyê (Giladyo). Giladyoya NATO û ya Tirk (JÎTEM, Hîzbulkontra). Giladyoya NATOyê û PDK-JÎTEM

Divê were zanîn, têkoşîneka cîhanî were kirin, dijber jî dê asta cîhanê da hebin. Heke miletek di asta xwe da têbikoşe, nabe xwedî dijminên cîhanî. Dibe ku di asta cîhanê da ji dewletan piştgirî jî bigire. PKK partîyeka resen ya kurdî ye. Rizgarkirin, azadkirin û demokratîk kirina gelê kurd kirîye armanc, lê her ku kurdan rizgar, azad û demokratîk dike, taybet li Rojhilata Navîn bi giştî gelên cîhanê jî azad û demokratîktir dike. Du hêlên PKKê yên binyatî hene, yek netewî ye ya din jî enternasyonal e. Ji hêzên cîhanî yên şoreşger hêz digire û hêz dide. Piştî rûxandina sosyalîzma pêkhatî pêşengtî jî ma li ser milê Rêbertî û PKKê. Lewra pergala sermayedar Rêber Apo û PKKê dikin armanc. Dixwazin Rêbertîyê bê bandor bikin. PKKê jî yan lewaz bikin yan jî ji holê rakin. Ez dê bi heşt xalan vê rewşê binirxînim.

*I.* Li gorî ku heval Cuma (Cemîl Bayik) vediguhezîne,

konsulxaneya DYA rapor amade dike ku di tê da hatîye nivîsîn: Li Tirkîyeyê partî û rêxistinên kurdan û tirkan hene. Yekê vana jî ji bo berjewendîyên me ne tirsnak in. Lê girûpek heye ku wekî Apoyî tên nasîn, ji bo berjewendîyên DYA tirsnak in. Pêwîste pêşî li wan were girtin.

Dema ku li Îranê şoreşa îslamî tê kirin, konsulxaneya DYA jî tê dagirkirin. Paşê belgeyên konsulxaneya DYA tên weşandin. Ev rapora ku mijara gotinê ye di nav wan belgeyan da hatîye belav kirin û PKK wisa ji vê raporê agahdar bûye. Berîya ku PKK wek partîyeka fermî were damezirandin û were ragihandin; bûye armanca DYA. Sedemên vê armanc kirinê jî jîyanî û hizrî ne ku Apoyî -di dema komê da- ji têkoşerên din pir cuda ne. Rastgo û şoreşgerên rasteqîne ne. Zu bi gel ra dibin yek û rayê xwe di nav gelê xwe da berdidin

*II.* Li sala 1985ê Pêngava 15ê Tebaxê bi serkeftî hat avêtin. Heta vê gavê Tirkîye û NATO li bendê bûn ku PKKê yan qels bikin yan jî bi temamî ji holê rakin. Lê dîtin ku di şer da asteka nû hat pêşxistin Tirkîye û NATO ket nava hewildanan. Li gorî şîrove û dahurandinên PKKê, NATOyê civîn best û biryar da

ku dijî PKKê têbikoşe. Her wiha Almanya ji bo di merîyetê da kar bike hat erkdar kirin.

28ê sibata 1986ê Olof Palme, serokê Siwêdê di encama reşkujîyê da jîyana xwe ji dest da. Ev reşkujî xistin sitûyê PKKê. Dest pê kirin û PKK wekî partîyeka terorist dan nîşandan. Bi vî awayî zemîn xweş kirin ku bi ser PKKê da herin.

*III.* Tirkîye ji dema komê ve her hewil da ku Rêbertî ji holê rake. Ji ber serokên serhildanên kurdan bi dar ve kirin yan jî kuştina wan serhildan jî bi dawî dikirin. Ji van be heke Rêbertî ji holê were rakirin, serhildana kurdan dê têk biçe.

*IV.* Ji dema komê û pê ve Tirkîye û NATOyê her tim hewil da ku di nav PKKê da tasfîyekarî bi pêş bixe. Dixwestin bi rêya tasfîyekaran yan PKKê bikar bînin yan jî dawî lê bînin. Di serî da Rêbertî, PKKê tim dijî tasfîyekaran û tasfîyekarî têkoşîyaye. Hewildanên Tirkîye û NATOyê tim serkeftî nebûne. PKK bi têkoşîna xwe ya bêhempa tim pêşîya ŞGŞ vekirîye.

*V.* Şeşê gulana 1996ê li Şamê, li ber Dibistana Navendî ya PKKê teqemenîyek yek tonî hat teqandin. Hat xwestin ku di roja dar

ve kirina Denîz Gezmîş û hevalên wî da, Rêbertîyê ji holê rakin. Lê belê tiştek bi Rêbertî nehat.

Kontra û Giladyoya li nav Tirkîyeyê ev çalakî pîlan kiribûn. Bi ji holê rakirina Rêbertîyê dê êrîşekî berfireh li ser gerîla jî bihata kirin. Ji ber ku hewildanên ji holê rakirina Rêbertîyê bê encam ma, li ser gerîla jî operasyon nekirin.

*VI.* Piştî rûxandina sosyalîzma pêkhatî -taybet li Rojhilata Navîn- Rêbertî û PKK wek astengîyek dihat dîtin. Lewra hêzên cîhanî, di serî da DYA dest bi ji holê rakirina Rêbertî û PKKê kirin. Di encamê da, sala 1998ê komplo dijî Rêbertî hat pêşxistin. Di dawîyê da jî Rêbertî dîl ket destê hêzên NATO. Ji vê komployê armanc ev bû ku dawî li ŞGŞ bînin û di navbera kurd û tirkan da rê li ber şerekî vekin ku sed sal bidome.

*VII.* Li girava zilmê, girava Îmralîyê dawî bi lîstokan nayê. Jixwe girtîgeha Îmralîyê ne qanûna dewletan ne jî qanûna gerdûnî derbas nabe. Ji bo Rêber Apo, rewşeka taybet hatîye afirandin. Piranî jî rêbazên ne merdane û dij mirovî tên bikaranîn. Dewletê piştî ku nedikarî Rêbertî bi dar ve bike, nedikarî wî bê bandor bike, îcar serî li rêbazên ne merdane da. Di sala 2007î

da hewil dan ku bi boyax kirina jûra Rêbertî, wî jehrî bikin. Wisa lê bikin ku her kes pê bawer bike ku Rêbertî bi awayekî asayî jîyana xwe ji dest daye. Tadîlat kirina jûra Rêbertî pîlanekî pir qirêj e. Ji ber ku kîmya xistibûn dîwaran ku Rêbertî bi demê ra, jîyana xwe ji dest bide.

Pîlanekî wisa pisporane, heke destê giladyo tê da nebe, kesinên din newêrin karekî wisa bikin. Ev kar jî bi destê kesinên faşîst hatîye kirin. Jixwe dîroka osmanîyan û Komara Tirkîye dagirtîye bi komployên wisa.

Lîstoka ku hatibû amade kirin, dîsa ji alîyê Rêbertî ve hat dîtin. Di destpêkê da Rêbertî qala rewşa xwe û tenduristîya xwe dikir. Taybet piştî ku tadîlat di jûra wî da hat kirin. Di encamê da mûyên porê Rêbertî gihiştin derve û li Ewropa di laboratuwarê da li wan mûyan hat meyzandin. Paşê hat dîtin ku Rêbertî tê jehrî kirin. Bi hestyarîya Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd û hestyarîya gelê kurd, ew hewildan bi ser neket.

Ev hovîtîya nedîtî jî dide nîşandan ku di dewletan da hêzên tarî hene û karên pir kirêt dikin. Li hember serokên şoreşan û pêşengên şoreşan nayê zanîn ku çiqas karên wisa kirêt hatine

kirin. Dewlet her dem di nava xwe da jî karên tasfîye kirin û ji holê rakirinan dike. Bi taybet jehrî kirina serokkomarê Tirkîye Turgut Ozal, kuştina Bahtîyar Aydin û kuştina Eşref Bîtlîsê fermandarê cendirmeyan (dayîkbûn Meletî 1933, mirin 17 sibat 1993 Ankara) dide nîşandan ku bi giştî dewlet û bi taybet Tirkîye xwedî karên kirêt û tarî ne. Lewra pêwîste ev rûyê tarî yên dewletan baş were nas kirin. Her şoreşger, rewşenbîr û demokrat pêwîste van rastîyan bizanin. Da ku karibin di têkoşîna xwe da serkeftî bin. Hekena dewleta kûr wan bikar tîne, bê ku haya wan jê hebe.

*VIII.* Di hin şoreşan da rêber hene. Di hin şoreşan da jî serok hene. Rista rêber û serokan ji hev cuda ye. Di Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd da rêber heye. Tevî rêber û serokan pêşeng an ku kadroyên pêşeng hene. Her pêkhateya dijber di serî da rêber, serok û pêşengan dikin armanc ku şoreşê bê serî an ku bê mejî bihêlin. Heke ser ketin, bedeneka bê serî dimîne û dibe maşikê destê pêkhateyên dijber. Ew bi awayekî xwe dixin şûna rêber, serok û pêşengan. Bi vî rengî vîna gel teslîm digirin û bi dilê xwe pê dilîzin. Her şoreşê ku bi ser neketibe, ji sedeman yek jî

ev e.

Lewra divê kadro, xebatkar û gel, di vê mijarê da bi baldarî û bi şîyarî tev bigerin. Şîîyên ku her sal di dema bibîranîna Hesen û Hiseyn da, bi êşkenceyekî ecêb xwe di nav xwînê da dihêlin jî lazime wisa werin fam kirin. Serokê xwe ji dest dan û man bê serî. Lewra gel lazime bizanibe xwedî li rêber û serokan derkeve. Di vî warî da Komara Tirkîye gelek hewil dide ku pêşengên Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd yan ji holê rake yan jî dîl bigire. Lê kadroyên Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd şîyar in. Di heman demê da gelê kurd jî şîyar e û bi hestyarî tev digere. Hêzên xwedî pergala sermayedar jî xwedî heman ferasetê ne. Jixwe di asta cîhanê da jî mînakên vî hene. Li Perûyê di sala 1993ê da serokê Partîya Rêya Ronî tevî hin endamên navendî destgîr kirin. Pêdepêde partî lewaz bû û tevgera gerîla qels bû. Heman tiştî -piştî ku Rêbertî jî dîl girtin- xwestin bînin serê Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd.

Di derbarê pêşengan da piropagandaya reş kirinê bê navber tê kirin. Bi van hewildanan dixwazin bandora ku pêşeng li gel dikin, kêm û qels bikin. Heke serkeftî bin, piştî dîl girtina

**JÎN (di dema şer da)**

Rêber Apo Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd dê lewaz bibe. Dê bibe parîyek ku hêzên tarî daqutînin.

Di demekî da ku li bakurrojhilatê Sûrîyeyê qaşo hêzên hevpeyman alîkarîya kurdan dikin. 06ê çirîya paşîn 2018ê DYA biryarek derxist. Di vê biryarê da tê gotin ku her kesê ku cih yan jî nasnameya Cemîl Bayik, Duran Kalkan, Mirad Karayilan aşkera bike; dê ji bo Cemîl Bayik 4 mîlyon, Duran Kalkan 3 mîlyon û Mirad Karayilan 5 mîlyon dolaran xelat bidin. Ev biryar xwedî hin taybetmendîyan e. Ji vê biryarê armanc ev e ku dibe ku hin kes bixwazibin vê biryarê pêk bînin. Biryar xwedî taybetmendîyeka sîyasî ye. Ji bo terorîze kirinê biryar hatîye dayîn. Ev kesayetên ku hem ji bo gelê kurd hem jî ji bo mirovahîyê xizmeta mezin kirine û dikin; dixwazin bi biryarên bi vî rengî wan piçûk bixin. Lê raya giştî û gel şîyar e. Êdî tê zanîn ku heke dijberê şoreşê van pêşengan dikin armanc, rêya me rast e û serkeftî ye. Pêşeng karê xwe dikin û bi Rêber Apo ra ne. Lewra zêdetir girêdan bi van pêşengan çê dibe. Ez dikarim bibêjim ku: Çeka ku ev neyar dijî me bikar tînin, li wan vedigere û li wan dikeve. Di Tevgera Azadîyê ya

**JÎN (di dema şer da)**

Gelê Kurd da rastîyek jî heye ku hêjayî gotinê ye; her kadro, gerîla yan jî pêşeng dema şehîd dikeve jî rista xwe dilîze. Şehadet, Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd bi hêztir û tekuztir dike. Hêzên kûr, tarî, giladîyo yan jî kontrgerîla; çi dikin bila bikin, berê me li serkeftinê ye.

Pergala sermayedar an ku kapîtalîst, ji bo karibe xwe li ser lingan bigire, di nava hewildanan da ye. Ji sedsala 19em ve pergala sermayedar berjêr diçe. Ji bo ku nerûxe rêbazên taybet bikar tîne. Taybet di milê hizrî, şer û aborîyê da kar dike. Ragihandin û tora înternetê jî dixe xizmeta xwe. Hest û hewesên mirovan araste dike. Kulturê gelan dirizîne. Sincê civakî qels dike. Bêwijdanîyê pêş dixîne. Civakan birçî dike, da ku karibe wan hewceyî xwe bike û paşê jî bikar bîne.

Piştî şerê cîhanê yê duyem, pergal zêdetir bi rêkûpêk kar dike. Navenda van karan jî Pentagona DYA ye. Li wir kadro tên gihandin. Zext li ser gelan tê kirin. Bêhn li gelan tê çikandin. Giladyoya ku em qal dikin jî navenda xwe Pentagon e. Nayê zanîn ji tirkan û kurdan çiqas kes di vê navendê da hatine gihandin û tên bikar anîn. Di vî warî da, mixabin belgeyên

berdest nînin. Lewra em piratîkan dimeyzînin, şîrove dikin û digihijin encaman.

Li gorî vê, ji Tirkîye kesinên tarî hatine perwerde kirin. Di qada saloxî, şer, sîyasî, aborî û hwd da kadroyên giladyoyê kar dikin. Li hember Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd karên kirêt hatine kirin. Ji van ya herî zêde tê zanîn jî JÎTEM e. JÎTEM rêxistineka leşkerî û veşartî bû, lê paşê aşkera bû. Êşkence, kuştin, revandin, sîxur peyda kirin û gelek karên pir kirêt bi destê JÎTEMê hatin kirin. Salên 1990an û şûnda di nav kurdan da Hîzbullah hat pêşxistin. Ji ber kiryarên Hîzbullahê kurd navekî din lê kirin û gotin: Hîzbul Kontra. Hîzbullahê karên wisa dikir û dike ku hişê mirovan hilnagire. Ev pêkhate van salên dawî wekî partîyeka sîyasî xwe ji nû ve rêxistin kirîye. Navê partîya wan jî HUDA PAR e. Bi dehan salan e, giladyoya DYA, Tirkîye û kurdên kontra bi hev ra karên kirêt dikin. Li hember van jî tekane çare heye ku ew jî bilind kirina têkoşîna civakî, li hember wan hêzan e. Pêwîste hêzên cewher tevî gel li hember van rêxistinên tarî xwedî têkoşîneka xurt û tund bin.

**JÎN (di dema şer da)**

Tevî DYA û NATO li Tirkîye giladyo li ser kar e. Her karê ku li Tirkîye tê kirin, di heman demê da, li başûrê Kurdistanê jî tê kirin. Endamên rêxistina giladyo an ku JÎTEMê cihê xwe di nava hêzên PDK da girtin. Gelek kiryarên wan yê kirêt hene, lê ya esasî şerê xiyanetê ya sala 1992 ye. Tirkîye tevî KDP û YNK êrîşî gerîlayên PKKê kirin. Ji wê û şûnda -bi taybet KDP- hin hêz û kesayetên başûrê Kurdistanê dijî PKKê tên bikaranîn. KDP wekî giladyoya nav kurdan kar dike. Ne tenê dijî PKKê, her hêz yan jî rêxistinek welatparêz û kurdperwer be, KDP dijî wan e û dijî wan aşkera yan jî veşartî şer dike. Serok û kadroyên şoreşger şehîd dixîne. Ji vê piratîkê jî em dizanin ku KDP di cewher da partîyeka giladyo ye. Ji partîyeka wisa lome nabe. Hemû kurdên dijî dagirkerîyê ne, pêwîste dijî KDP jî xwedî helwest û têkoşînê bin. Gelê kurd tevî hêzên sîyasî û leşkerî neçar in dawîya dawî dijî KDP şerekî xurt bikin. Ji ber ev partî êdî bixwaze jî nikare were ser xeta welatparêzîyê. Ev partî heta ku karî dê tim xencerê ji pişt ve gelê kurd bide. Di

serî da heta niha, KDP li hember şoreşa rojavayê Kurdistanê jî xwedî sekneka dijminane ye. Dest diavêje kû derê, li wir xiyanetê pêş dixîne.

## Ezmûna Yekem, Cûrnêreş (Hîlvan)

Divê were zanîn ku pêwîste nav mala kurdan paqij be. Heke wisa nebe kurd her çiqas li hember dagirkeran şerekî serkeftî bikin jî dê derb ji hundir ve bixwin. Rêber Apo hîna di destpêkê da vê rastîyê dizane. Lewra jî PKKê şerê destpêkê li hember xayin, noker û bendeyên dewletê kirîye. Heta niha jî hêrsa tevkarên dewletê li hember PKKê ji dewletê zêdetir e. Sedema xwe jî şerê destpêkê yê li hember wan e. Heke hinek kesên xwe kurd bi nav dikin, lê li hember PKKê bi dijwarî têdikoşin, sedema xwe ev rastî ye. PKK ji wan ra qada jîyana bi dewletê ra nahêle. PKK dibêje nebin evîndarên kujerên xwe. Loma jî ji PKKê aciz in. Ji dagirkeran zêdetir hewil didin ku PKKê ji holê rakin.

Di ŞGŞyê da du ezmûnên destpêkê hene ku girîng in. Ji vana

yek şerê parastina cewher ya Cûrnêreş e, ya duyem jî şerê Sêwregê ye. Şerê Cûrnêreş di dema xwe da deng veda. Li ser Rêbertî û Cûrnêreş sitran hatin sitrandin. Sitrana Apo Hate Hîlvanê bi nav û deng e. Vê berxwedanê bi xwe ra kultur û hunereka şoreşgerî jî anî. Lê ev parastina cewher çawa hat kirin?

Di salên 1973-4-5 li Ankara, di zanîngehan da têkoşîneka bîrdozî û hizrî hat kirin. Paşê Şoreşgerên Kurdistanê derbasî bajaran bûn. Bi taybet jî hin bajarên kurdan. Rêbertî kete rê, li hin bajarên Kurdistanê gerîya û lêkolîn kir. Ji bo şoreşê amadekarî bi pêş xist. Di bajar û gundan da komîte hatin damezirandin. Cûrnêreş jî ji van deveran yek e. Di van salan da, di piranîya bajar û bajarokan da, dewletê bendeyên xwe saz kiribû. Vîna gel bi erdê ra kiribûn yek. Kî navbera xwe û dewletê xweş kiriba, dibû şirîkê dewletê. Dewletê jî êdî rasterast ne bi xwe, lê bi destê bendeyên xwe karê xwe dikir. Pişaftin, tune hesibandin, xwe tirk dîtin, hewildana ji bo bûyîna tirkekî baş; bi destê kurdên noker dihatin pêşxistin. Tebeqeya

jor a kurdan ku serokêl, şêx û karsaz in, bi karê dewletê radibûn. Êdî ne dewlet ev tebeqeya jor zilim li gelê kurd dikir. Lewra gelê welatparêz tu caran ev tebeqeya jor nepejirandîye. Heke PKKê destpêkê berê xwe dabe noker, xayin û bendeyan; sedema xwe ev e.

Li Cûrnêreş û Sêwregê Şehîd Mihemed Karasungur û hejmarek kadro bi perspektîf û talîmatên Rêber Apo bi kar û barên şoreşê radibin. Astek tê girtin. Di salvegera şehîd kirina Şehîd Hakî Karer da -ku 18ê gulana 1977ê li Dîlokê hatibû şehîd kirin- afîş û pûl li kolan û dîwaran tên zeliqandin. Belavoka ku Rêbertî nivîsandibû tê belav kirin. Di bajarokê da, Xelîl Çavgun ku ji van karan ra pêşengtîyê dike û pêşengê ciwanên Cûrnêreş e, di dibistanekê da ciwanan dicivîne. Noker û dijmin pê dihesin ku civandinek heye. Tê ber derîyê dibistanê. Şehîd Xelîl Çavgun ciwanan ji derîyê piştê yê dibistanê derdixe. Paşê bi xwe diçe û derî vedike. Li ber derî gule tê reşandin û Xelîl Çavgun şehîd dikeve. Bê ku dem derbas bibe, bersiv tê dayîn û çeteyên êla silêmanan tên kuştin. Hinek ji wan birîndar dibin. Birîndaran

radikin nexweşxaneya Ruha yê. Hîna ku nû birîndar gihiştine ber derî, gule li wan tê reşandin û ew jî li wir tên kuştin. Bi vî awayî -tevî gel- têkoşînek tê dayîn. 27ê teşrîna paşîn êla silêmanan xwe radest dike. Xwe ji serokatîya şaredarîyê vedikişîne. Paşê hilbijartin çêdibe û serokşaredarekî nû tê hilbijartin. Têkoşîna PKKê digihije encamekî wisa.

Ev bû hêvîyeka mezin ji bo kedkar, karker û gundîyan. Di vê demê da, komên hevalan, li gundan û li bajarokê di nav gel da ne. Gel hem wekî kadro hem jî wekî dilxwaz û têkoşer tevlî pêvajoyê dibe. Ev serkeftina destpêkê ya Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd e. Destpêka Şerê Gel Yê Şoreşgerî ye.

## Ezmûna Duyem, Sêwreg

Li Sêwregê heman têkoşîna wekî Cûrnêreş hat kirin. Lê ast û naveroka xwe cuda ye. Ji ber ku li Sêwregê damezirandina PKKê hat ragihandin. Bi vê ra çalakî li ser Mihemed Celal Bucak hat kirin. Her çiqas ezmûneka PKKê wekî dihat xiwestin nebe jî gavên dîrokî hatin avêtin. Gelê kurd jî di

bajarokê da cara destpêkê li hember çîna serdest û dewletê kete nava şer. Gerîlatî dihat pêş xistin. Hesap ji noker û dagirkeran bi rêbazên nû dihat pirsîn. Kadroyên pêşeng wekî Salih Kandal û Cuma Tak jîyana xwe ji dest dan, lê asta têkoşînê bilindtir bû.

Di nava rojê da kadroyên PKKê ketin nava Sêwregê. Dest danîn ser bajarokê. Belavoka damezirandina PKKê hat belav kirin. Di gund û bajaran da -tevî gel- serî hat rakirin. Di dawîyê da dewlet neçar ma ku li Tirkîyeyê di 16 bajaran da rewşa awarte ragihîne. Dewlet, ji ber tirsa ji şoreşê, 12ê îlona 1982ê derba leşkerî kir. Wisa ŞGŞ ket qonaxeka nû.

## Nisêbîn, 1990

Dewlet û hin partîyên kurdî gelekî hewil dan ku PKK nekeve Mêrdîn, Botan û Hekarîyê. Kadroyên PKKê şehîd xistin. Dîyar e dijmin û partîyên bi ser dijmin ve dizanîn ku PKK û gelê Mêrdîn, Botan û Hekarî bigihijin hev, dê şoreş bi ser bikeve. Dijmin û partîyên kurdî rasterast û aşkera dixwestin pêşîya PKKê bigirin. Di nav PKKê da jî tasfîyekaran, bi awayekî

nerasterast dixwestin çûna PKKê ji bo Mêrdîn, Botan û Hekarîyê rawestînin. Di vê qada şerê bîrdozî, derûnî û çekdarî da -di serî da Rêbertî- PKKê têkoşîn kir. Tevî hemû astengî û pêşîlêgirtinan, PKKê ne tenê çend bajar û çîyayan, belavî Kurdistanê hemû bû. Di vê serkeftinê da ked û têkoşîna Rêber Evdellah Ocalan bê hempa ye. Di rêza duyem da şehîd tên. Endamên Komîteya Navendî ya PKKê jî tê da, di van salan da, bi sedan kadroyên PKKê şehîd ketin. Bi vî awayî têkoşîneka giran hat dayîn. PKKê karî xwe berde nîveka Kurdistanê. PKKê karî xwe têxe dilê gelê xwe. Rêbertî gerîlayên wisa gihandin ku heta fîşeka dawî şer dikirin û digihiştin şehadetê. Bê guman e ku her gerîla yan jî kadroyên ku şehîd diketin, keç û kurê gelê kurd bûn. Gelê kurd jî dida ser rêça şehîdên xwe. Di van salan da, feraseta êlparêz û herêmparêz hat şikandin. Hestên netewî bilind bûn. Lewra şehîd ji kîjan bajar yan herêmê ba, gel wekî zarokê xwe lê xwedî derdiket. Ev jî şoreşekî hişmendîyê ye.

Di van salan da, kadroyên PKKê diketin bajaran. Hin cihan bi

çek hin cihan jî bê çek bûn. Hin cihan çalakî dikirin, lê hin cihan jî tenê karê rêxistinî dikirin. Ji wan ra cephecî dihat gotin. Gel perwerde dikirin. Bi rêxistin dikirin. Ew kesên ku karê rêxistinê dikirin ra jî dihat gotin cephecî yan jî milîs. Cephecitî yan jî milîstî karekî girîng bû. Bi taybet milîsan çalakîyên leşkerî jî dikirin. Carna tevî gerîla tevlî çalakîyan dibûn. Ji gerîlayan ra salox dianîn. Xayin û noker ceza dikirin. Ji nav gel dirav didan hev. Her kesê ku bixwesta tevlî nava refê gerîla bibe, ew digihandin gerîlayan. Pêwîstîyên gerîla bi cih dianîn. Ji ber van karan û karên dîtir tê dîtin ku cephecitî û milîstî girîng e.

Di nava Nisêbînî da ev kar û bar hatin kirin. Li çîyayan jî şerê gerîla her ku diçû bilindtir dibû. Yekîtî û tevkarîya gerîla û gel bi vî awayî bû. Êdî wisa lê hat, gerîla ji bo gel xwe feda dikir. Di nav gel da jî cephecî û milîsan ji bo gerîla fedakarîyên mezin dikirin. Heke bihata xwestin cephecî û milîsan ji bo gel û gerîla canê xwe jî didan.

Li çîya 14 gerîla şehîd ketin. Şehadeta van 14 şehîdan pêşî li

têkoşîneka nû vekir. 13ê adara 1990î gel li cenazeyê gerîlayan xwedî derket. Ji bo hildana şehîdan gel rabû. Şehîd bi serhildanekî mezin sipartin axê. Ji vê û şûnda gav bi gav serhildan belavî bajar, bajarok û gundan bû. Şoreşa netewîbûnê wisa dest pê kir. Jin herikîn nava gerîla. Jîyana civakî ya jinan guherî. Ciwan ji zexta dewlet û malbatê rizgar bûn. Lewra ji piçûkan bigire heta mezinan her kes tevlî karwanê şoreşê bû.

## Cizîra Botanê, Amed, Şirnex

## Cizîra Botanê

Ji Cizîra Botanê ra bajarê evînê jî tê gotin. Di destana Mem û Zînê da karakterê berxwedêr, mîrekê korfam û feodal, xayin Beko heye. Destan wekî kurteya dîroka gelê kurd e. Di gelê kurd da serî netewandin taybetmendîyeka dîrokî ye. Lê mîr û çîna serdest piranî yan korfam in yan jî nokerê dagirkeran in. Di dîroka kurdan da xiyanet jî xetek e. Bingehê xwe yê dîrokî heye. Wekî serhildana herî dawî ya kurdan, Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd jî ji destê xiyanetê derb xwarîye. Hîna jî dagirker

xwe dispêrin xiyaneta nav kurdan û bi ser gelê kurd da tên. Di şoreşa PKKê da tê xwestin ku rastîya kurdî ya dîrokî were guhertin. Êdî xiyanet bi bin bikeve. Çîna serdest jî ya xwe biguherîne yan jî were bêbandor kirin.

Di dîroka Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd da rê li gel vekirin heye. Êdî paşeroja kurdan ne çîna serdest û xayin, gel bi xwe dîyar dike. Ev jî destkeftîyek dîrokî ye. Ji bo kurdan giranbuha ye.

Di dîroka Cizîra Botanê da Bêrîvan kesayeteka girîng e. Pêşnav Bêrîvan, nav û paşnav Binewş Agal, kesayeteka ji gel e. Ji gundekî Qubîna Êlihê ye. Ji gund diçe Almanya. Alîgirên PKKê dinase. Tevlî meş û civînan dibe. Tê li Akademîya Mehsûm Korkmaz perwerde dibîne. Li rojavayê Kurdistanê kar dike. Li Botanê hem li çîyayan hem jî li bajaran kar dike. Cizîra Botanê jî yek ji wan cihan e ku Bêrîvanê lê xebat kirîye. Bêrîvanê bandoreka erênî li ser gelê rojavayê Kurdistanê kirîye. Heman bandor li ser gelê Cizîra Botanê jî kirîye. Pêşengeka wisa ya gelê kurd, dema ku şehîd jî bikeve, dê bi

şehadeta xwe jî ji bo gel û şoreşê sudewer be.

Şehîd Bêrîvan li nava bajar, di encama kemîn danîna dijmin da 19ê kanûna paşîn 1989ê birîndar dibe. Bi êşkenceyên xidar ra rû bi rû dimîne. Di dawîyê da, bi gule berdanê tê şehîd kirin.

Dema ku Bêrîvan şehîd ket, gelê Cizîra Botanê rabû ser pîyan û xwedî li pêşenga xwe derket. Bi vê xwedî derketinê gelê kurd tirsa ji dijmin şikand. Dîtin ku mirov dikare li hember dijmin rabe, birîndar bibe, şehîd jî bikeve. Di pêşengtîya gerîla da, gelê Cizîra Botan bû xwedîyê vîn û wêrekî yê.

## Amed

Amed ji ber dîroka xwe wekî paytexta Kurdistanê tê zanîn. Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd Amedê wekî navend girîng dibîne. Xebatê destpêkê yê PKKê li Amedê jî hatîye kirin. Divê were zanîn ku Rêber Apo salên 1969-1970yan li Amedê wekî karmendê tapu kadastro kar kirîye. Gelê kurd ji nêzik ve dinase. Bi doza kurdî ra têkildar dibe. PKK jî li Amedê hatîye damezirandin. Lewra bi têkoşîna Tevgera Azadîyê ya Gelê

**JÎN (di dema şer da)**

Kurd, dîroka Amedê watedartir bûye. Amed wekî navenda sîyasî ya Kurdistanê ye. Her tim li hember serhildanên kurdî hestyar bûye. Xwe ji tevlîbûnên serhildanan jî nedaye paş.

Gelê Amedê ji destpêkê ve tevlî PKKê bûye. Gelek kadro daye PKKê û hîna jî dide. Dema ku di Kurdistanê da gerîlatî bi pêş ket, gelê Amedê xwe jê neda paş. Bi hezaran keç û xortên amedî tevlî gerîla bûn û dibin.

Dema ku li bakurê Kurdistanê û li Tirkîyeyê partîya kurdan HEP hate damezirandin, amedîyan tê da cihê xwe girtin. Dest bi sîyaseta legal kirin. Ev xebat heta niha bi rêbazên cur bi cur tê kirin.

07ê tîrmehê 1991ê serokê HEPê ya Amedê hat revandin. Kontrayên tirk êşkenceyekî giran lê kirin û ew şehîd kirin.

Birayekî Vedat Aydin ku pêşnavê xwe Vedat danî bû, piştî ku li gel Rêber Apo perwerde dît, çû eyaleta Xerzanê û li wir şehîd ket.

**JÎN (di dema şer da)**

***Vedat Aydin*** [2] *: Sala 1953ê, li gundê Hecîya Kurdan yê girêdayî Bismilê ye ji dayîk bû. Di nava ÎHD û HEPê da cih girt. Serokê HEPê yê bajarê Amedê bû. 05ê tîrmehê ya sala 1991ê polîsan Vedat Aydin ji mala wî birin û piştî vê bi 2 rojan li Madenê kuştî hate dîtin. Di 10ê tîrmeha sala 1991ê da bi hezaran mirovên ku li ber derîyê avahîya HEPê ya Amedê kom bûn, berê xwe dan Madenê û ketin rê.*

*Bi hezaren kesên ku di wesayîtan da cih nedîtin. Ji bo merasîma cenazeyî çûn ber Mizgefta Sûmerê. Kesên ku gihiştine Madenê ji 10 hezarî zêdetir bûn. Hemûyan erebeyên xwe bi pûşîyên kesk, sor û zer xemilandibûn. Karkeran kar berda, jin ji malê derketin û esnafan dikan girtin û tevli cenazeyê bûn. Jin, zarok, keçên ciwan kal û pîr jî bi dirûşmeyan konvoy pêşwazî kirin û bi hezaran erebe ketin nava Amedê. Wê rojê li Amedê jîyan sekinî bû. Di dîroka Amedê da cara yekem bû ku ewqas leşker jî kom bûbûn. Konvoy di Ofîsê*

[2] *Ji malpera Bernamegeh | KURDÎ hatîye jiber kirin.

*ra derbas bû. Rê ji alîyê polîsan ve hatibûn girtin. Ji bo ku gel û konvoy negihije hev, serê kûçeyan hatibûn girtin. Ofîs bi girse û erebeyan hatibû dagirtin. Ên ji erebeyan peya dibûn berê xwe didan rêya Mizgefta Sûmerê. Piştî ku 10 hezar mirovan nimêja cenazeyî kirin, ber bi Derîyê Mêrdînê ve bi rê ketin.*

Erê, Vedatê Aydinî di girtîgeh û dadgehan da jî doza azadîyê dikir. Heval û hogirên wî hîna jî qala jîyan û têkoşîna wî dikin. Ew serokekî xwezayî û demokrat yê gelê xwe bû. Di nava gel da çalak bû. Dema ku kesî nediwêrî xwedî li cenazeyên gerîlayan derkevin, Vedatê Aydinî xwe diavêt pêş û cenazeyên gerîlayan radikir. Heke bi vî rengî pêşengên xwezayî û demokrat hebin, gel jî dê rabe serhildanê û dijmin bi bin bixe.

Dema ku hat bihîstin ku Vedatê Aydinî bi êşkence hatîye şehîd kirin, gelê Amedê bi deh hezaran rabû û xwedî lê derket. Ji Amedê heta navçeya Madenê her der bû serhildan. Dijminê êşkencekar vî carî li hember gel tundî bikar anî. Di vê serhildanê da zêdetirî bîst kesan jîyana xwe ji dest dan.

**JÎN (di dema şer da)**

Birîndar hebûn. Dijmin desteser kirina serhildêran jî xwe neda paş. Vedatê Aydinî bi kesayeta xwe ya têgihiştî û têkoşîna xwe cihê xwe di dîroka gelê kurd da girt. Gelê kurd jî xwedî pêşengê xwe derket.

Di vê serpêhatîyê da jî tê dîtin ku heke pêşeng hebe, gel amade ye ku rabe ser pîyan. Bêguman gerîla, kadro, serokên xwezayî yê gel divê hebin ku gel jî karibe parastina xwe bike û xwe ji dijmin biparêze.

## Şirnex

Şirnex bajareka çîyayî ye. Kevnar û resen kurdî ye. Tevgera gerîla herî zêde li çîyayên dora Şirnexê berbelav bû. Fermandarê nemir Egîd (Mehsûm Korkmaz) di nav gundên Şirnexê da xebat kir. Şirnexî gelek fermandar û gerîlayên leheng dinasin. Di heman demê da şirnexî tevlî gerîla bûn. Wekî cephecî û milîs kar kirin. Milîs şev bi gerîla ra bûn. Di nava rojê da jî li karê xwe bûn. Lewra dagirkeran ji bo wan gotin: Gece sîlahli, gunduz kulahli (şev bi çek in, roj bi kum in)

yanî şev karê çekdarî dikin û di nava rojê da jî karê xwe dikin. Kes nizane ka ew kesên ku şev kar dikin bê ka kîne. Ev rêbazekî serkeftî bû û bi salan hat bikar anîn.

Li Şirnexê xayinên bi çek, xayinên bê çek û xayinên sîyasî hene. Ev ji alîyê giladyoya tirk ve tên beralî kirin. Şirnex navend û nîşaneya welatparêzîyê ye. Lewra dijmin baregehên xwe lê zêde û mezin kirîye. Dibe ku li Şirnexê -taybet di hin deman da- ji gel zêdetir leşker û kontra hebin. Ji ber tirsa gel û gerîla dijmin leşkerên xwe zêde dike. Kelehan ava dike ku gerîla negihê û lê nedê. Li Şirnexê dagirkerîya kilasîk nîne. Dagirkerîyeka wisa heye ku tenê xwe dispêre hêzên leşkerî û kontra. Xwe dispêre xayin û nokeran. Dibe ku mînaka dagirkerîya ku li Şirnexê heye, di asta cîhanê da tune be.

Şirnex ji ber welatparêzîya xwe dibe armanca dagirkeran. Her çiqas dibe armanc jî mînaka baş a ŞGŞ ye. Şirnexî wekî gerîla jîr û jêhatî ne. Wekî milîs bi çeka xwe tevlî çalakîyan dibin. Wekî gel radibin û hemû cure karên şoreşê dikin. Di 14-16ê tebaxa 1992ê li Şirnexê gel hat şehîd kirin, birîndar kirin û

girtin. Di berê da dijmin gotegot belav kir û digot: PKK dê salvegera 15ê Tebaxê da serhildan bike. Xiwestin bi vê piropagandayê serê kujerîya xwe bigirin.

Bi rêbaz û taktîkên cur bi cur, gerîlayê PKKê tola şirnexîyên şehîd û birîndar rakirin. Şirnexî xwedî ruhekî bilind in. Dema ku rêyek bibînin, dijî dagirkeran her tim xwedî helwest in. Têdikoşin û bi vî awayî jî dibin hokareka esasî ya ŞGŞ yê.

## Piştî Sala 1999î

Rêber Apo bîrdozîya PKKê dîyar kirîye. Lê bi dîyarkirinê ve sînordar nemaye. Tim xwe ji qalibên hizrî parastîye. Xwe diguhere û reng dide PKKê. Lewra PKK tim di lêgerînê da ye. PKK bîrdozî û sitratejîya xwe ve girêdayîye, lê dema ku pêwîst kir, guhertin û veguhertinan dike. PKK dikare xwe nûjen bike. Lewra jî tim herikbar û serkeftî ye.

Ji dema koma Şoreşgerên Kurdistanê ve, Rêbertî tim rexneyên hizrî li sosyalîzma pêkhatî kirîye. Di navbera salên 1980ê heta 1990î Rêbertî asta rexneyan bilindtir dike. Sala 1990î û şûnda

dixwaze di bîrdozîyê da nûbûnan bike. Lê ew hêsan nîne. Di kongreya 5em da (08-27 kanûna paşîn 1995) hin guhertin hatin kirin. Rêbertî bê rawestan tim di nav lêgerînan da bû ku ji pirsgirêkên kurdan ra çareserîyê bibîne. Dest diavêt pirsgirêkên Rojhilata Navîn û cîhanê.

Dema ku Rêber Apo dîl ket destê Tirkîye, dest bi hewildanên nû kir. Dixwest astenga ku heye derbas bike. Heke wisa nekiriba xeterî li ser şoreşê çêdibû. Jixwe PKKê bi sitratejîya Şerê Gel Yê Demdirêj şoreş anîbû astekê. Îcar pêwîstî bi sitratejîyeka nû hebû. Rêbertî sitratejîya nû şîrove kir. Hizra sitratejîya nû bi pêş xist. Sitratejîya nû Sitratejîya Parastina Rewa ye. Sitratejîya Parastina Rewa li ser du lingan dimeşe. Lingeka sitratejîyê hêzên gerîla ne. Bi sê qonaxan dikeve merîyetê. Qonaxa asta jêr, navîn û jor. Ew qonax li gor rewşa leşkerî û sîyasî di zik hev da dikeve merîyetê. Lingeka din ya sitratejîyê jî gel e. Gel jî li gor dem, cih, rewşa leşkerî û sîyasî dikeve tevgerê. Di navbera hêzên leşkerî û gel da Hêzên Parastina Cewher heye. Ji bo ŞGŞ Hêzên Parastina Cewher

hêzeka bingehîn e. Piştî sala 1999ê tevî van guhertinan, guhertin û veguhertinên din jî hatin kirin.

## Guhertina Sitratejî

Guhertina sitratejî girîng e. Lê ev guhertin ji her Rêber yan jî Serokekî nayê. Mao Zetungî di nava şoreşa Çînê da Sitratejîya Şerê Gel yê Demdirêj afirand. Çîn û gelek welatan bi vê sitratejîyê xwe ji bindestîyê rizgar kir. PKKê jî bi vê sitratejîyê şoreş gihand qonaxekê. Êdî sedsala 20em diqedîya û cîhan diket sedsala 21em. Mercên şoreşan guherîn. Wekî sedsala 20em, di sedsala 21em da serxistina şoreşê zehmet bû. Hevsengîyên cîhanî serûbin bûbûn. Heke di sitratejîya Şerê Gel Yê Demdirêj da PKK asê maba, guman hebû ku serkeftî nebe. Lewra guhertina sitratejî pir girîng e. Sitratejîya nû hişt ku pêşîya PKKê vebe. PKKê xwe bi vê sitratejîyê ji têkçûnê rizgar kir.

Feraseta şer bi pêş ket. Hêzên çekdarî li gorî vê ji nû ve hatin bi pergal kirin. Şûna Artêşa Rizgarîya Netewa Kurdistanê

(ARGK) Hêzên Parastina Gel (HPG) hat damezirandin. Ev jî xwe nû kirinek girîng bû. Şêwazê tevgera gerîla jî guherî. Êdî yekîneyên hejmar mezin nedihatin rêxistin kirin. Tîm û taximên gerîla hatin rêxistin kirin. Gerîla êdî bi girûpên piçûk lê bi bandor dest bi şer kir. Bi vî awayî jî serkeftî bû.

Şûna milîs û cephecîyan, hêzên Parastina Cewher hatin perwerde kirin û rêxistin kirin. Hêzên Parastina Cewher, di gund, bajarok û bajaran da dest bi kar kirin. Piştî ceribandin û nirxandinan astek hat girtin. Niha di merîyetê da tişta ku tê kirin jî ev e.

## Damezirandina Hêzên Parastina Cewher

Piştî galgal û gotûbêjan dest bi piratîka Hêzên Parastina Cewher (HPC) hat kirin. Di destpêkê da xistina merîyetê zehmet bû. Kar sergihayî (temam) nedibû. Ji ber ku rêbazekî nû bû. Dê çawa were pêşxistin nedihat zanîn. Jixwe her tişta ku nû dikeve merîyetê, di destpêkê da zehmetîyan bi xwe ra tîne. Bi salan piratîk dihat kirin. Di civînan da encam dihat nirxandin,

lê wekî ku tê xwestin nedibû. Di encama hemû piratîkan da hat dîtin ku pêwîste berîya her tiştî fêrbûnên berê werin terikandin. Perwerde, rêxistin, piratîk pêwîste li gor hizra nû be. Heke wisa nebe, gotin nû piratîk jî yê kevin dibe. Ev rastî derket holê û şûnda, piratîkên serkeftî derketin pêş. Wisa jî li her alîyên Kurdistanê Hêzên Parastina Cewher hatin bi rêxistin kirin. Bê guman, her gund, bajarok û bajar xwedî hin taybetmendîyên xweser in. Hêzên Parastina Cewher jî li gor van xweserîyan lazime werin dest girtin.

Bi Hêzên Parastina Cewher, ji nava gel kesinên bijarte tevlî şerê parastina Kurdistanê dibin. Hêzên Parastina Cewher di navbera hêzên leşkerî û gel da wekî pirek in. Rista wan girîng û di rewşên awarte da û di şer da girîng e. Pêwîste xebatkarên Hêzên Parastina Cewher û gelê dilsoz û welatparêz bi vî hestiyarîyê nêzî mijarê bibin ku em di parastina gelê Kurdistanê da serkeftî bin.

## Di Dema Sitratejîya Çarem Da ŞGŞ

Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd heta niha çar sitratejî xistîye merîyetê. Ji van ya yekem: Di navbera salên 1977-1980ê ye. Di dema vê sitratejîyê da li hember sazî û dezgehên sîxur û noker, li hember kes û komikên noker û sîxur têkoşîn hatîye kirin. Ya duyem: Ji sala 1980ê dest pê dike heta sala 1993ê didome. Em jê ra dibêjin Şerê Gel Yê Demdirêj. Afirînerê vê sitratejîyê Mao Zetung e ku sitratejî di şoreşa Çînê da xiste merîyetê û bi vê sitratejîyê şoreş hate serxistin. Li Kurdistanê, di dema vê sitratejîyê da, şerê gerîla tê bilind kirin. Lê sitratejî bi awayekî fermî heta sala 1998ê didome. Di vê demê da lêgerînên çareserîyê hene û şerê çekdarî jî didome. Ya sêyem: Ji sala 1998ê dest pê dike heta sala 2009-10ê didome. Ev qonaxeka girîng e. Tevî agirbestê û lêgerînên çareserîyê, dem bi dem şer gur dibe, dem bi dem jî çalakîyên gel derdikevin pêş. Ya çarem: Piştî ku hat dîtin êdî bi dewletê ra lihev kirin çênabe, hat destpêkirin. Em jê ra dibêjin: “Şerê Gel yê Şoreşgerî”. Ji xencî şer û berxwedanê tu rê li pêş Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd

nema. Hêzên leşkerî û gel bi hev ra di nava berxwedanê da ne. Sedema nivîsandina vê pirtûkê jî ev e ku em karibin qonaxa sitratejîk ya çarem yanî Şerê Gel yê Şoreşgerî nas bikin. Tê bigihijin û karibin bi awayekî rast têbikoşin.

## YPS/ YPS-JIN

Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd sînorê têkoşîna xwe fireh û rengîn kirîye. Lewra li her cihê ku kurd lê ne, rêxistin û parastina wan jî heye. Ev asteka baş e. Di dema sitratejîya çarem da, têkoşîn pir alî tê kirin. Alîyekî vê têkoşînê yê girîng jî ragihandina rêvebirîyên xweser in. Li bakurê Kurdistanê ev gav hat avêtin. Gav gavekî sîyasî ye, lê ji ber mercan gavên sîyasî bê parastin nayin avêtin. Li ser vî bingehî di sala 2015ê YPS û YPS-JIN hatin damezirandin.

Bi ragihandina rêvebirîyên xweser ra şer jî li bajaran gur bû. Bi taybet Cizîra Botan, Silopya û Sûr a Amedê şerekî bi rêbazên nû hat kirin. Derbên sîyasî û leşkerî li dijmin ketin. Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd jî xwe gihand astekê.

**JÎN (di dema şer da)**

Ciwanên kurdan cihê xwe di parastina rêvebirîyên xweser da girtin. Van ciwanan wisa şer kirin; dijmin hetikandin. Hêzên dijmin yên taybet, tabur bi tabur ketin şer û wisa jî hatin tune kirin. Ji zarokan bigere heta dayîkên temen mezin cihê xwe di vê berxwedanê da girtin. Bi taybet li Cizîra Botanê û Sûra Amedê berxwedanîyên destanî hatin kirin. Rûyê dijmin yê kujer û qirker jî careka din derket holê.

YPS-JIN jî ji vê berxwedanê nema û xwe tevlî kir. Jinên ciwan destanên lehengîyê nivîsandin. Şehîd jî dan û rûmeta gelê kurd bilind kirin. Ragihandina rêvebirîyên xweser û parastina wan, dîrokeka zindî û berbiçav e. Serkeftina xwe rizgarkirin yan jî nerizgarkirina bajaran da nîne. Serkeftina xwe wêrekî û berxwedanê da ye. Şok kirina dijmin da ye. Nas kirina hêza ciwan û gel da ye. Heke dijmin neyê çareserîya sîyasî ev gel dikare demekî dirêj li hember vî dagirkerî şer bike. Serkeftin di van dîyardeyan da ye.

**JÎN (di dema şer da)**

## Rêvebirîyên Xweser (Li Bakurê Kurdistanê)

Di asta cîhanê da jî kesên ku pergala sermayedar ne razî ne hene, rêbazên cuda diceribînin. Tevgera dagir bike jî yek ji van e. Di sedsala 21em da têkoşîn cuda tê kirin. Rûxandina dewletê û şûna wê damezirandina dewleta xwe rêbazê sedsala 20em e. Di sedsala 21em da dubare kirina wê rêbazê bi xwe ra serkeftinê nayîne. Lewra di rêbaz û taktîk da guhertin bi xwe ra serkeftinê jî tîne. Di vê sedsalê da guhertinên civakî pêwîst in. Pêwîste kesayet perwerde kirî û têgihiştî bin. Çanda xwezayî û demokratîk bibe rastîya civakan. Heke wisa nebe, pergala sermayedar, demokrat û azadîxwazan zu dişibîne xwe. Lazime bi hurgilî li jîyana burjuwazî were meyzandin û civak xwe ji bin bandora jîyana burjuwa derbixe. Lewra her kesê şoreşger, azadîxwaz, demokrat, hawirdorparêz, alîgirê azadîya jinê pêwîste di xwe da têkoşînê bide destpêkirin. Lazime bi hişmendîya civakî were jîyan kirin. Jîyan jî kominal û demokratîk be. Demokrasî jî redîkal be û xwe bispêre pir rengîyê.

Rêvebirîyên xweser jî wisa hatin ragihandin. Lêgerîna jîyaneka bê dewlet yan jî kêm dewlet e. Şûna damezirandina dewleta xwe, pêşxistin û tekuz kirina gel e. Gel heke têgihiştî be, xwe baş rêxistin bike, dewlet hebe jî li ser gelekî wisa nikare bi bandor be. Bi hiş û rêbazê serdemê rêvebirî hatin ragihandin. Hat dîtin ku bi vî awayî li Kurdistanê û tevahîya cîhanê jî her miletek dikare pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bike.

## Zarokên Agir û Rojê "Çalakîkerên Xwedî Hêza Karînê"

Em ne agirperest in, lê agir remza me ya dîrokî ye. Em ne rojperest in, lê Roj jî wekî agir remza me ya dîrokî ye. Ji pêşîyên me wekî bawerî û kultur ji me ra maye. Em jî di wê bawerîyê da ne. Ew bawerî me ji pêşîyan girtîye û em dê bigihînin nifşên paşerojê. Bi vî awayî pêşîyên me, em û nifşên paşerojê dibin yek bawerî û yek dest. Lê belê bawerî li gorî serdema xwe, xwe nûjen dike. Heke nûjenî nebe, di serdemeka dîrokê da asêmayîn dibe. Zarokên Agir û Rojê jî xwe digihînin pêşîyên xwe lê li gorî serdema xwe.

**JÎN (di dema şer da)**

Agir ji berê ve ji bo mirovan sudewer e. Di heman demê da, ji bo Zarokên Agir û Rojê jî agir gelekî sudewer e. Bi agir tola şehîd, darvekirî, êşkence dîtî, penaber kirîyan digirin. Ew tolegirên hemû gorbihuştên Kurdistanê ne.

Qasî ku tê zanîn, Zarokên Agir û Rojê ew zarok in ku çavê xwe li nava şer vekirine. Hîna di temenekî piçûk da polîtîze bûne. Pirsgirêkên netewî û çînî ra rû bi rû mane. Di bin metirsîya qirkirina fîzîkî û kulturî da mezin bûne. Xwe berpirsîyar dîtine ku li hember dagirkeran û bendeyên wan yê kurd têbikoşin.

Zarokên Agir û Rojê di çalakîyên xwe da piranî şewitandinê dikin. Desthilatîya faşîst û peyayên wan yê zengîn dikin armanc. Kargeh, sazîyên faşîst, milkê zengînên faşîst dişewitînin. Bi vî awayî derb li aborîya şer ya Tirkîyeyê didin. Kêm be jî leşker û polîsan dikin armanc û wan ceza dikin. Di heman demê da kesên sîxurtîya dijmin dikin, dibin armanca Zarokên Agir û Rojê. Her kesê ku di nav civaka kurd da karê dijmin dikin û zirarekî didin civaka kurd jî armanca Zarokên Agir û Rojê ne. Tê zanîn, dagirkerîya tirk, bi taybet, di

**JÎN (di dema şer da)**

Kurdistanê da, firotina jinan pêş dixîne. Madeyên hişbir berbelav e ku bi destê dewletê tê belav kirin. Bikaranîna mey an ku alkol jî heman wekî madeyên hişbir, bi destê dewletê, di nava kurdan da tê belav kirin. Wekî karekî taybet, pêşxistina sîxurtîyê tê kirin. Zarokên Agir û Rojê li hember van kiryaran xwedî helwest in. Karîna wan heye ku li hember van kiryaran çalakî bikin. Ev çalakî rewa ne û lazime tim werin kirin. Esas li hember van kiryaran xwe rêxistin nekirin û bêdeng mayîn, neheqîyeka mezin e ku miletek li xwe dike. Bê helwest û bê çalakî mayîn, xwe ji mirinê ra razandin e. Lewra jî Zarokên Agir û Rojê çiqas çalak bin ewqas dibin yê xwe. Çiqas çalak bin ewqas hebûna gelê xwe diparêzin.

Pêwîste her kurdekî welatparêz piştgirî û tevkarîya wan bike. Her kurdê ku rastî pişaftin û xwe pişaftinê hatibe, kultur û zimanê xwe bîr kiribe, pêwîste tola xwe ji dijminê xwe rake. Pêwîste Zarokên Agir û Rojê bibin sersebeb ku ciwanên kurd dîroka xwe binasin. Zimanê xwe fêr bibin. Kulturê xwe yê resen binasin. Di encam da jî vegerin li ser resenîya xwe ya ku

safî kurd û kurdistanî ye. Ji ber ku xwe rêxistin kirin girîng e. Girîng e ku mirov çalak be û çalakîyan bike. Lê belê pêwîste kesayet jî xwe ji nû ve bi kultur û jîyana Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd bihûne. Xwe ji kirêtîyên Modernîteya Kapîtalîst rizgar bike. Heke wisa bû civakeka nûjen şîn dibe û kulîlk vedide.

## Ezmûna Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê û Rojavayê Kurdistanê

Li hêleka Kurdistanê şoreş hat serxistin ku ji bo gelê kurd giranbuha ye. Serkeftin heye lê çawa? Yekem: Keda Rêber Apo heye. Ji ber ku Rêbertî ji sala 1979ê heta sala 1998ê li rojavayê Kurdistanê, Sûrîyeyê û Libnanê têkoşîneka bêhempa kir. Xwe berda nava gelê rojavayê Kurdistanê û gel perwerde kir. Bi dewletan ra dan û sitandin kir. Di nav gelê rojavayê Kurdistanê da hizir û hestên netewî pêş xist.

PKKê bi kadroyên xwe yên mêr û jin xebat kir û dike. Van kadroyan di gel da kultur û jîyana demokratîk bi pêş xist. Di

encamê da ciwanên rojavayê Kurdistanê çi mêr çi jî jin be, çûn bakur, başûr û rojhilatê Kurdistanê û bi karên şoreşê rabûn. Dema ku li Sûrîyeyê alozî derket, jixwe Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd û gelê rojavayê Kurdistanê, ji bo şoreşê amade bûn. Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd (TAGK) guh neda opozîsyona Sûrîyeyê. Guh neda hin partîyên kurdî jî. Ji ber ku TAGK xwedî xeta sêyem e. TAGK hêzên emperyal wekî xetekê dinirxîne. Dewletên Rojhilata Navîn jî wekî xetek û sitatuparêz digire dest. Ev her du xet tu caran ji gelê kurd ra azadî û wekhevîyê nayînin. Ji ber ku her du xet jî kurdan nas nakin. Kurdistanê wekî welatê kurdan napejirînin. Lewra bi van her du xetan ra yekbûn, di serî da wenda kirin e. Dîroka gelê kurd jî bi wendakirinên wisa dagirtî ye. TAGK jî ji vê dîrokê encam bi dest xistîye û nahêle bi sitratejîya berê ya kurdan, kurd careka din ji mafên xwe bê par bimînin.

Di xeta sêyem da têkoşîn hat kirin. Bajarên kurdan hemû hatin rizgar kirin. Şoreşê di cîhanê da deng veda. Hat peyitandin (îspat) ku xeta sêyem rast e û serkeftinê tîne. Pêwîste gelê kurd

jî guh nede hin piropagandayên ku dijî şoreşê tên kirin. Gelê me li rojavayê Kurdistanê û bakur û rojhilatê Sûrîyeyê di xeteka rast da ye.

## Serhildana 12ê Adara 2004ê (Qamişlo)

12ê adara 2004ê tiştên ku bûn, em wekî serhildan pênase dikin. Lê belê di esas da hewildana bi komî kuştina kurdan e. Pîlan hatibû danîn ku di navbera kurd û ereban da şer were derxistin. Bi vî awayî jî kurd werin kuştin, birîndar kirin û penaber kirin. Li gel hemû dewletên dagirker ev hizir û feraset heye. Her ku derfetê dibînin dixwazin kurdan bikujin, birîndar bikin, desteser bikin û di zîndanan da birizînin û kurdan ji cih û warên wan bikin û bikin penaber. Hêzên hegemon jî xwedî heman hizir û ferasetê ne. Lewra kuştin û penaber kirina kurdan hêsan e. Ji ber ku hêzeka dîyar dijî kuştina kurdan nîne. Her dewleta ku bixwaze, zemîn amade dike û kurdan dikuje. Divê were zanîn ku di kuştina kurdan da pareka mezin ya xayin û nokerên kurdan jî heye. Her kuştin û tasfîye kirina serok, partî û gelê kurd da destên hêzên hegemon, dewletên dagirker û xayinên

kurdan heye. Lewra ŞGŞ û Parastina Cewher herî zêde ji bo kurdan pêwîst e.

Sedam ji bo kurdan dîktatorekî kujer e. Kujerê kurdan e ku bi çekên kîmyayî û bi her cure rêbaz û teknîk bikar anîye û kurd şehîd xistîye. Ji ber ku 20ê adara 2003ê dijî Sedam kurd li başûrê Kurdistanê rabûn û di encamê da Sedam ji desthilatîyê ket û di dawîyê da hat darvekirin; beşekî ereban kurdan sucdar dikin. Ew erebên ku Sedam wekî rizgarkerê ereban dibînin, ji ber ketina Sedam kurdan tawanbar dikin. Lê ya ku kurdan kirîye, dijî kujerên xwe serî rakirin e. Ev jî mafekî rewa ya kurdan e. Alîgir û hezkirîyên Sedam heke mafparêz bin, pêwîst bû di dema xwe da, ji ber bi komî kuştina kurdan dengê xwe bilind kiribana.

Di encam da desthilatîya Sûrîyeyê beşek ji girseya Dêrazorê dijî kurdan sor kir û ew anîn Qamişlo ku bi destê wan pîlanekî qirêj li ser kurdan pêk bînin. Girseya hov û har ya ku ji Dêrazorê berê xwe dabû Qamişlo, dê êrîş bikira û hêzên dewletê jî dê bi piştgirîya wan bikira. Di dawîyê da jî dewletê

dê dest li rewşê werdaba û bi dilê xwe dê pîlanê xwe xistiba merîyetê. Dewletê ev pîlan xist merîyetê, lê gelê kurd ne ya berê ye. Pêşengên xwe hene, perwerde kirî ne, rêxistinên xwe hene, polîtîk in û dikarin her cure pîlanên dagirkeran pûç bikin. Gelê kurd li hember hewildanên komkujî û penaber kirinê an ku guhertina demografîyê, pîlanê xwe xiste merîyetê û gav bi paş ve bi dijmin da avêtin. Lewra serhildana 12ê adara 2004ê serhildaneka bi nirx û bi rûmet e.

Dewlet pîlanê datîne û ji Dêrazorê girseyê tîne. Dewlet di milê xwe da amadekarîyan dike. Girseya ku ji Dêrazorê tê jî bi rêxistin kirîye û amade ye. Mixabin gelê Qamişlo ji vê pîlanê agahdar nîne. Gel bi awayekî xwezayî diçe ku lîstika gogê temaşe bike. Dema ku bûyer dest pê dike nûka gel agahdar dibe ku ka çi diqewime. Bi zuka rewşa heyî di nava gel da belav dibe. Di heman demê da gel jî dest li rewşê wer dide. Mixabin di destê gel da tu tişt nîne ku pê xwe biparêze. Lê di destê hêzên dewletê da çek hene û di destên êrîşkarên ji Dêrazorê ne jî ne vala ne. Bi vî awayî di navbera gel û hêzên êrîşkar da ne

hevsengîyek heye.

Di dema van rûdanan da gel hem xwe diparêze hem şehîdan radike hem jî li birîndaran xwedî derdikeve. Di nava gel da li hevûdu xwedî derketin heye. Gel piştgirî dide hev. Bi şûn ve gavan navêje. Di encamê da zêdetirî 40 berxwedêr şehîd dikevin. Bi sedan birîndar dibin. Bi sedan kes tên desteser kirin. Desteserkirî di zindanê da jî êşkence dibînin. Di bin êşkenceyan da jî welatî jîyana xwe ji dest didin. Xwendekar ji xwendinê bêpar tên hiştin.

Serhildan li Qamişlo dest pê kir û belavî her derê bû. Ji Qamişlo heta Şamê kurd rabûn ser pîyan. Kurdan rasterast dewlet kirin armanc. Hêzên ewlekarî kirin armanc. Rêxistin, sazî û dezgehên dewletê yan şewitandin yan jî rûxandin. Cihê mixabinî ye ku hin partîyên kurdî hewil dan ku pêşîya girseyan bigirin ku li hember dewletê ranebin. Pêwîst bû wan partîyan pêşengtî ji gel ra bikirana. Di rewşên wisa da partîyên sîyasî pêşîya gel radibin û helwest datînin. Ne ku gel li pêş be û partî jî duvik bin. Yan jî partî bi dewletê ra bidin bistînin ku hêrsa

gel daxînin û dewlet jê zirarê nebîne.

Serhildana Qamişloyê serhildana kurdan hemûyan e. Serhildan bi şoreşa 19ê Tîrmeha 2012ê tacîdar bûye. Heyfa şehîd û birîndaran hatîye hildan. Ew kesên ku êşkence dîtin jî bi şoreşê ra, di nava azadî û wekhevîyê da dijîn. Di serhildana Qamişloyê da jî hat dîtin ku heke gel rêxistinkirî be ser dikeve. Hêzên kujer demkî ne û gelê kurd heye û dê tim hebe.

## Xweparastina Şêxmeqsûd (Helep)

Di bajarekî da taxek, di taxekî da miletekî bi rûmet. Rastî êrîşên hovane hat. Gelo çima?

Sûrîye dewleteka çêkirîye. Sînorên wê ji alîyê hêzên derve ve piştî şerê cîhanê yê yekem hatîye xêzkirin. Beşekî Kurdistanê li nav sînorên xêzkirî dimîne. Gelê rojavayê Kurdistanê an ku gelê me yê ku di sînorê xêzkirî yên Sûrîyeyê da dimîne, ji bo bakurê Kurdistanê jî alîkarî kirîye. Xwestine piştgirî bidin serhildana Amedê, ya Şêx Seîd. Dema dagirkerîya firansizan, kurdan serî rakirîye û şer kirine. Di qewitandina dagirkerên

firansiz da risteka kurdan heye. Hem begên wan hem jî gel serî hildaye.

Kurdan ji asta jêr bigire heta serokkomarîyê, di pergala dewletê da cih girtine û dewlet bi rê ve birine. Lê ev dewlet tu caran nebû ya kurdan. Her ku çû şovenîstî pêş ket. Dewlet bû tenê yê desthilatê ereban. Kurd tune hatin hesibandin. Ji beşekî kurdan ra nasname jî nedihat dayîn. Di vê mijarê da kiryarên dewletê gelek in û tên zanîn.

Di sala 2010ê da li Rojhilata Navîn rewşek çêbû. Rêber Evdellah Ocalanî ji vê rewşê ra got: "Bihara gelan." Ji bo gelên Rojhilata Navîn biharek hatibû, lê dawî dê çawa be nedihat zanîn. Di encamê da hêzên hegemon dest li rewşê werdan û nehiştin demokrasî û rêvebirîyên demokratîk pêş bikevin. Li Sûrîyeyê jî rastîyek derket holê. Heke ji piştgirîya Rusya nebaya desthilatîya Sûrîyeyê jî diket. Di nava serûbinbûnekî wisa da kurdan xwe gihand astekî ku êdî xwe bi xwe, xwe rêve dibin.

Lê, vî carî jî çete û komên çeteyan yên xwedî navên cur bi cur

êrîşî kurdan dikirin. Ev zêdetirî du sed sal e kurd her serî radikin û hêz û dewletên herêmê û hêzên gilobal nahêlin kurd bibin tiştek. Her dixwazin kurdan ji holê rakin. Çima? Sedemên vê yên dîrokî, kulturî û hunerî hene. Sedemên jeositratejîk, jeopolîtîk û ekonomîk hene. Lewra jî kurd neçar in xwe bi xwe, xwe rizgar bikin. Dostên kurdan dê tune bin, lê kurd dê dostanîya her kesî bikin. Ev jî taybetmendîyeka dîrokî ya gelê kurd e. Ji ber ku afirîner e. Ji ber ku pêşî li mirovahîyê vedike. Ji ber ku miletekî pêşeng e.

Heleb bajarekî kevnar e. Navenda bazirganî û sîyasetê ye. Lewra miletên cur bi cur xwe lê digirin. Heke destkarî nebe hemû gel bi hemû bawerîyên xwe ve di nava aramîyê da dijîn. Heleb bajarekî bi vî rengî ye. Kurdan jî xwe li vî bajarî girtîye. Ji Efrîn û cihên din yên Kurdistanê, kurd hatine û bi cih bûne. Bêguman kurd dema diçin cihekî bi cih dibin, pêşî li wir kurdan digerin. Heke hebin xwe li wan digirin. Li Helebê jî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefîyê wisa bi pêş ketine. Wekî ku li Şamê Taxa Zorava pêş ketibe. Li Helebê kurd beşek in ji beşên

civakê. Mafê wan yê lê mayîn û jîyan kirinê heye.

Piştî ku li Sûrîyeyê alozî derket, rewş yekser hat guhertin. Di destpêkê da gelê Sûrîyeyê daket kolan û meydanan û nerazîbûna xwe nîşan da. Lê serok û partîyeka şoreşger tune bû. Kadroyên hemdem tune bûn ku ji gel ra pêşengtîyê bikin. Nerazîbûna gel hebû, lê valahîyek jî hebû. Lewra serdestî ket destê çeteyên îslamî ku di eslê xwe da têkilîya wan bi îslama kulturî ya demokratîk ra tune ye.

Di van salan da an ku piştî sala 2010ê kurdan destê xwe sivik girt û herêmên xwe rizgar kirin. Ji ber ku gelê kurd ji berê da amade bû ku xwe bi rê ve bibe. Ev hiş, rêxistin, daxwazî ji alîyê Rêbertîyê ve hatibû çandin. Gelek kadroyên PKKê di nav gel da xebat kiribûn û li Çîyayên Kurdistanê şehîd ketibûn. Gelek ciwanên ji rojavayê Kurdistanê berê xwe dabûn Çîyayên Kurdistanê û şehîd ketibûn. Lewra jî gelê rojavayê Kurdistanê têgihiştî û amade bû. Encam jî destkeftîyên nû bidest xistin bû.

Heke destê gelekî da destkeftî hebin, bêguman parastina wan destkeftîyan jî pêwîstîyek e. Di destê kurdan da destkeftî hene

û lazime biparêzin. Li taxa Şêxmeqsûd û Eşrefîyê ev hatîye kirin. Bi giranî di sala 2014ê da bi navên cur bi cur çeteyên îslamî bi çek êrîş birin li ser Şêxmeqsûd. Heke em navê wan bilêv bikin: di serî da û destpêkê Artêşa Azad, Cebhed El Nusra, Siltan Mirad, Ehrar El Şam, Ceyşil Fetih bi salan êrîşî kurdên Helebê dijîn kirin. Salên 2021 û 2022 jî desthilata Sûrîyeyê li ser taxa Şêxmeqsûd û Şehbayê dorpêçê disepîne. Dîsa bi rojan û bi mehan gel bê erzak tê hiştin. Rêvebirîya Xweser kar dike û di dawîyê da jî dorpêç li ser gel tê rakirin.

Li Heleb, bi taybet jî li taxa Şêxmeqsûd dîrokek ya Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd heye. Rêbertî bixwe li Helebê di nava ciwanên zanîngehê da kar kirîye. Di nava gel da xebat kirîye. Wekî Rêberê Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd, xebatên ku Helebê dihatin kirin, ji nêz ve şopandîye. Ji nava gel hin kes hene ku bi Rêbertî ra dane û sitandine. Lewra jî gelê ku li Helebê dijî gelekî berxwedêr û xweragir e.

Gelê Helebê ji sala 2012 û şûnda taxên xwe parastin. Carina çete pêş da hatibin jî şer kirine û çete ji dûrî xwe xistine.

**JÎN (di dema şer da)**

Kurdan di destpêkê da xwe fêrî bikaranîna kalaşnîkofê kirin. Pêdepêde wekî hêzên parastina cewher xwe rêxistin kirin. Bi vî awayî Hêzên Parastina Cewher HPC damezirandin. Ji piçûk heta mezinan, ji jin heta mêran her kesî cihê xwe di nava HPCyê da girtin. Di kolanên taxê da perwerdeya leşkerî dîtin. Tevî ciwanan dê û bavên 60 salî di rêzên leşkerî da cih girtin. Temen mezinên me dema bi fermana raweste amede be, çek sermil û silava şehîdan dilivin û deqeyekî radiwestin, bêguman dê şerê dagirkeran jî bikin. Dê her tim bixwazin azad û xweser bijîn. Ev jî ji bo gelê kurd serbilindîyek e.

Bi demê ra li Helebê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) hatin damezirandin. Êdî gelê me bû xwedîyê hêzên bi rêk û pêk û pirofesyonel. HPC wekî rêxistina li nava gel YPG û YPJ jî hêzên leşkerî yên pirofesyonel in. Bi vî awayî hêzên leşkerî û gel yanî HPC bi hevûdu ra li ber xwe didin. ŞGŞ ya ku em qala wê dikin jî ev e.

Hêzên çekdar an ku girûpên çeteyan, ku wekî xewnerojkên gel in, ji kûr û çawa peyda bûn, bi hurgilî nayê zanîn. Hin rêxistin

û kom aşkera bûbin jî lê hîna jî pêwîstî bi lêkolînan heye. Çeteyên ku Tirkîye piştgirîya wan dike têra xwe aşkera bûn. Bi hin daxuyanî û belgeyan aşkera bû ku hin dewlet pişt van rêxistinên kujer û rûxîner in. Bi vî awayî nahêlin gel bijarteya xwe derxe pêş. Gelan bêçare dihêlin û di dawîyê da wekî ku rizgarker bin bi mûçeyeka zêde ji nav gelên jar ji xwe ra çekdaran peyda dikin. Ya ku bibe jî hêzên parastin û rêvebirîyên xweser û demokratîk in. Ji ber ku miletekî bi tendurist û ewle kêrî dewletên zirhêz nayin, rêxistinên çete û giladyoyî disepînin gelan. Ev kom û rêxistinên ku êrîşî Helebê kirin jî her wisa ne.

Van rêxistinan şerekî bê pîvan kirin. Gelê ku di taxan da ne dan ber bombeyan. Hawan, obus, qinînên xazê ku wekî teqemenî hatibûn amade kirin, bê ser û ber li ser gel da barandin. Bi çekên sekvanîyê suîqest dikirin. Ya herî hovane jî bikaranîna xazên kîmyayî bû. Tevî zarok û jinan gel tev didan ber bombeyên jehrî. Bi piştgirîya Tirkîye teqemenî û xazên kîmyayî dihatin çêkirin. Madeyên çêkirina xazan ji Tirkîyeyê

dihat. Li Tirkîyeyê û li derve jî bi taybet ji Ewropa piştgirî ji bo çeteyan dihat. Konfederasyona Tirkên Ewropa bi aşkera, bi al û logoyên xwe, ji bo çeteyan alîkarî dişînin.

Di encamê da şervan, zarok, dayîk hema bêje hemû beşên civakê bûn armanca van çeteyan. Kesinên jîyana xwe dest dan hene. Kesinên birîndar bûn hene. Kesinên ji xaza jehrî şehîd bûn hene. Kesinên ji xazê bandor bûne hene. Vana tev tawanên şer in. Lê çi mekanîzma nîne ku hesab ji van çete û dewletan bipirse.

Girseya ku li Şêxmeqsûd dimîne di van şert û şurtan da jîyaye. Beşekî gel ji taxê derketibe jî, yên mayî jîyaneka di nav dorpêç û şer da hunand. Gel birîndarê xwe derman kirîye. Di hin malan da û bi piştgirîya hin bijîşkan. Şehîd hatine rakirin. Tevî hin deman derfet jî nebûye ku şehîdan bispêrin axê. Termê şehîdan bi rojan mane li erdê.

Ji ber bombebaranê xanî û avahî rûxîyane. Di bin xirbeyan da şehîd û birîndar mane. Lê gel xanî û awahî tadîlat kirine û tê da jîyane. Kolanên xwe ji bermahîyên bombebaranan paqij kirine.

**JÎN (di dema şer da)**

Wekî şaredarîyê xizmeta xwe kirin. Bi yekdest tev gerîyane. Zivistanê her çi tiştê dişewite hebe şewitandine û xwe pê germ kirine. Di tenekeyan da agir dadane. Bi vî awayî jî neçar nemane. Jinan -piranî jî dayîkên bi temen- ji şervanan ra xiwarin amade kirine. Di şerên wisa da amadekirina xiwarinê û peyda kirina avê karekî esasî ye. Ev kar jî piranî jinan girtîye ser xwe.

YPG û YPJ tevî HPC şer kirine. HPC di kolanan da nobet girtîye. Hin deman ku cihê şervanekî di çeperê da vala ma HPCê ev valatî dagirtîye. Kesinên medenî çekên şehîdan rahiştine û şer kirine. Her kesayetek bi şiklekî tevlî şer bûye. Dîwar hatine kun kirin. Ji bo çûn û hatinê pergalek hatîye danîn. Ji ber ku kolan nayin bikaranîn.

Gelên Şêxmeqsûd di malan da, di her bostekî ax da baxçe danîne. Di nav teneke û qotîkan da sebze danîne û pê debara malê kirine. Dem hatîye gel girîyaye û şîn girêdaye. Dem hatîye govend û dîlan girtine. Dem hatîye ji berfê berfemêr çêkirine. Zarok di mal û kolanan da her leyîstine. Dayîkan tutê

xwe mijandine. Bi vî awayî milekê jîyanê şer, milekî din jî tiştinên civakî ye. Gelê Şêxmeqsûd da dîyarkirin ku di nav şer da miletek ne bi mehan bi salan jî dikare şer bike û bijî. Ev jî serbilindî û serfirazî ye ji bo wî gelî.

## Serêkanîyê

Şerê Gel Yê Şoreşgerî bê hêzên pirofesyonel an ku gerîla nayê hizirandin. Heke di cihekî da ŞGŞ tê xwestin, divê gerîla, şervan an ku hêzên pirofesyonel hebin. Di ŞGŞ ya Serêkanîyê da jî pêşeng gerîla ye. Şervantîya ku li bakur û rojhilatê Sûrîyeyê û rojavayê Kurdistanê bi pêş ket, dîsa di pêşengtîya gerîla da pêş ket. Şervantîya ku heye jî dil dixwaze wekî gerîla be. Ji ber ku şervantî asteka di navbera gerîla û Hêzên Parastina Civakî (HPC) da ye. Di feraseta ŞGŞ da hêzên pirofesyonel û HPC heye. Hêzên HPC tevî gel alîkarîya hêzên pirofesyonel dikin. Di şerekî wisa da, heke hebe, rista hêzên asayîşê jî girîng e.

Li Serêkanîyê, salên 2012 û 2013yê rewşeka taybet heye. Ji ber

ku li holê tu hêzeka amadekirî tune ye. Derfetên çek, cephane û xurek jî tuneye. Çi çeper û tunel nehatine lêkirin.

Di destpêkê da, li Serêkanîyê dewlet û çete -ku bi navê cur bi cur li xwe kirine- hene. Li bakurê Serêkanîyê an ku serxet jî dijminekî bav û kalan heye. Berpirsîyartîya sincî û wijdanî ya Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd (TAGK) heye ku pêwîst e dest li rewşê werde.

Tevî hemû astengîyan, tişta baş ev e ku li bajar kadroyên PKKê hene. Kadro hem di qada leşkerî da hem jî di qada civakî da hene û kar dikin. Dema ku rewş li van kadroyan diqelibe, zend û bendan badidin. Li gorî hişmendîya ku ji Rêber Evdellah Ocalan girtine tev digerin. Ew nabêjin derfet tuneye û xwe paş ve nadin. Di destpêkê da gel tînin gel hevûdu û gel digihînin astekî. Komin û meclîs tên damezirandin. Rêvebirîyeka sîyasî tê damezirandin ku Abid Xelîl yek ji wan e ku di rêvebirîya sîyasî da cihê xwe digire. Demekê sê hêz, hêzên kurdî, dewlet û çete hene. Di destpêkê da hêzên kurdan û çete bi hev ra dijî dewletê radibin. Piştî nemana dewletê, çete berê xwe didin

kurdan ku wan ji Serêkanîyê xalî bikin. Şerekî dirêj û dijwar wiha dest pê dike.

Mixabin rista hin partîyên kurdan di şerê Serêkanîyê da xirap e. Tevî vî di nav rêxistinên çeteyan da kurdên ji bakur û başûrê Kurdistanê jî hene. Jixwe Tirkîye destpêkê heta dawî piştgirîya çeteyan dike ku kurdan ji holê rake. Divê were zanîn: Li Serêkanîyê kurdê azad tenê dijî hêzekî şer nekirîye.

Li Serêkanîyê payîza sala 2012ê heta havîna sala 2013ê, sê şerê giran rû didin. Destpêkê Artêşa Azad paşê jî Cebhet El Nusra êrîşê kurdan dikin. Di van şeran da li pêş perde çete dîyar in, lê pişt perde Tirkîye heye. Çete çek, cephane, xurek û hwd ji Tirkîyeyê digirin. Çete ji serxet tên û dikevin Serêkanîyê. Wisa jî şer dikin. Lewra heke em bêjin ev şer şerê çeteyan û kurdan e, dê rast nebe.

Berxwedan û xwe parastina kurdan di çend qonaxan ra derbas dibe. Ji wan:

1) Saz kirina rêvebirî û damezirandina hêzên parastinê.

**JÎN (di dema şer da)**

2) Gerîla û gel bi hev ra dijî çeteyan şer dikin.
3) Ji herêma Cizîrê hatina hêzên leşkerî û ji Cizîrê alîkarî gihandina gel û şerê rizgarkirina Serêkanîyê.

Qonaxa yekem: Zehmettirîn qonax e ku di destê gerîla û şervanan da tenê kalaşnîkov û bombe hene. Di vê qonaxê da gerîla kêm in, lê beşdarbûna gel di astekî baş da ye. Bi taybet ciwanên Serêkanîyê yên xwedî keramet, xwe ji şerê parastinê nadin paş. Kêm be jî ji derve ve ciwan tên û tevlî parastina bajar dibin. Di heman demê da ji gelê me yê ereb û tirk jî ciwan tên û cihê xwe di çeperên Serêkanîyê da digirin. Ji gel beşek ji bajar derdikeve.

Qonaxa duyem: Ji herêma Cizîre hêzên pispor û dilxwaz tên û dikevin nav bajar. Çeper tên tekuz kirin. Gel -bi taybet dayîk-di malan da xiwarin amade dikin û digihînin çeperên şer. Gel xwedî birîndaran jî derdikeve. Bijîşk di nava şer da kêleka gerîla ne. Bi erkê xwe radibin û karekî pîroz dikin, da ku şerkerên birîndar bûyî bi hêsanî jîyana xwe ji dest nedin. Bijîşkan jîyana xwe jî dixistin xeterîyê. Lewra bijîşkan, di vî

şerî da şehîd dan.

Qonaxa sêyem: Li bajar gel kêm dimîne. Hêzên leşkerî hejmara xwe zêde dikin. Ji Dirbêsîyê û Amûdê alîkarî digihê Serêkanîyê. Ji milê bakurê Kurdistanê an ku serxetê ve gel tê ser sînor û piştgirîyeka baş didin şerê Serêkanîyê.

Daneyên misoger di dest da nebin jî, di şerê Serêkanîyê da ji sala 2012 heta sala 2013 27 gerîla û şervan û 24 welatî dibin pakrewanên axa pîroz.

Tirkîye bi hemû derfetên xwe ve şerê Serêkanîyê destek kir. Wan civîn bestin. Peyman mor kirin. Çi ji destê wan û kurdên xayin hat kirin, lê tiştek bi dest nexistin. Di ser da jî di şerê Serêkanîyê da -hejmarekî baş- çete hatin kuştin û hatin birîndar kirin. Di salvegera şoreşa rojavayê Kurdistanê da, di sala 2013ê da, Serêkanîyê tê rizgar kirin.

Li Serêkanîyê pergaleka Xweserîya Demokratîk hat pêşxistin. Serêkanîyê heta 09 teşrîna pêşîn 2019ê bi awayekî aram jîyana xwe domand. Paşê jî ji alîyê Tirkîyeyê û çeteyên wê ve ji nû ve

hat dagirkirin. Serêkanîyê li benda rizgarkerên xwe ye ku careka din ji bindestîyê bête derxistin.

## Kobanîyê

Kobanî wekî bajarekî nû ye lê wekî erdnîgarî warekî kevnar e. Ji bo me kurdan cihê pêşîyên me ye. Beşek e ji deşta Sirûc ê. Wan deveran deverên Ruhayê ne. Cihê şaristanîyan e. Cihê pîrozî û ketinan e. Hatina şîrketan, lêkirina rêya tirênê û şûnda Kobanî gav bi gav mezin bûye. Dawîyê jî gihaye rewşa xwe ya îroj.

Wate û girîngîyeka din ya Kobanî heye ku lazime tu caran neyê ji bîr kirin û paşguh kirin. Ev jî ev e ku sala 1979ê Rêber Apo derbasî Kobanîyê bû. Lê ma û xebat kir. Ji wê rojê heta niha PKK tim li Kobanîyê têkoşîyaye. Gundê Elpelûr ku Rêbertî lê maye û bi giştî Kobanî cihekî watedar û manewî ye. Gelê Kobanîyê ji Rêbertî û pêşengên PKKê hêz girtîye û hêz daye. Bi salên dûrûdirêj kadroyên PKKê li Kobanî mane û tê da kar kirine. Ji wan kadroyan piranî deverên cuda yên Kurdistanê

yan şehîd ketine yan jî birîndar bûne. Tevî vî ji Kobanîyê keç û xort ji sala 1980ê û şûnda tevlî PKKê bûne. Van keç û xortan hem li Kobanîyê kar kirine hem jî bi giştî li rojavayê Kurdistanê û li Sûrîyeyê kar kirine. Keç û xortan tim berê xwe dane Çîyayên Kurdistanê û gerîlatî kirine. Di vê serdemê da jî keç û xort xwe digihînin Çîyayên Kurdistanê û şer dikin. Keç û xortan di nava şoreşa rojavayê Kurdistanê da jî cih girtin û digirin. Gelê Kobanîya welatparêz tim kêleka Rêberê xwe, kêleka pêşengên xwe, kêleka şoreşgerên xwe sekinîye. Bi Rêber Apo ra têkilî danîye. Dilsozê Rêbertî ye. Tevlî xebatan bûye. Wekî cephewî kar kirîye. Xwedî li şoreşgeran derketîye. Xwe nêzikî dewleta dagirker û mêtinkar nekirîye. Bacê vî jî daye. Tu carî dev ji rûmeta xwe bernedaye. Bi vî awayî Kobanî bajarekî nû ye. Di dîroka Tevgera Azadîyê da jî xwedî cihekî taybet e ku xwe bi têkoşîna xwe daye nasîn. Heke dijmin bi her awayî êrîş dikin, ji sedeman yek jî ev rastîya Kobanîyê ye. Heke lîstokên cur bi cur li ser Kobanîyê disepînin sedema xwe ew ruhê kurdewar û têgihiştî yê Kobanî ye. Lewra bivênevê lazime gelê Kobanî cewhera xwe ya kurdewar û şoreşger

biparêze. Ne ku biparêze di heman demê da di pêş da jî bibe.

Tê gotin: “Destpêk çawa be, dawî jî dê wisa be.” Ev gotin an ku pênase zêdetir ji bo Kobanîyê derbasdar e. Bingeha dîrokî ya gelê Kobanîyê tekuz e. Bingeha şoreşgerî jî her wisa tekuz e ku keda Rêber Apo bi taybet tê da heye. Piştî ku bingeh an ku destpêk wisa be rêveçûn jî her dê tekuz be. Kobanî ev şanî cîhanê da lê çawa?

Piştî ku bihara gelan li Tunisê 18ê kanûna pêşîn 2010ê dest pê kir, li Sûrîye û li rojavayê Kurdistanê jî di demeka kurt da li hember rejîmê liv û tevgerên curbicur dest pê kirin. Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd jî rewş ji nêzik ve dişopand. Pêdepêde amadekarî dihatin kirin. Ev amadekarî jî xwe dispartin dîroka ku ji sala 1979ê û şûnda hatîye nivîsandin. Li Kobanîyê tevger û rêxistin ji nav gel dest pê kirîye. Ji jêr ve gel hatîye rêxistin kirin. Ya rast jî ev e. Ji jor ve rêxistin nehatîye damezirandin û nehatîye sepandin. Ev rêbaz ji bo têkoşînên gelêrî girîng e.

Tevî ku dewlet bi hemû sazî û dezgehên xwe ve li Kobanîyê bû, bi pêşengtîya kadroyên PKKê gel xwe di taxên bajar da

rêxistin kirîye. Wekî komin û meclîs gel hatîye gel hevûdu. Ji ber ku pergaleka wisa civakî û demokratîk bê parastin nabe, di komin û meclîsan da hêzên parastinê hatine bi rêxistin kirin. Hêzên Parastina Civakî ku niha heye xwe dispêre rêxistinkirineka wiha. Kadroyên partîyê yek bi yek bi welatparêzan ra axivîne. Ne carek, gelek caran serdanî hatine kirin û kesek qaneh bûye ku di parastina tax û bajara xwe da erk bigire li ser milê xwe. Bi vî awayî kedeka mezin hatîye dayîn. Piropagandaya ku rejîmê dikir, piropagandaya ku hin partîyên kurdî dikir jî astengîyeka din bû li hember gel. Di heman demê da li hember xebatkaran. Piranî di nava gel da bêbawerî û dudilî dihat pêşxistin da ku gel neyê gel hevûdu. Xwe bi hêza xwe rêxistin neke. Lewra karê kadroyên pêşeng zehmet bû. Kadro neçar bû kedeka mezin bide. Neçar bû şev û roj bîst û çar saetan bixebite. Kadro ji bo gel kar dike, lê gel bixwe ji ber kêm têgihiştina xwe pêşîya kadro asteng bû. Ji bo baş were zanîn ku bê ka Tevgera Azadîyê bi çi zehmetîyan parastin saz kirîye û şoreş ser xistîye. Rejîm astengek e, hin partîyên kurdî asteng in, dewleta tirkan asteng e, hin partîyên

başûrê Kurdistanê asteng in, paş ve mayîna civakî asteng e. Di nav van astengîyan da hîmê şoreşê hatîye danîn.

Cihekî wek Kobanî jin, her tişt e û ne tişt e. Dema hat xwestin, jin namûs e. Ji bo jinê mêr tên kuştin. Dema were xwestin jî jin ne tiştek e. Dikare were kuştin. Bi qalibên hişî yên feodal û dînî, bi jinê tê meyzandin. Lewra jin nikare ji mal derkeve. Nikare tevlî kar û barên şoreşê bibe. Kadroyên jin ku jinên Kobanî bi rêxistin dikirin, bi gelek zehmetîyan ra rûbirû diman. Niha li Kantona Kobanî jin dibin hevserok. Di rêvebirîyan da cih digirin. Di xebatên jin, ciwan, û çand û hunerê da cih digirin. Di xebatên rewşenbîrîyê da cih digirin. Hîna di temenê ciwan da pirtûkan dinivîsin. Diçin di akademîyan da dersan didin. Lê belê lazime baş were zanîn, destpêk qet ne wisa bû. Lewra ew kadroyên ku jin rêxistin dikirin kedeka mezin û pir bi wate didan. Ew hevalên jin yên destpêkê tevlî kar û barê şoreşê bûn û paşê jî şehîd ketin, şoreşeka hişmendîyê di gel da çêkirin. Lewra ew hêjatirîn heval in. Ew şehîdên wisa ne ku ji bo gelê Kobanî rêya herî zehmet vekirin. Hiştin ku ji wan û

şûnda kê beşdar bibe bi hêsanî di rêya şoreşê da bimeşe. Jinên ku di malan da xwedî ne tu mafan bûn bi şoreşê ra derketin li ser dika dîrokê. Di kar, jîyan û çalakîyên leşkerî da fedayî bûn. Hinek ji vana jî şehadet bi çalakîyên fedayî pêşwazî kirin. Xebatên ku di milê parastinê da hatin pêşxistin, di bingehê wan xebatan da rastîyên wisa hene ku mirov çiqas qal bike jî kêm dimîne.

Di encama têkoşîneka bi vî rengî da li Kobanîyê hêzên parastina cewher hatin damezirandin.

## Têkoşîna Dijî Dewletê

Di dema destpêkê da li Kobanîyê hem sazî û dezgehên dewletê hebûn hem jî sazî û dezgehên kurdan an ku şoreşê hebûn. Dewlet, her ku dem derbas dibû, lewaz dibû. Hêzên azadîxwaz û şoreşger jî her ku diçû bihêz dibûn. Du rêvebirî hebûn. Du hêzên leşkerî hebûn. Hêzên leşkerî yên dewletê li ser kar bûn. Hêzên xwe parastinê yên gel jî hebûn. Bi vî awayî cot otorîte derketin holê. Komin meclîs û hêzên parastina civakî kar

dikirin. Dest diavêtin pirsgirêkên civakî. Di destpêkê da li taxên dora navenda bajar liv û tevger hebû. Di vê demê da navenda bajar di destê dewletê da ye. Pêdepêde hêzên civakî bandora xwe zêde kirin û dor li xwe fireh dikirin.

Dem bi dem bi hêzên dewletê ra alozî derdiket. Ji ber ku hêzên gelerî bi biryar bûn, dewletê bi paş ve gav diavêt. Dema dewletê kesinên xebatkar yan jî welatparêz digirtin, hêzên civakî dilivîyan û kesên hatine destgîr kirin dihatin berdan. Malbat û kesayetên ku bi dewletê ra bûn ku hinek ji wan dewlet bixwe bû, hatin girtin. Kesekî sereke jî di encama alozîyê da hat kuştin. Di encama van karan da bawerîya gel bi pergala nû dihat û zêdetir piştgirîya hêza xwe dikir.

Dema ku li dora Kobanî çete ketin tevgerê xeterî li ser Kobanî zêde dibûn. Mayîna dewletê jî di bajar da bê wate dibû. Li ser vî esasî pêşengên şoreşa Kobanî û gel biryara rizgarkirina Kobanî girtin. Di 19ê Tîrmeha 2012ê Kobanî bi temamî ket destê rêvebirîya gel û hêzên parastina gel.

# Şerê Dijî Artêşa Azad

Sala 2012ê û pêda li Sûrîyeyê gelek rêxistin hatin damezirandin. Rastîya wan her çawa be jî navên xweşik û rakişîner li xwe dikirin. Yek ji vana jî qaşo Artêşa Azad e. Ne hêzeka wisa ye ku bi awayekî xwezayî ji nav gel derketîye û têdikoşe. Bi piştgirî û rê vekirina dewletên herêmê û yên zirhêzên cîhanê hatîye damezirandin. Lewra jî Artêşa Azad ji bo gelên Sûrîyeyê kar nekir. Heke ji bo gel baya û ji bo gel kar kiriba dê di serî da êrîşê gelê kurd yê bindest nekiribana.

Sala 2013ê, li Kobanîyê, sal şerê bi dijî Artêşa Azad derbas bû. Ji ber ku bajarên dora Kobanî girtibûn û ji xwe bawer bûn. Ji wan be dê karibin bi hêsanî Kobanî jî ji nû ve dagir bikin. Rêvebirî û hêzên Kobanî bi Artêşa Azad ra hem didan û distandin hem jî li dijî wan ber xwe didan. Ev jî rastîyeka wê dema kaotîk (gengeşe) e. Ji sala 2013 û şûnda ji milê Cerablûs, Sirîn, Bozanîyê, Girêsipî êrîş dihatin kirin. Kobanî jî bi derfetên kêm, di bin dorpêçê da ber xwe da. Di encamê da Artêşa Azad serkeftî nebû.

# Şerê Dijî Cephet El Nusra

Cephet El Nusra wekî rêxistin xwe dispêre paşverûtîya herêmî ya dînî. Dînê îslam ji bo armancên xwe bikar dianî. Dewleta îslamî û şerîetê dike armanc. Di serdema zanist û teknolojîyê da, desthilatîya çors ya îslamî bingeh digire. Hêzeka civakî nîne. Bi xwezaya civakên Rojhilata Navîn ra ne lihev e. Heke ser biketa serdemeka tarî dê dest pê kiriba. Hêzeka wisa tirsnak dor li Kobanî girtibû. Lê kobanîyan bi derfetên kêm amadekarîyên xwe kiribûn. Keç û xort, pîr û kal xwe gihandibûn astekê ku dikarîbûn xwe biparêzin. Bi vî awayî li gundan, li dora bajar şerê rûmetê dihat kirin.

Şehîd û birîndar çêdibûn, lê gel û têkoşeran ji şehadetan hêz digirtin. Roja ku -19ê Tîrmeha 2013- Şoreşa rojavayê Kurdistanê, rizgarkirina Kobanî dihat pîroz kirin, Cephet El Nusra êrîşî Kobanî kir. Ji roja ku êrîş tê kirin jî em têdigihijin ku ji êrîşê armanc çi ye. Di êrîşê da Dilovan şehîd dikeve ku bixwe ji bajaroka Şêranê ye. Piştra li hember Cephet El Nusra

berxwedan hat pêşxistin. Ji gelek navçe û bajarên Kurdistanê -bi taybet ciwan- hatin û di berxwedana Kobanî da cih girtin. Yek ji vana jî şehîd Vîyan Amara ye ku 26.07.2013ê şehîd ket. Kobanî, bi rêxistin, sazî û dezgeh, hêzên leşkerî, Şerê Gel yê Şoreşgerî dikir. Gelê Kobanî hem li hember zehmetîyên jîyanê hem jî li hember hêzên kujer û dagirker li ber xwe dida. Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd û gelê kurd hem madî hem jî manewî li kêleka gelê Kobanî bû. Berxwedan di herêmekê da dihat kirin, lê yê ku şer dikir gelê kurd hemû bû. Lewra jî gav bi gav ser diket û şoreş tekuz dibû.

# Şerê Dijî Daîşê

Piştî ku Kobanî ji dewletê hat şûştin êrîş nesekinîn. Di sala 2013ê da Artêşa Azad, Cephet El Nusra, Ahrar Şam, dest bi êrîşan kirin. Di sala 2014ê da jî vî carî DAÎŞê êrîş anîn li ser Kobanîyê. Êrîşên dijwar di 15ê îlona 2014ê da dest pê dikin. Gav bi gav dor li Kobanîyê tê teng kirin.

Di destpêka şer da ku piranî li gundan û navçeyan bû, gelê

**JÎN (di dema şer da)**

Kobanî bi xurtî tevlî dibe. Hêzên parastina civakî rista girîng digerînin. Gelê ku li gundan dimînin, heta ku derfet heye tevlî şerê parastinê dibin. Heke derfet nema, hêzên leşkerî şehîd ketin yan jî vekişîyan, gelê Kobanî jî paş ve dikişîya.

Ev rewşa ku tê da şerê giran rû dida, heta şerê nava bajar dewam kir. Di nava bajar da jî her çiqas hin malbat ji Kobanîyê derketibin jî hin malbat jî her li Kobanîyê diman. Dema ku li nav bajar jî êdî derfet nema, girseyên gel derbasî serxetê bûn. Lê beşek ji vê girseyê her piştgirîya xwe ji bo keç û xortên xwe berdewam dikirin.

Hêjayî gotinê ye ku di vê dema zehmet da, gelê bakurê Kurdistanê hate ser xetê û piştgirîyeka dîrokî da şerê ku li Kobanîyê dibû. Bi sedan ciwanan xwe li sînor qelibandin û li Kobanî tevlî şer bûn. Lewra niha li şehîdgeha Şehîd Dîjle ya Kobanîyê, gorên bê nav û wêne hene. Ev şerkerên ku ji derve hatin û tevlî şer bûn hîna navê wan jî derbasî sicil nebûbû. Bi vê yekê ve girêdayî, şoreşgerên tirkan jî hebûn ku tevlî şerê rûmetê bûn û şehîd jî ketin.

**JÎN (di dema şer da)**

Lazime were bi bîrxistin ku çûyîna pêşmergeyên başûrê Kurdistanê, çûyineka ji rêzê nîne. Ne ji bo parastina ax û gel pêşmerge çûne Kobanî. Di vê çûyinê da armanca dewleta tirk û ya KDP hene. Ji ber ku ji destpêkê ve, hem dewleta tirkan hem jî KDP dixwaze li rojavayê Kurdistanê şoreşê bifetisîne. Ev hêzên ku dixwazin kurdan qir bikin û şoreşê ji holê rakin, çima rêya bakurê Kurdistanê vekin û pêşmergeyan derbasî Kobanîyê bikin? Hin hêz, rewşenbîr û KDP çûyina pêşmergeyan wekî helwesteka netewî dinirxînin. Ev vegotin ji binî ve şaş e û bi nîyetekê pak nayê gotin.

Di encamê da Kobanî bi gerîla, şervan û gelê xwe, xwe gihand asteka azadîyê. Navê Kobanîyê di cîhanê da deng veda. Lê dewleta tirkan û hin dewletên mezin yên cîhanê ne xwedî sinc û wijdan in. Lewra jî êrîş li ser Kobanî bi rengên curbicur berdewam in.

Kobanî wekî bajar û erdnîgarî ji ŞGŞ ra hatîye amade kirin. Gelê Kobanî perwerdekirî ye. Hêzên leşkerî, asayîş û HPC heye. Çek û cebilxane heye. Ji bo jîyana rojane pêdivî hatine

amade kirin. Lewra bi ŞGŞ gelê Kobanî dikare xwe biparêze.

## Dîrokçeya HPC, HPC-JIN

Hêzên cewher yan jî civakî xwe dispêrin Sitratejîya Parastina Rewa. Sitratejîya Parastina Rewa li ser du lingan hatîye destnîşankirin. Lingeka Sitratejîya Parastina Rewa gerîla ye an ku hêzên pispor yên leşkerî. Lingeka din ya Sitratejîya Parastina Rewa jî gel e an ku serhildanên gel. Dema em dibêjin serhildanên gel, em qala serhildanên bi çek be yan jî bê çek be dikin. Ji ber ku serhildanên gel bi gelek rêbazan tên kirin. Ji navê da şaxê esasî jî parastina cewher e. Hêzên parastinê yên civakî ji bo parastina ax û gel dixebitin. Di heman demê da civakê ji kirêtîyên civakî jî diparêzin. Hêzeka esasî û bingehîn e ji bo her gelî. Navbera salên 1998 û 2004, Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd, bi rênîşanderîya Rêber Evdellah Ocalan gelek gotûbêj hatin kirin. Kongre û konferans hatin kirin. Sitratejîya Tevgera Azadîyê hat guhertin. Di bîrdozîya me da nûjenî bi pêş ket. Di encamê da têgihiştinek çê bû ku şoreşa me bê hêzên civakî bi rê ve naçe. Li ser vî esasî li her çar alîyên Kurdistanê

hêzên cewher hatin damezirandin.

Destpêka HPC ya rojavayê Kurdistanê û bakur û rojhilatê Sûrîyeyê, çîyayên Kurdistanê ne. Li çîyayên Kurdistanê komcivînên pêwîst hatin kirin. Ji bo rojavayê Kurdistanê Şehîd Sadiq Kobanî hat erkdar kirin. Şehîd Sadik hem li çîya kar kir hem jî li rojavayê Kurdistanê ev kar dikir û dida kirin. Herî dawî jî dema ku li Çîyayê Cudî bû û karê parastina hêzên cewher dikir, şehîd ket. Di bingeh û pêşxistina HPC da ked û xwîna şehîdên mîna şehîd Sadiq hene.

Di berê da her çiqas karê hêzên cewher dihat kirin jî, esas bi şoreşa rojavayê Kurdistanê ra ew xebat wekî pêwîstîyekî esasî hat bi pêşxistin. Destpêk her çiqas ji rêzê be jî her ku çû HPC hat xurt kirin. Di vê xurt kirinê da jî para şehîdên HPC yên jin û mêr zêde ye. Her tiştê Tevgera Azadîyê bi xwîn, bi ked, hatîye afirandin. Lewra jî bi nirx e. Lazime bi sivikî lê neyê meyzandin.

## Ji Vegotina Hiseyn Xelef[3]

Hêzên Parastina Civakê (HPC) ji kevin da kar dike. Ji 2014yê ve fermî hat damezirandin. Dema bihara gelan dest pê kir, li Sûrîyeyê jî alozî dest pê kir. Pêwîstîya gel bi parastinê hebû. Di salên 2011-12-13an da HPC parastin dikir. Ewqas derfet di destên milet da tune bûn, lê mirovên welatparêz dest pê kirin. Bi mirovên welatparêz ra hat nîqaş kirin ku ji her taxê em dest bi parastinê bikin. Li gorî derfetên destê xwe, bi daran bi çekekê yan jî li malê heba bi çîfteyek kar dihat kirin. Dema ku tiştek hebûya di deqeya xwe da şîyarî dihat kirin. Ji ber ku bûyer pir diqewimîn. Rêjîm nemabû û xwe ji herêmê vekişandibû. Her kes jî neçar ma ku taxa xwe biparêze. Pêdepêde komin hatin damezirandin. Komin li ser neh xalan tê damezirandin. Yek jê komîteyên parastinê ne. Her wiha malên gel hatin avakirin û di 2014ê da HPC fermî hat damezirandin. Hemû endam fermî tevlî bûn û perwerdeya xwe dîtin.

---

[3] *Yek ji rêvebirê HPC ye.

**JÎN (di dema şer da)**

Endamê HPCê, mirovên welatparêz in. Fedakar û kedkar in. Divê hîn bêhtir xwe çalak bikin. Di kar da bêtir xurt bin. Bi kêmanî divê her hevalek sê çar hevalên dîtir qezenc bikin. HPC li ser pergala tîman tê hunandin. Her hevalek jî pêwîst e tîmek ava bike. Divê xwe jî berpirsîyar bibîne. Divê her tîm bi xwe ra pênc tîmên dîtir ava bike. Di vir da jî tu dikarî bêjî, hemû nirx û cureyên civakê bê parastin nabin. Parastin jî ne tenê hilgirtina çek û parastina taxê ye. Şerê taybet yê ku li ser me niha tê meşandin, gelek tiştên din mîna jinfiroşî tê kirin û her wekî din ew ji mile hişmendî ve ji alîyê her endamekî ve tê parastin. Ciwanan qezenc bike û wan ciwanan durî tiştê şaş bike. Mînak: Niha ciwanek li mal rûniştîye wê çi bike? Wê biçe çixare, heşîş û madeyên hişbir bikar bîne. Ew kesên wisa hem ciwanan hem civakê bi tevahî xerab dikin. Her wiha ji bo karibe hebek bikar bine, dikare welatê xwe jî bifiroşe.

Lê belê dema em karibin perwerde bikin, li dibistanan cihê xwe bigirin û xwe baş perwerde bikin, karê HPC jî dê bêtir serkeftî be. Her wiha endamên me divê vî karî bikin karekî xwe yê

sereke. Li taxê bi giştî û hevalên xwe perwerde bikin. Ya dîtir jî, divê em ji malbata xwe dest pê bikin û her endamekî xwe baş têbigînin.

Dema ku tu karibî zarokê xwe bi rêxistin bikî, tu dikarî yên derdor jî bi rêxistin bikî. Heke tu malbata xwe bi rêxistin nekî, tu nikarî taxa xwe jî rêxistin bikî. Mînak: Ez zarokên xwe bi rêxistin nekim, perwerde nekim, ez wan di nav kar û xebatên rêxistinên wan da birêxistin nekim, ez nikarim vî tiştî şanî cîran, heval û dostê xwe jî bikim û bêjim: "Were tevlî vî karî bibe."

Bi rastî jî civaka bê parastin, civakek mirî ye. Civakeka wisa dibe bindest. Ji bo vî jî rêxistina HPC hat damezirandin. Ji bo civak xwe bi rêxistin bike. Lê çawa? Eger şerek çêbibe, HPC ji bo wê amade be serkeftin teqez e. Em rêya rast didin pêşîya civakê. Em nahêlin kes ji welatê xwe derkeve.

Beşekî HPC berîya 2014ê hat damezirandin. Di sala 2015ê da, ji me hat xwestin em wekî HPC tevlî pêngavan bibin. Demekî Til Hemîs, Til Birak dihat rizgar kirin. YPG diçû pêş. Rêjîm jî

firset digirt, cihê ku hevalan rizgar dikir rejîmê dixwest bikeve şûna hevalan. Lewra YPG neçar dima ku hinek hêz vegerîne ku ew qadên ku hatine rizgar kirin -bi xwîn û keda şehîdan- biparêze. Di wê demê da, ji me hat xwestin ku em derbasî wan qadan bibin. Hem rejîmê bisekinînin, hem jî ku hêzeka me hebû leşkerî bû, piştgirîya YPG dikir ji pişt ve, dema derbasî deverek nû dibûn û dijmin dişikandin ew cih HPC dadigirt. Bi vî rengî jî piştgirîya wan dikir. Dîsa di nav tax û gundan, heke rewşeka aloz derbiketa, tiştekî normal û xwezayîye ku civakek xwe biparêze. Bendên lêgerînê hebûn. Her wiha li ser bendan alîkarîya asayîşê dikirin. Di hin deveran da bendên HPC bixwe hebûn. Tîmên me yên ku dikarîn şer bikin, bi wan ra derbasî şer dibûn. Dema ku pêwîstî hebe welat welatê me ye. Em li bendî tu kesî namînin ku bê û ji me ra biparêze. Em wekî civak divê welatê xwe biparêzin. Ev tişt jî li ser milê HPCê ye.

Perwerdeyên me, di destpêkê da, dema ku bixwaze em bi mirovan ra nîqaş dikin. Di nîqaşê da em qala parastina axa xwe dikin. Perwerdeyê me li ser Şerê Gel Yê Şoreşgerî, çand û

exlaq, parastina rewa ye. Gelek dersên wilo hene, em di nav taxan da didin.

Di taxan da em çawa perwerdeyê didin? Di nava rojê da, em karê xwe yê rojane dikin. Em êvaran tîm bi tîm rûdinin û nîqaş dikin. Îroj şerê taybet li ser me tê kirin. Em dê çawa pêşîya şerê taybet bigirin? Em van tiştan nîqaş dikin. Heke em bixwazin taxek di perwerdeyekî baş ra derbas bikin, em semîneran didin. Perwerde 10-15 rojan dewam dike. Li gorî girîngîya perwerdeyê û pêwîstîya wê û her wiha li gor dersan ku tên eyar kirin em ji 10-15 rojan êvaran çar saetan semîneran didin. Heta ku mirov baş têbigihê. Ji ber ku bîrdozî piçekî giran e.

Ji bo perwerdeyê, em derbasî Akademîya Civaka Demokratîk jî dibin. Her wiha akademîyên me yê HPC jî hene. Ew jî perwerdeyên girtî ne. Hin jê endaman, pêwîstîya wan heye û derfetên wan heye ku derbasî perwerdeyên dur û dirêjtir bibin û xwe di milê hizrî da bêtir pêş bixin. Ew jî li akademîya me ku bi navê Şehîd Riyad e, li Hesekê ye, perwerde tê dayîn.

Şehîdên HPCê hene. Yek ji wan Şehîd Hozan e. Hevalê me yê

tevgerê yê destpêkê bû. Şehîd Hozanî li taxa Kornîş kar dikir. Li bajarê Qamişlo. Karê wî jî pir serkeftî bû. Hevalekî fedakar bû. Di milê hizrî û îdeolojî da pir pêşketî bû. Dema ku bi kesekî ra nîqaş dikir, guhertin di wan da çêdikir. Wî mirov qezenc dikir. Şehîd Hozan di karê xwe da xurt bû. Hem di karê leşkerî da hem di karê bîrdozî da, civak baş birêxistin dikir. Di dema Şehîd Hozan da, taxa herî xurt yê wî bû. Li derûdora wî gelek mirov hebûn.

Însan ger bi felsefeya Rêber Apo ve girêdayî be, bi hizrê wî ve girêdayî be û welatparêz be, tên armanc kirin. Şehîd Hozan yek ji wan bû. Mînak: Şehîd Hozan demekê ku pêwîstî hebû ku di 2015ê em piştgirîya YPG bikin, me hejmarek mezin dan hev û em derbasî qada şer bûn. Bi YPGê ra ez û Şehîd Hozan bûn. Di wir da serkeftinên pir mezin hatin bidest xistin. Çi çalakîyên ku çêbûn ji bo parastina welat, ji Til Birak bigire hetanî ku em gihan Baxozê, bi YPGê ra bûn. Di dema dawî da, dijmin pê hesîya ku ew mirovekî wek fermandarekî HPCê ye -ez li wî wek fermandarekî xwe dinêrim- dikarê tiştên baş bike ku civak

bêtir bi rêxistin bike. Lewra dijmin ew kire armanc. Teqemenî di maşîneya wî da bi cih kirin û bi wî awayî ew şehîd kirin. Xwestin di kesayeta Şehîd Hozan da civakê bişkînin lê nikarîn. Ji ber ku me soza xwe bi Şehîd Hozan û yên tevgerê bi giştî ra dabû, em dê wan bişopînin û em dê karê wan heta dawî berdewan bikin.

HPC ji şer ra amade ye lê çawa? Niha ger em lê binêrin, li Rojhilata Navîn û li cîhanê giştî şerekî cîhanî yê sêyem heye. Piranî jî şerê aborîyê ye. Lê beşekî vî şerî jî çekdarî ye. Wekî li Sûrîyeyê û Ukraynayê heye. Metirsîyek li ser Kurdistanê bi tevahî jî heye. Ne tenê li rojavayê Kurdistanê, em îroj binêrin, êrîşên ku tên kirin li ser çîyayên azad, li ser gerîla tên kirin. Li ser başûrê Kurdistanê tên kirin, lê belê li ser rojavayê Kurdistanê bi taybet jî heye. Ji bo vê jî em dibêjin HPC hazir û amade ye bi rengekî nû. Ji ber ku HPC di destpêkê da xwe nedaye alî û niha jî bi rêbazekî nû xwe birêxistin kirîye. Berê HPC bê fermandarî bû, lê niha fermandarîya wê çêbûye. Berê her bajarekî bi serê xwe karê xwe dikir, li gorî derfetên di dest

da. Pêdepêde HPC xwe bi rêxistin kir. Konferansên wê hatin lidarxistin. HPC bêhtir ket nav civakê. Em hewil didin ku wê bêtir bi rêxistin bikin. Hejmarê me zêdetir dibe. Ji bo vî jî em dibêjin bi rêbazekî nû HPC hazir e ku welatê xwe biparêze.

## Ji Vegotina Delal Ebdsemed[4]

Di dema damezirandina kominan û vir da komîteyên parastinê hatin damezirandin. Ew jî di sala 2014ê da bû. Me cihê xwe di komîteya parastinê da girt. Kar û xebatê me di destpêkê da parastina civînan bû, yan jî meşekî ba, parastina taxekî ba û hwd. Li cem me destpêka wê li bajara Hesekê bû. Demekî baş me li wir kar kir. Di destpêkê da mirov tekane tevlî xebatên parastinê dibûn. Piştra me dest bi tevlîbûnan kir û hevalên jin tevlî parastinê bûn. Di wê demê da hejmarekî kêm tevlî dibûn. Di wir da, dema parastina bajaran ji me dihat xwestin, em wekî hêza parastina jin, me karê xwe dikir. Di wê demê da jî êrîşa ku li milê Hesekê û rejîmê çêbû, di wir da hevalên jin rola xwe

[4] *Yek ji rêvebira HPC ye.

lîstin. Çûn xet girtin. Her wiha şer jî derket. Piştra li bajaran çi hêz bihatana xwestin wekî hêzên parastinê me karê xwe dikir.

Perwerdeyê me di wê demê da leşkerî bû. Me perwerdeyê kalaşnîkov, merasimê leşkerî -ji ber ku di dema merasimên şehîdan da wekî hêzên cewher me cihê xwe digirtin- didît. Em fêrî bikaranîna BKC û dagirtina şarjoran dibûn.

Piştî wê me xebatên girêdayî civakê dikir. Ji ber ku destpêkê tenê karê leşkerî bû, piştra pêdepêde em bûn hêzekî civakî. Pirsgirêkên ku di nav civakê da derdikevin hene. Di navbera hevjînan da, di milê jinfiroşî da, di milê bikaranîna madeyê hişbir da pirsgirêk hene. Endamên ku me li kominan ava kiribûn, çi xerabî di hundirê wan kominan da hebûya, dihatin ji me ra digotin. Her wiha me ji bo zarokan jî perwerde vekir. Di hin cihan da yên mezin nedikarîn derbas bibûna, wê demê perwerdeya zarokan hat vekirin û me girîngî da zarokan ku zarok derbasî her malê bibûna û wan zarokan nîqaş dikirin. Di wî milî da jî xerab kirina ku di hundir civakê da û li kominan dihat kirin, rola çaraser kirina wê, hêzên cewher hebû. Gelek

kesên ku madeyên hişbir bikar dianîn û difirotin dihatin girtin. Gelek pirsgirêkên di navbera hevjînan da hebûn, dihatin çareser kirin. HPCê bi awayekî baş rola xwe di van mijaran da dilîst.

Dema pirsgirêkên jinan derdikevin, em dişopînin. Ji bo çi? Çawa ye? Heya ji me tê em hewil didin ku çareser bikin. Heke çareser nebû, bêguman cihekî heye ku li wê jinê xwedî derkeve.

Wekî me got çareser kirina wê heya ji me bê em dikin. Ji ber ku em naxwazin xerabîyek di nav civakê da hebe. Heya ji me bê em pirsgirêkên malbatan çareser dikin. Beşên din yên sazîyan heye ku bi van tiştan ra têkildar dibe; wekî mala jin, ger nema ji destê me derkeve ku em wê jinê biparêzin, em sazîyên girêdayî vê pirsgirêkê agahdar dikin. Ji bo van karan Kongreya Sitar û komîteya lihev anînê heye.

Em wekî du beşan tên nas kirin, yek leşkerî ye, yê din jî girêdayî qada civakî ye. Di milê leşkerî da ger ji me bê xwestin, em cihê xwe digirin. Her wiha di civîna YPJê da wekî

çi erk li ser mile wan bin em jî dikin. Wekî dewrîyat, bend danîn. Giranîya wê jî di hundirê taxan da heye. Jixwe asayîş karê xwe dike.

Heke rewşeka awarte çêbibe, di hundirê bajarekê da, rasterast hêzên eskerî destwerdanê dikin. Her kes karê ku li ser mile wî be dike.

Çi sazî dibe bila bibe, dema ku xwe ava bike, dikare karên baş bike. Li pêşîya me, astengî hene û zehmetî jî hene. Bi taybet wekî asayîş û hêzên eskerî pirsgirêkên xwe nebin jî, lê wekî hêza qada civakî, hêza cewher, di nav civakê da, li hember hemû civakê xwe berpirsîyar dibîne.

Di destpêkê da wekî jin me zehmetî dîtin. Ji me ra digotin: "Çawa jin dayîk be û kalaşnîkovê rake?" Her wiha di hundirê taxa xwe da parastinê bike? Destpêka karê milê ereban, ji ber çanda ereban dîyar e ku çawa ye, çand û kevneşopîya wan çawa ye, me zehmetî kişand. Çi bûn ew zehmetî? Dema hevjînê jinekê nehiştiba were nav me, em derbasî wê male dibûn. Me hêza cewher bi wî zilamî, bira û bavî dida nas kirin.

**JÎN (di dema şer da)**

Destpêkê nedihiştin jin tevlî kar bibin lê hêdî hêdî piştî nîqaşa me û derbasbûna me nav wan malan, pir jin dihatin û tevlî kar dibûn. Didîtin ku karekî pîroz e, zirarê xwe li milet tune ye, karekî rêxistinî ye, ava kirina wê pîroz e.

Nas kirina wan ji vî karî ra çêdibe. Ew jî bi dilekî xweş tevlî kar dibûn. Di vê dawîyê da zehmetîyên ku me kişandine, di nav ereban, me derbas kirin. Mînak: Di milê ermenan da ew zehmetî tune bûn. Yekser dema perwerde vedibûn, perwerdeyên me fikrî û çekî ne, dema ava kirina wan xweş bûn û astengî nedidît, lê ji milê kurdan û ereban kêmekî zehmetî dîtin. Di wextê me yê niha da jî ew zehmetî jî me derbas kirin. Derbas kirina me ji kîjan malê dibe, ji ava kirina me ji wê hêzê ra xweş derbas dibe. Zehmetîyên berê nemane.

Di destpêka perwerdeya leşkerî tirs bi jinan ra heye ku newêrin nêzî çekê bibin û rakin. Sîstemek di sere wan da hatîye çandin ku dema destê xwe bidinê, çek ji ber xwe ve diteqe. Dema ku dibînin ew çek ji halê xwe nateqe û her parçeyek jê bû li alîyekî jî hat kom kirin, an ku ew dikare tehekumê li ser bike û

mermîyên xwe dadigire û dikarê wê mermîyê berdê, lê îradeya wan yê xurt heye. Wekî jin divê parastina xwe bike, parastina erdê xwe bike. Ew bawerî û îradayê xurt hişt ku jin çek rake.

Em komîteyên xwe ava dikin. Ji bo şer, gelek komîte hene. Ji milê lojistîkê ve amadekarî hene. Mesela girûpek hazir ji bo şer, li pêşî hêzên eskerî hazir in. Wekî asayîş, YPJ û YPG ew cihê xwe di şer da digirin. Em jî wekî destek in ji bo wan, di nav civakê da. Em nahêlin xerab kirin di hundirê civakê da bibe. Em nahêlin ew civak birevin û mala xwe û hêzên xwe yê eskerî berdin. Beşek jî diçe. Piştgirîya hêzên eskerî dike û beşek yekser derbasî nav civakê dibe. Civak dev ji erda xwe bernade, dev ji zarokên xwe yê di şer da ne, ji wan naqerin, ku nehêle li deverek şer be û ya din jî xerabî bibe. Em bi du rolan dilîzin. Hem di nav hêzên eskerî û hem jî di nav civakê da. Ji bo hazir bin ku di hundirê bajar da êrîş bû ew jî parastina xwe bikin.

Wekî hêzên civakî em her bajarekî diparêzin. Em nabêjin ku em ê tenê bajarê Qamişlo biparêzin yan jî civaka Hesekê

diparêzin. Wekî hêzên civakî, çi bajar be, ji wan bên xwestin parastina wê dikin.

Bîstê kanûna paşîn li Xiwêrana Hesekê çeteyan êrîş kir. Li Hesekê destpêkê ku mermî hate teqandin, hat nas kirin ku çi mesele ye. Ji ber ku hevalên me li her derê hene û yekser agahî gihişt me. Di wê hepsê da şerek çêbû ye û çete revîyane. Endamê me jî hazir in, çi bê xwestin bikin. Me wan perwerde kirine ku dema şerek bibe çawa xwe biparêzin. Dema ku ew şer derket, yekser endamê ku çek li ba wan heye daketin li ser bendan. Dayîkên me dewrîyetên xwe pêk anîn. Hinek dayîkan jî serdana malbatan kirin. Bi şev û roj navber tune bû, lê me girûp ava kiribûn. Yek ji danê sibê heya nîvroj, ji nîvroj heya êvarê û yek jî ji şev hetanî roj ew jî girûpek bûn. Bîst û çar saetan, endamên me di nav civakê da bûn. Me di taxan da parastina xwe dikir û ji malbatan ra digotin ku: Hazirtîya xwe bikin û dev ji malên xwe bernedin. Ev şerê dawî li Hesekê bûye kes dev ji Hesekê berneda û neçû bajarekî din. Her kes di taxa xwe da ma. Dibe ku milê Neşwa û Xiwêran hatin alîyê

**JÎN (di dema şer da)**

Ezîzîyê û Miftî, lê dev ji Hesekê bernedan. Di serê wan da çêbû ku divê dev ji erdê xwe bernedin. Ji bo ku her tim hazir bin ku parastina xwe bikin.

Di Hesekê da qasî 30 çete hatin girtin. Me digot di şer da endamên me di nav taxan da bûn û dikan jî hemû girtî bûn. Qedexeya derketina derve hebû, lê endamên me rola xwe dilîstin. Bi rêya zarokan, sih çete hatin girtin. Her wiha 3 çete hatin girtin. Dema derbasî taxa dibûn. Welatîyan dizanîn ku ev kes xerîb e û kesinên wisa desteser dikirin.

Dema ku zarok didîtin ku ev kes ne ji taxa wan e, yekser agahî didan hêzên eskerî, cewher û kominan. Yên li wir dihatin, ew kes digirtin. Her wiha dema derbasî taxan dibûn ew çete ji pêlavê wî nas dikirin û êrîş dikirin, bi keviran. Hetanî hevalên hêza cewher dihatin ew kes digirtin.

Berê niha jî me got em nasekinin, em dev ji karê xwe jî naqerin. Dema êrîş tune be û gef hebin em hazirtîya xwe û her tiştî dikin. Mînak: Dibêjin em ê filan rojê êrîş bikin, endamê me hazir dibin.

**JÎN (di dema şer da)**

Di milê perwerdeyê da, em dev ji perwerdeyên xwe jî bernadin. Em serdana malbatan dikin. Em xebata cewher jî bernadin. Fêr kirina wan li ser çekê jî em wan jî fêr dikin. Me girûpên xwe yê tenduristî jî hazir kirine û yên lojistîkê jî hazir kirine. Amadekarîyên me ji her tiştî ra heye. Dema êrîş bibe em dev ji bajarên xwe bernadin. Civaka me fêrî vî tiştî bûye. Dema dev ji bajarê xwe berda wê biçe kû derê? Ji ber wê jî bingehekî wan çêbûye ku divê parastina xwe û bajarê xwe bikin. Ji ber wê jî kar û xebatê parastinê tê meşandin.

Dewrîyatên me zêde dibin. Ji çar-pênc saetan bigire heta 24 saetan dewrîyatên me hene. Di nava rojê da ger serdanek an du bin em dikin. Em 10 heta 20 serdanan dikin. Em ji civakê ra dibêjin vaye êrîşek heye li ser me û amade bin ji vî tiştî ra.

Sê şehîdên me yên HPC-JIN hene. Ji milê Kobanî, Şehba û Efrîn. Di şer da jîyana xwe ji dest dan û şehîd bûn.

Wekî Şerê Gel Yê Şoreşgerî yê Hesekê, me dît, di vê dawîyê da, Şerê Sînae ku hêzek heye şer bike. Wek hêzên cewher, di nav taxan da, bi rola xwe lîst. Her wiha di nav civakê da hişt ku

hemû bibin destek. Hem ji milê eskerî û di milê xeberdayînan da. Ew civak jî hazir bû ji bo şer. Di wî şerî da Şerê Gel Yê Şoreşgerî hat dîtin.

Te got şer li her deverê heye, divê em jê ra jî hazir bin. Dema agahî tê ku şer heye, yekser wek hêzê cewher yên hevalên jin û yên hevalên xort, li hev rûdinin. Rêvebirîya wan ya teng sîstemekê dîdinin. Kar û xebatên xwe ji hev ra dîyar dikin û di van rojan da çi bikin çi nekin. Yekser ew xeber belav dibe ji wan endaman ra ku hazir bin ji şer ra. Dewrîyatên xwe pir dikin, hacizên xwe xurt dikin. Dewrîyatên xwe ne tenê bi maşîneyan, her wiha bi meşê di nav taxan da pêk tînin. Amade ne ji her şerî ra ger bê kirin.

Em dixwazin her kes xwe wekî hêzê cewher bibîne di nav civakê da. Ji ber ku hêzê cewher ji bo her kesî ye. Çi civak dibe, çi jî sazîyên me yê din dibin, ger hêza cewher nebe çawa dê parastina xwe bikin. Tevlî kar û xebatên parastinê bibin ku bêtir nas bikin. Ew jî serkeftinek hem ji bo me hem jî ji bo wan e.

## Taybetmendîyên Gel yê ŞGŞ

Dema ku Rêber Apoyî dest bi têkoşînê kir, di kesayeta xwe da taybetmendîyên resen yê kurdî û taybetmendîyên şoreşger yên hemdem gihand hevûdu. Kesayetek wisa hat pê ku xwedî îdîayekî wisa ye ku dixwaze cîhanê tev biguhere. Ev taybetmendîyên zêrîn derbasî nava PKKê bûn. Her kadroyekî PKKê di heman demê da beşek e ji Rêber Apo. Rêbertî, PKK, di nav PKKê da kadro giha astekê û şûnda gelê kurd jî guherî.

Şoreşê hemdem û sosyalîst şoreşekî civakî ye. Lewra gel yekser beşdar dibe. Ji vî şerî ra jî Rêbertî dibêje ŞGŞ. Di vê feraset û bîr û rayê da gel şerekî şoreşgerî dike. Gel tevî gerîla, gerîla tevî gel şer dike. Gerîla bê gel nabe û gel jî bê gerîla nabe. Her du temamkerê hevûdu ne. Jixwe sitratejîya parastina rewa li ser du lingan e. Lingeka xwe gerîla lingeka din jî gel e. Gerîla-kadro çawa lazime xwedî taybetmendîyan be, gel jî ji bo ŞGŞ lazime xwedî taybetmendîyan be. Hekena îzahat dê di gotin da bimîne. Ji bo vî jî pêwîste:

**JÎN (di dema şer da)**

1) Her kesayetekî ŞGŞ welatparêz be.
2) Her kesayetek pêwîste di akademîyan da perwerde dîtibe. Perwerdeyê bîrdozî û leşkerî.
3) Lazime welat, çand û zimanê xwe ve girêdayî be.
4) Lazime ji cih û warê xwe koç neke. Ne li welat ne jî ber bi derve ve.
5) Lazime dijî pergala dewletdar be.
6) Lazime pergala Konfederalîzma Demokratîk bipejirîne.
7) Xebatkarekî baş yê Netewa Demokratîk be.
8) Lazime ne nîjad û netewperest be. Lê belê dîrok, çand û zimanê xwe bizanibe. Lê xwedî derkeve. Pêş bixîne.
9) Lazime ji xwîşk û biratîya gelan bawer bike. Ji bo vê bi bîr û bawerî kar bike.
10) Lazime li hember dijmin xwedî hêrsekî şoreşgerî be. Ji bo gelan jî xwedî hezkirinek mezin be.

## Pêdivî û Karîn

Ji bo ŞGŞ ya serkeftî. Pêdivî û karîn divê hebin. Bi xwestek, daxwazî û xwezîyan tu doz naçe serî. Jixwe di cîhana me da,

kesayet û rêxistin gelek hene. Hin tiştên baş dibêjin. Pirtûkan dinivîsin. Di bernameyên televîzyon û tora înternetê da diaxivin. Mînak: Silovan Zîzek (Slavoj Žižek) heye. Kesekî zanyar û fîlozof e. Çêdibe xwedî nêrînên rast û baş be. Lê belê rêxistinek yan jî tevgereka xwe nîne. Wekî aqilmendekî aqil belav dike. Dibe. Kesên wisa jî lazim in. Lê vana rojane, deqa bi deqa tênakoşin. Rêxistin ava nakin. Dilxwazê şoreşa me ne. Hin ji wan dibêjin tişta ku em pê hizirîn we xiste merîyetê. Erê, jixwe mezinbûna Rêbertîya me jî ev e. Partî damezirand, kadro gihand, gerîla belavî Kurdistanê kir, gel rakir li ser pîyan û meşeka dîrokî da destpêkirin ku hêzên zir hemû pê nikarin.

Lewra jî hokarên serkeftinê pêdivî û karîn in. Dema ku pêdivî bi cih hatin, hêza karînê derdikeve. Di eslê xwe da pêdivî û karîn di nav hev da tê hunandin û tê pêşxistin. Bi rêzkî yek pey yekî din da nîne. Di nav hev da û her ku em têdikoşin pêdivî xuya dibin û hêza karînê ava dibe. Lewra lazime dost û dijmin vî yekî baş bizanibin. Me rêbaz girtîye, hêzên dagirker nikarin bi me.

# Pêdivî

Ji bo her gelî zanîneka dîroka xwe lazim e. Gel bê ku dîroka xwe bizanibe nikare bijî. Ji ber ku zanîna dîrokê bi xwe ra hişmendîyekê tîne holê. Serwextbûna dîrokê di gel da vîn çê dike. Girêdana bi axê ra an ku welatparêzîyê pêş dixîne. Bi zanîna dîroka xwe, gel dikare xwe bi bername bike û bijî. Di heman demê da dikare paşeroja xwe jî saz bike. Bi dersên ku ji dîrokê tên girtin, gel dikare pê sîyaset û dîplomasîyê bike. Gelê zane nakeve dahfika dijminê xwe. Heke bi pirsgirêkên giran ra rûbirû ma, ji ber ku zanîna xwe ya dîrokî heye, dê karibe xwe ji pirsgirêkên giran rizgar bike. Dê karibe rê li pêşîya xwe veke û bimeşe.

Pêwîste gel xwedî hişmendîyeka hemdem û şaristan (medenî) be. Hişê xwe ji kirêtîyan şûşti be. Her çiqas wekî kultur xwedî bawerîyeka dînî be jî, lazime zanistê nas bike û serwext be. Serdema me serdemeka kuantumê ye. Fîzya kuantumê mejîyê gelan vedike. Lazime gel berê xwe bide kuantumê û kuantumîk

bijî. Bi rê û rêbazên dînî tu doz naçe serî. Tevî ku wekî çanda bi kok dîn heye, lazime zanist di wateya xwe ya herî fireh da were nasîn û were pêkanîn.

Hin kesayet di warê zanist û pêkanînê da derdikevin pêş. Jîr in û jêhatî ne. Gel lazime qîmetê bide van kesayetan ku karibe sûd jê bigire. Di nava her gelî da kesayetên sade û pêşketî hene. Dikarin bi xwezayî pêşengtî ji gel ra bikin. Heke asta têgihiştina gel bilind be, tolaz û çepelan wekî rêvebir û pêşeng napejirîne. Lewra gelekî astbilind û kadroyên pêşketî lazime dest bi dest xwe bi xwe rêve bibin. Wê demê rêvebirî tekuz dibe. Gel û kadroyên bi vî rengî dikarin bi başî ŞGŞ bikin.

Di zîndeweran da mejî heye. Mirov di vî warî da zindîyê herî pêşketî ye. Her mirovekî asayî xwedî mejîyekî asayî ye. Bi mejîyekî asayî dijî. Di mejîyê her mirovekî da bîr heye. Bîr wekî mexzenê ye. Agahîyan bi endamên laşê xwe yê dîtin, bihîstin, pêhesîn, destdan, çêj û bêhnkirinê bîra xwe an ku mexzena xwe dadigire. Dema bîra mirov hebe êdî ra û hizirandin jî heye. Mejî, bîr û ra, hizirandin dihêle ku mirov

xwe bi rêxistin bike. Here ser kar û kar bike. Îcar ra û hizra her kesekî di heman demê da dibe bîrdozîya wî kesî. Lewra mirov bê bîrdozî nabe. Mirovê bê bîrdozî mirovê bê bîr û ra ye ku ew jî ne pêkan e. Mirovekî asayî bixwazî nexwazî her dihizire. Dema dîyardeyekî yan jî eşyayekî dibîne, li ser dihizire. Dîmen yan jî manzara bibîne, hest û hesîn pê ra çêdibe. Lewra jî tu qîmeta ew kesên ku dibêjin dema bîrdozîyan nemaye nîne. Vana xwe wekî zana û rewşenbîr jî didin nîşandan. Heke em bi pênase kirina gel wan pênase bikin; ew ne rewşenbîr, rewşenkor in.

Dema em dibêjin bîrdozî, di bingeh da hizirandin bixwe ye. Her çiqas beralî kirinek hebe jî bîrdozî her heye û divê hebe. Her kesê ku dibêje bîrdozî ne pêwîst e bixwe xwedî bîrdozîyeka wisa ye ku bîrbirin û dozkirinê napejirîne. Lê bixwe jî wekî ku dihizire, di heman demê da dibe xwedî doz û bîr. Ev feraset ji alîyê hin kesan ve tê pêşxistin ku civakek ku li ser xwe nahizire biafirînin ku wê civakê bi asanî îdare bikin û keda civakê jî bimijin. Ev navendên ku dibêjin, bîrdozî ne

lazim e bixwe xwedî bîrdozîyeka bi hêz in. Bi hezaran amûran û her kêlî ji bo ku bîrdozîya xwe berbelav bikin dixebitin. Ev lîstokeka nepenî û mezin e ku tê lîstin.

Bîrdozîya Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd (TAGK) sosyalîzm e. Hêlê xwe yê zanist û demokrasî heye. Sosyalîzma zanistî û demokratîk bîrdozîya me ye. Sosyalîzm têgehekî ne kurdî ye. Lê kurdîya wî em dikarin bibêjin ku civaknasî ye. Bîrdozîya me nasîna civakê ye. Bi xwenasîna civakê, civak tê ser hemdê xwe. Bê ku em civakê nas bikin, gelo em dê çawa bijîn? Em dê çawa xwe nas bikin ku xwe ji pirsgirêkan rizgar bikin? Pêşîya xwe vekin û bimeşin? Ev civaknasîya ku em qal dikin, xwe naspêre qalibên hizrî. Her ku dem hat, pêwîstî hat dîtin; di hin mijaran da xwe diguhere û di hin mijaran da jî xwe nûjen dike. Hekena hizir dibe dogma û bîrdozî jî bi demê ra li paş dimîne. Lazime tu deman neyê ji bîr kirin ku bîrkirin û dozkirin esasên jîyanê ne.

Ji bo ŞGŞ xwe nas kirin girîng e. Kesayet lazime bi hûrgilî xwe bigire dest û hêlê xwe yê lewaz bihêz bike. Bêguman di her

kesayetê da hêlên bi hêz û qels hene. Bi perwerde, bi xwendin her kesayetek dikare xwe ji lewazîyên xwe rizgar bike. Kesayet lazime gelê xwe baş nas bike. Da ku karibe bi gelê xwe ra bi başî bide û bistîne. Şîyar be û hêlên bê hêz bihêz bike. Di heman demê da, lazime dost û dijminê xwe ji hev derxe. Bi gotinên ku ji dev derdikeve tu kes nayê nas kirin. Kesayeta ŞGŞ lazime dost û dijminê xwe jîyanî û piratîkî nas bike ku ka ew dost yan jî dijmin çi dost e û çi dijmin e. Heke nasînek wiha çêbû, kesayet dikare di têkilî û têkoşîna xwe da serkeftî be. Kesayet nexapîne û neyê xapandin. Beşekî gelê kurd hîna jî dost û dijmin ji hev dernaxe. Ev jî dibe sersebeb ku ev kesayetên wiha bi tirajedîyan ra rûbirû bimînin. Êdî wisa li hin kesan hatîye ku dibin aşiqê dijminê xwe. Dema derb li wan dikeve jî dikin ax û eman. Lewra kesayetên welatparêz pêwîste têkilîyên xwe bi kesayetên welatparêz ra saz bikin.

Xiyanet dîyardeyekî kambax yê dîroka me ye. Mixabin û hezar car mixabin, xayinên kurdan zêde ne. Komunîkasyon pêşketî ye. Înformasyon di cih da belav dibe. Rojane belge, dîmen û

wêne derdikevin holê, lê hîna jî beşekî kurdan xayinan nanasin. Mejîyê wan şêlo û tevlîhev e. Êdî em têdigihijin ku tora zanyarîyan kesan zane nake. Berovajî mejîyê hin kesan kor dike. Lewra di serdema me da korfam zêde ne. Korfamî wekî nexweşîyeka bê derman berbelav e. Çare jî ew e ku her cihê ku akademîyên civakî hene, her kurdekî dilsozê TAGK e, lazime di akademîyan da bi rêk û pêk perwerdeyan bibîne.

Endambûna rêxistin û sazîyan, komin û meclîsan girîng e. Ji ber ku kes ji rêxistinê hêz digire û hêz dide. Di asta cîhanê da serjimarî gelekî zêde bûye. Bajar, navçe, gund û gundik ne wekî berîya du sed an sê sed salan in. Di serdema me da civak qet bê rêxistin nabe. Her kesek lazime çend rêxistin yan jî sazîyan da cih bigire. Ked bide û jîyanê sererast bike. Nexwe di bin pirsgirêkên civakî da tu kes nikare rabe. Heke gel mil bi mil rêxistinkirî be, çi dagirker nikare nîrê koletîyê deyne ser milê wî gelî. Di şerê cîhanê yê sêyem da, em dibînin ku miletek heke ne rêxistinkirî be yan dagirkerî pêş dikeve yan jî desthilatên wan gelan wan dixin bin nîrê koletîyê. Lewra

rêxistin, sazî û dezgeh girîng in. Şerê Gel yê Şoreşgerî jî herî zêde bi rêxistinî tê kirin. Heke gel xwe li gorî ŞGŞ birêxistin bike, xwe amade bike, tu carî bi bin nakeve.

Her gelê ku bi vî awayî lazimîyên xwe temam kiribe, xwe gihandibe vê astê, dikare bi asanî bi salan şer bike û di dawîyê da jî serkeftî be.

# Karîn

Karîn li gor wîkîferhengê tê van wateyan: **karîn** *lêkera xwerû, gerguhêz, k-ya nerm*

1. şiyan, tiwanîn,

hêz / taqet yan hinêr yan derfet / delîv yan zanîn hebûn bo kirina tiştekî

*Tu narê firqetê zanî*

***Dikarim** ez tehemmul kim*

*Diyarê kohê Qendîl im*— (*Dîwana Melayê Cizirî* ~1640, Melayê Cizîrî)

**JÎN (di dema şer da)**

2. hêz, kanîn, taqet, qewet, xîret, qudret

3. qezenc kirin

*Di avjenîyê de min **karî** te.*

Di dîroka kurdan da karînî zêde heye. Ji ber ku lehengên kurdan zêde ne. Yek ji van jî Ristemê Zal e. Ristem hinde bi hêz e, tenê kurê wî dikare pê. Derwêşê Evdî jî yek ji wan lehengên dîroka kurdan e. Bi hejmarekî piçûk li hember hêzeka mezintir şer dike. Fermandar Mehsûm Korkmaz û bi deh hezaran fermandar û gerîlayên wekî wî xwedî karînê bûn.

Di zargotin û çîrokên kurdan da kesên bi vî rengî ra tê gotin “çar gurçik”. Tê gotin “du dilê xwe hebûn”. Tê gotin “wekî beranê çargurçik bû”. Kurd bi vî awayî pesna lehengên xwe didin.

Ji bo jinan jî têgeha canik yan jî ciwanik tê bikaranîn. Kurd jinên leheng jî bilêv dikin. Ji bo her du regezên jin û mêr bilêv kirinek pir bi wate heye, tê gotin: “Canik-ciwanik û camêr”. Ev bilêv kirin ne ji bo her kesî ye. Ew kesên ku xwedî karîn in bi vî awayî tên bilêv kirin. Baş e, hêza karînê bi çi tê pê?

**JÎN (di dema şer da)**

Berîya her tiştî ji bo karibî, lazime hêza hizrî û bedenî hebe. Hişmendî bîrdozî, bîr û bawerî hebe, karîna kesekî tê pê. Heke bedeneka bi hiş tê rêvebirin jî hebe karîna kesekî digihê asteka bilind. Gerîlayên Azadîyê yên Kurdistanê, vî yekî pir baş dikin. Mînak: Keç û xortên kurdan çeka BKC hildigirin ku bejna hin ji wan qasî BKC jî nîne. Lê belê bi BKCyê hildigirin û pir baş şer jî dikin. Bîst heta sih kîlo bar hildigirin û êvar heta beyanî li çîyayan hildikişin û dadikevin. Heke bîr û bawerîyeka tekuz nebe ev xebat nayê kirin. Pergala sermayedar bi karakterê Rambo îmajek çê kir. Lê di rastî da hatîye dîtin ku ew Ramboyê edaleyê wî werimandî, di qada şer da kêrî tiştekê nayê. Tenê dikare bi teknîkeka pêşketî şer bike.

Ji bo karîna kesekî yan miletekî, lazime armancên dîyarkirî yên rast hebin. Ji ber ku tu kes, heke armancên civakî û mirovî nebe nikare li ber xwe bide. Hêza karînê pêra çê nabe. Di karînê da pêwîste berîya her tiştî armanca dîyarkirî hebe. Kes yan jî milet zanibe ji bo çi têdikoşe. Bi vî awayî dema ku bi armancê ve girêdanî çêbû karîna kes yan jî gel pêş dikeve.

**JÎN (di dema şer da)**

Her kurdê dilsoz çi li welat çi jî li dervayî welat be, pêwîst e hêza karînê di xwe da çêke. Piştî ku ew hêz saz bû, bêguman pêra kar û barên baş jî dê derkeve holê. ŞGŞ jî bi vî awayî berbelav dibe û digihije serkeftinê.

**JÎN (di dema şer da)**

## Jêder

*Ji ber mafê parastî yên hin pirtûkan ku ez nikarim destûrê ji nivîskarên wan bigirim, min nedikarî jiber bikim û çavkanîyên wan destnîşan bikim.

*Hin jêder jî ev in.


1) Mutlu Mehmet Emîn - Çelîk Ersîn, Şoreşa Azadîya Rojavayê Kurdistanê, pirtûka duyem û sêyem, Weşanxaneya Şilêrê, 2017, Qamişlo.
2) Kironolojîya PKKê.
3) bernamegeh.org
4) Ji Wikipediayê sûd hatîye wergirtina.